



# bang a h e q j i kelhaamed

Kovara Îslamî, Çandî û Hunerî

Sal: 8 • Jimar: 32 • Bihar / 2017 • Biha: ₺8

**YA MÛHEMMED MUSTEFA!  
DÎSA YETÎMÊ TE NE ÎRO EM,  
TOBEDAR ÎN...**

EM GUH BIDIN PÊĞEMBER

WERIN JI ME RE BÊJIN

NALÎ Û HELBESTEKA WÎ



# Weke Teqemenîyeke Çalkirî Me

Weke teqemenîyeke çalkirî me  
di logereke nav bajêr da...  
Niha ezê biteqim bi ser bazekî de  
digel çend zarokên bêrî  
bajarekî diherhilênim  
dixeniqim di xendeqan de....  
Û xalî dibim weke bajarekî,  
hildikewişim bar dikim,  
bi hawarî bi rê dikevim,  
li nifireke mezin diqelibim:  
"Xweda mala we jî xerake"  
Ezê bêjim lê  
ma li ku ye  
ez hêjî newêrim  
ji xwe re vebêjim...

Azad RÊBIWAR





# Ya Mûhemmed Mustefa

✍ Fethullah YALÇIN

Ey fexrê 'alem tû yî şahê her wextî  
Li dilê 'aşiqên heq padîşahê ser textî  
Riya te ye hîdayet ji mer tali' û bextî  
**Sultanê heqîqet ya Muhemmed Mustefa**

Ronahiya 'edaletê bi nûra te pîroz  
Dîtîn û didara te bo me roja newroz  
Me xelasî ji te nas kir bi nîşanek fîroz  
**Sultanê hîdayet ya Mûhemmed Mustefa**

Di 'esra se'adet rûzemîn şadiman bû  
Nûra we'hyû rîsalet li 'erd û asîman bû  
Tim li pêş bû ev ummet bi îxlas îman bû  
**Sultanê se'adet ya Muhemmed Mustefa**

Tûyî şahê ser şaha, peyman bi te şêrîn e  
Bi te ewle ye jîyan, dewran bi te zêrîn e  
Carek bi mizgînî awirek li me vegeîne  
**Sultanêbeşaret ya Mûhemmed Mustefa**

Ji fîraqa te ey can! Dunya li me tarî bû  
Şevreş û dirêj yeqîn dewran li me carî bû  
Me rîyaset bi der da dil bi ah û zarîn bû  
**Sultanê şefa'et ya Muhemmed Mustefa**

Ey 'ezîz! Bêgûman em pir gunehkar in  
Me xêza te nemeşand bi ser de em 'îsyankar in  
Bes dîsa yetîmê te ne îro em tobedar in  
**Ey sultanê şefa'et ya Muhemmed Mustefa**

Bê serî û sermîyan ummet îro naçar e  
Derd zêde ne, birîna dil kûr û 'xedar e  
Ya reb! Loqman û 'Îsa verêkî bo me çare  
**Ey sultanê selamet ya Muhemmed Mustefa**

Atîye desta vekir çok daye li dîwanê  
Bi dû'a û awazên te ummet li cîhanê  
Bê xwedî nehêlî di vê axir dewranê  
**Hêvî bi te, emanet, ya Muhemmed Mustefa**





# MALPERA

[www.kelhaamed.com](http://www.kelhaamed.com)



# BIŞOPÎNIN...



[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)



الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على خير

خلقه محمد وعلى اله وصحبه اجمعين

*Bismillāhîrrehmanîrrehîm, mebdeê her 'îlmekî navê 'elîm  
Hemd û sena û şukranî, ji bo wî Xaliqê Rehmanî  
Ku fesahet û beyan daye lîsanî, lisan daye însanî  
Hindî selewatan hemî, li resûlê me yê ûmmî  
Ku bûne peyrewê di wî, 'Ereb û 'Ecem û Kurmanc û Rûmî*



Di kaînatê de hin tişt hene tèn guhertin, hin tişt jî hene nayên guhertin. Rebbê kaînatê, bi tiştên ku nayên guhertin 'eyarê dide tiştên ku tèn guhertin. Bi rîsalet û wehyê 'eyarê dide bîr û bawerî û jiyana civakî. Her wiha bi huner û edebiyatê 'eyarê dide hiss û şu'ûr û fêmberiya însan. Bi vê hêlê huner û edebiyat di xizmeta wehyû xîtaba Îlahî de ne. Tevlîhevî, guherîn, jihevketin, lihevketin, lihevexistin, îmhakirin, serûbinkirin, wergerandin, guherandin... çikas zêde bibin, huner û edebiyat hewqas zêde xizmetê dikin, hewqas zêde dibin îhtiyac, hewqas zêde tê bikaranîn. Welat û gund û bajar çiqas ava-bibin, çiqas xerabibin, însan çiqas zêde dilşad bibe û çiqas dilbikesire hewqas rola huner û edebiyatê zêde dibe.

### **Xwendevanên hêja!**

Ji ber vî qasî di Kurdistanê de îhtiyac bi huner û edebiyatê zêdetir bûye. Çimkî Kurdistan tam di orteya erdnigariya ummeta Îslamê de ye. Ji derî re sivder çibe, ji 'alema Îslamê re jî Kurdistan ew e. Di 'alema Îslamê de çiqas şer çêbibin tesîra wan dighêje Kurdistanê. Bi sebeb Kurdistan jî hev belabûye ummet jî hev belabûye. Îro kufur û Îslam, zalim û mezlûm di Kurdistanê û der û dorên wê de diberhev didin. Di texrîbata îro de huner û edebiyata sekulerîst pur tê bikaranîn û pur tesîra wê jî çê dibe. Ha de îja di vir de rola kovara **Kelhaamed** tê xuyakirin. Wek îhtiyacek mûhim û mezin di tevgerên me de li ber çava ye.

### **Xwendevanên hîja!**

Kovara Kelhaamed bi vê bîr û baweriyê di demsala vê buharê de jî wezîfa xwe bi cî tîne. Demsala buharê ku tê de **wiladeta pîroz**, fexra kaînatê, Rehberê xelasiyê tê îdarkkirin. Bi hatina wî hemî 'alem dilgeş û şa dibin, dar kulîlik didin, giya şîn dibe, hişkayiya çile nerm dibe, av radibin, rihber hişyar dibin. Nivîskarên me bi vê nêrînê jî bo we xwendevanên hêja gelek xebatên şêrîn û bi zewq amade kirin.


Ji Fexreddîn Şemrexî nivîsa "**Çikûs û Camêr**" û "**Em Guh Bidin Pêgember**", ji Fethullah Yalçın şî'ra "**Ya Mûhemmed Mustefa**", Ji mamosta Hêmin 'Umer behsa "**Nalî**" yê şa'îrekî zana û şî'rike wî, ji Cefer Bêcîrmanî behsa "**Tesewwuf**"ê, ji 'Ebdulbaqî Botî "**Çîroka Hosteyên Keristanê**", nivîsên Zazayî û herwekî yên din jî nivîs û şî'rên bi qîmet jî we xwendevanên hêja re hatine nivîsandin.

Ji ber ku herêma di halekî derasayî de ye nivîskarên me yên hepsan nikarin nivîsên xwe bighînin me. Bes ew her daîm di bîra me de ne û em jî wan re minnetdar û du'adar in, Rebbê 'alemê di zemanekî nêztir de bi dilekî şad wan xelas bike.

**Bi selam û hêviya du'ayan em vê hejmara xwe jî teqdîmî we dikin.**

Ji Weşankar / .....	1
Gelî Bawermendan .....	3
Reçeta Kurdan - 'Erebî .....	4
Reçeta Kurdan - Latînî .....	6
Ji Mesnewîya Mewlana .....	8
Ey Dilo Rabe / <b>Mela Mizgîn</b> .....	10
Em Guh Bidin Pêxember / <b>Fexreddin Şemrexî</b> .....	11
Baba Tahirê 'Ûryan - 2 / <b>Ehmed Aqtaş</b> .....	12
Em Herin Bêrîyê / <b>Ehmed Nas</b> .....	15
Harûn Reşîr Û Fudeyl B. 'Iyaz / <b>Îsma'îl Furqan</b> .....	16
Xwedê Daye / <b>Cihad Guzey</b> .....	17
Sûreyê 'Adiyâtî / <b>Yusuf Arifoğlu</b> .....	18
Ya Mûhemmed Fexra 'Alem / <b>M. Cewher</b> .....	21
Poşmanîya Ji Dil / <b>Mela 'Ebdurrehîm OMERÎ</b> .....	25
Lez Bar Xu Têk / <b>Nurettin Kawarî</b> .....	26
Tesewwûf-5 / <b>M.Ce'fer Bêcirmanî</b> .....	28
Bab 'Ezîz .....	30
Kur'an (Zazakî) / <b>'Ebdullah Cewher</b> .....	32
Xelasîya Însanîyetê Îslam / <b>Mamoste Hezexî</b> .....	33
Werîn Ji Me Re Bêjîn / <b>Ezîz Mezraqenterî</b> .....	34
Ey Fexrê Cihan / <b>Şêx Tahirê Şoşî</b> .....	35
Nalî Û Helbesteka Wî / <b>Hemin Omar</b> .....	36
Gotnên Pêşîyan / <b>Mehmûd Tıbyadî</b> .....	39
Şeref Û 'Izzet -2 / <b>M. Salih Misqeynterî</b> .....	40
Bêje Seyda / <b>Mehsûmê Baxçaxî</b> .....	43
Çıkûs Û Camêr / <b>Fexreddîn Şemrexî</b> .....	44
Şermîne Em / <b>Ebûzer Bayram</b> .....	46
Lî Ser Şêwrê / <b>Yehya Êzdarî</b> .....	47
Feqîyê Talıb / <b>Nûreddîn Qoserî</b> .....	48
Çavên Reş Û Bele / <b>Cihan Bawerî</b> .....	49
Qîmeta Xwendinê / <b>Receb Fıdancı</b> .....	52
Em Şîyar Bîn / <b>Mela 'Eliyê Êzdarî</b> .....	53
Girîngiya şîrên sir / <b>Mûhemmed Çelîk</b> .....	54
Hevalên Baş û Nebaş / <b>Recep Fıdancı</b> .....	56
Pırsgrêka Kurd / <b>Ebdulqadir Tûran</b> .....	58
Bexçê Zaroka .....	60

## Çîroka Hostayên Keristanê



'Ebdulbaqî Botî

22

## Bira Dest Erzeno Birayê Xu



Îbrahîm Çabakçurî

27


## Îstîqamet Keramet e



Mustafa Turan

54





Ji Qur'ana Mecîd Çend pend û Şîret

# GELÎ BAWERMENDAN-6



❁ **Gelî bawermendan!** Bêgûman gelek (kesên) ji rahîb û e'baran malê însanan bi niheqî dixwin û (însanan) ji riya Xwedê Te'ala vedigerînin. Tu mizgîna 'ezabekî elim û dijwar bide wan kesên ku zêr û zîv kom dikin, vedişêrin û di riya Xwedê de înfâq nakin (**Sûretê Tewbe: 34**)

❁ **Gelî bawermendan!** Ma çibûbû bi we dema ku ji we re hat gotin "her ji bo rîza a Xwedê Te'ala seferber bibin" hûn di çihê xwe de çikiyan (û tîndayî) man. Gelo ma we dev ji jîna axretê berda û (di dewsa wê de) jîna dinayê pejirand? Lê (rastiya rast ewe ku) fêda jiyana dinyayê li ber ya axretê kêr û bêqîmet e. (**Sûretê Tewbe: 38**)

❁ **Gelî bawermendan!** Ji (dijraberîya) Xwedê Te'ala bitirsin û digel sadiqa bin. (**Sûretê Tewbe: 119**)

❁ **Gelî bawermendan!** (Ewil) bi wan kafîrên ku nêzî we ne re şer bikin û bila ew di we de mîrxasiyeke şedîd bibînin. Baş bi zanîbin ku bêgûman Xwedê Te'ala digel mutteqîya ye. (**Sûretê Tewbe: 123**)

❁ **Gelî bawermendan!** Biçin rukû'ê û biçin secdeê. Ji Rebbê xwe re 'evdîtîyê bikin. Qenciye bikin da ku hûn bigîjin felahê. (**Sûretê 'Hec: 77**)

❁ **Gelî bawermendan!** (Eman ha eman! Nebî nebî) hûn nedin pêy rêç û şopa şeytan. (Digel vê hişyariyê îdî) kî ku bide pêy rêç û şopa şeytan (bila baş bizanibe ku) bêgûman şeytan fû'şîyat mûnkeratan emir dike. Eger ku fedl û rehma Xwedê Te'ala li ser we neba tu kesek ji we ta ebed (hiç ema hiç) pak nedibû. Lakîn Xwedê Te'ala kê bixwaze wî pak didêre. (Lewra) Xwedê Te'ala Semî' û 'Elîm e. (**Sûretê Nûr: 21**)

❁ **Gelî bawermendan!** Xeyr ji mala xwe heta ku hun ehlê malbatê ji xwe hayîdar nekin û li ehlê malbatê silav nekin (bê destur) neçin tu malekî. Ev ji bo we (ji çûna bêdestûr) çêtir e. Hêvî heye ku hûnê bi fikirin û şîretan hildin. (**Sûretê Nûr: 27**)

❁ **Gelî bawermendan!** Ew (kole û carîye)ê ku di bin destê we de ne, ew (zarokên we)ê kû hê balî'x nebûne (ji bo hatina bal we) bila di sê wexta de ji we destur bixwazin. Berya nimêja sibê, berya nîvro wexta ku hun cilên xwe dertînin û piştî nimêja 'îşayê. Ev (hersê) wext bo we demên mehrem in. Ji bil van hersê wexta ne ji bo we ne jî ji bo wan tu guneh nîne ku hun (bê destur) biçin ba hev. Aha Xwedê Te'ala ayetên xwe wihareng ji we re beyan dike. (Bêgûman) Xwedê Te'ala 'Alîm û 'Hekîm e. (**Sûretê Nûr: 58**)

❁ **Gelî bawermendan!** Hûn jî nebin wek wan kesên ku (bi peyvên xwe) eziyet li Mûsa dikirin. Xwedê Te'ala wî ji wan peyvên wan berî û pak dêrand. (Lewra) Mûsa li nik Xwedê Te'ala wecîh bû. (**Sûretê Ahzab: 69**)

❁ **Gelî bawermendan!** Ji Xwedê Te'ala bitirsin. (Li ser teqwayê sabit bimînin) û gotina rast bibêjin. Da ku Xwedê Te'ala îş û karê we li hev bîne û gunehê we bibexşîne. Her kî ku îta'eta Xweda û Resûlê wî bike muheqqeq wî serkeftineke mezin bi dest xistiye. (**Ahzâb: 70-71**)

❁ **Gelî bawermendan!** (Eman ha eman! Nebî nebî! Hûn) Nekevin pêşîya Xweda û Resûlê wî. (Bil'ekis bibin tabî'ê Pêy'xemberê wî.) Ji (dijraberîya emr û nehyên) Xwedê Te'ala bitirsin. Bêgûman Xwedê Te'ala Semî' û 'Elîm e. (**Sûretê 'Hucûrat: 1**)



س:- ﴿مادهم حوریهت سهرینه طه واندنا لهه مبهه ئینسانایه وئ دهمن لهه مبهه ئینسانکی مهزن، لهه مبهه شیخکی، لهه مبهه عالمکی مهزن ئەمن چوا بین حور؟ بسه بهه کور مهزیه تین وان هه نه، وه صفین وان مهزن ن هه نه حهقی وان ههیه کو تهحه ککومن لمه بکن، ئەم ژي وهک هاوئ هیسیرئ وان وه صفین وان﴾ چمکی ئەم جاهلان، وه صفه کی مه نینه، ئەو ژي ئەهلئ که مالینه، کا چوا ئەمن لهه مبهه وان بین حور؟

ج:- ﴿وله لیتو شیخیتو مهزناپی بنه فسشکاندنییه، بدانینا ئەنانیه تییه، بمه حویه تییه؛ نه بقوره تی، کیبو تهحه ککومیه. دیمهک که سئ خوه قوره بکه ئەو ”صبین موته شه یخه“. ئەو چاخ هون ژي وئ مهزن قه بول نه کن

قسطاس ئو عیار ژبو مهزناپی ئەفه، که سئ کو وه لی ئو شیخ به قوره تی لسه رئ خه لکی ناکه، ئی کو قوره تی بکه ئەو ”صبین موته شه یخه“ یانی زارۆکه دخوازه خوه بزور مهزن بده نیشانان، بزور حورمه تی ژخوره بده نیشانان. هونژي نه مه جبورن ژئ وهاره حورمهت بکن ئو حورمهت نه کن

س:- ﴿چما ته که ببور، قوره تی علامه تی بجوکییه ج:- ﴿چمکی ژ هه ر ئینسانکی ره مه رته به یه ک مه زنا تیبو شوهره تی هه یه، ئینسان دوئ مه رته بیده ده رفه یی خوه ته ماشه دکه ئو ژده رفه فه خه لک وئ دوئ مه رته بیده ﴿دیین

هه ر ئینسان لگوری مالباتو ته فگه را خوه دجفا کیده ژیره مه رته به کی چیده، موعامه لا وئ دگه ل ئینسانان ئو موعامه لا ئینسانان دگه ل وئ لگور قئ مه رته بییه ده ئیژار ئەو مه رته با ویا کو ئینسان وئ تیده دیین ﴿ هه گه ر ژ قاما قابلیه تا وئ بلندتره، ژبو کو دسه ویا وئ مه رته بیده وه ره خو یا کرن بقوره تی خوه درژی وئ ﴿مه رته یی دکه

یانی خه لک دحقی مه رته با ویده ظه نکئ دکن بهس ئەو نه لایقه ئو ناگه یزه وئ مه رته یی، ئیژا خوه بزور

مهزن دده نیشانان ئو خوه درژی وئ مه رته یی دکه. وهک وئ زلامئ قاما وئ کنک ئو دخوازه خوه درژی بده نیشانان، دبه وهک کارئ زارۆکان

ئو ئیژا هه گه ر قیمه تو حهقی وئ بلندتر به خوه دطه وینه ئو دادخه بیال مه رته با کو دچاقئ ئینسانانده یه یانی مه رته با کو ئینسان وئ تیده دیین ئەو بقیمهت و حهقی خوه ژوئ مه رته یی بلندتره، وئ دهمن خوه دطه وینه ئو دادخه بیال وئ که سئ کو وئ لژیتر دینه. که سئ کو مه عنه ن مه رته با وئ بلنده بهس خه لک وئ لژیتر دینه، ته واضع دکه و نه فسا خوه بجوک دکه ئو خوه دادخه وئ مه رته با کو ئینسان وئ تیده دیین. وهک ئینسانئ درژی کو خوه دطه وینه ئو دگه یه سه ویا ئینسانئ کنک

حضرت علی کرم الله وجهه گوته: ”که سئ کو لسه رئ ئینسانان ته که ببورئ بکه زه لیل دبه“ ته که ببور و قوره تی ژ جاهلان جاهلیت ناده ئالی، ئو ته واضوع ژي تو زرارئ ناده که سین بعامل، بهس که سئ بعامل ده ما ته واضوعئ دکه یی زیده دبه، قوره تی ژي تشکی ناده خودی خوه

حاصلئ که لام؛ حوریهت ژ ئیمانیه، دده عوا همی پیغه مبه رانده هه یه. بهس تشتی کو ئەم مسلمان ژ حوریه تی فیم دکن ئو تشتی کو فیمبه ریا جاهلی دیتیه نه یه کن، لگور فیمبه ریا جاهلی ئە حکامئ شرعی ئو بلخاصه مه نعو موئه بیده یی شرعی مانعئ حوریه تییه. حوریه تا کو ئەم مسلمان لهه مبهه ده رتین ئو خه راب دیین ئەفه

ته مامئ مه خلوقان بقانونو عاده تین ئیلاهیقه گریداینه، بشئ نپریئ ژبو مه خلوقان حوریه تا موطله ق توینه یه. ئەف قانون ژي ژبه ر کو بونه طبیعی گریداینا بوانقه نه ئەساره ته، به لکی حوریه ته. که سین کو لهه مبهه ر قانونو عاده تین ئیلاهی ده رتین ئو دیتین ئەمن خوه ژوان ژي ئازاد بکن وئ دهمن ژي دکه فن بن قانونئ نه فسائی، یانی قانونئ شه یطانی



# حوریه ت؛ خصوصیه تا ئیمانیه



بسم الله الرحمن الرحيم

کافران بشددهت، دناق خوهده ژي برهمن “سوره تې  
فهتخ، ئایهت: 29

لهه مبه ر موئمنان شکه ستي ئو ستو خوار، لهه مبه ر  
کافران ژي بعزه تو سه ر بلندن “سوره تې مائده، ئایهت:

54

به لئ، غلامکي صادق بين پاديشاهکي خوه ژ  
ششانکيره نا طه وینه چمکي غولام بياديشاهقه  
گریدايه ئو بسه ر بلندايا وي سه ر بلنده

ئو وي غولامن صادق لخواه دانايه کو ظولمو

تهحه ککومئ بکه ژي لکه سه کي بيچاره. ياني چقاس

ئيمان موکه ممه ل به حوریه ت ژي هه وقاس خوه ش و

!..!قه دربه ا دبه. ها قايه عه صرا سه عاده تې

ئينسان لگوري دهره جا ئيمانا خوه دين عه بد ژخوه داره

ئو ديسا لگورا دهره جا ئيمانا خوه لهه مبه ر مه خلوقاتان

سه ر بلندو ئازاد دين. ميثالا قيا ژي عه صرا سه عاده تيبه،

ميثالين حوریه تا حه قيقئ بين بجانو قه وين دوى

عه صريده گه له ک خوه شك خويا دکن، ئن کو لوى

عه صرى بنه ره وئ چيتر فيم بکه

س:- ﴿چهوا حوریه ت خصوصیه تا ئیمانیه؟﴾ هنک  
کهس هه نه حوریه تې خصوصیه تا عصيانئ ئو ضلاله تې  
دينن، تو چهوا کارئ وها بيژئ؟ ئەف گوتنا ته نه  
گونه هکاریه؟

ج:- ﴿چمکئ که سئ کو بئيمانئ خوه بسولطاني  
کائينا ئيفه گرى بده ته نه ززولي زه ليلتئ ناکه، عزه تو  
جه ساره تا وي زلامي ناهيله کو خودئ وئ تیکه فه بن  
ظولمو ته عده يا که سکئ دن، ئو شه فقه تا ئيمانا وي ژئ  
نا هيله کو ئەو زلام ده سترئژيا حوریه تو حقوقي که سي  
دن بکه

ئه هله ئيمانئ بسبب کو خوه بخودئ کائينا ئيفه  
گرئ ددن خودئ جه ساره تن، لهه مبه ر تو که سي خوه  
زه ليل ناکن ئو ستوى خوه خوار ناکن. ئو بسه به ب  
ئهو خوه داين کو ئيمان بين ئانينه رحمن و رحيمه ئەو  
ژئ بره مو شه فقه تن، نه حه قيقئ لکه سي ناکن ئو  
ده سترئژيا حه قو حوریه تا که سي ناکن. خوه دا ته علا د  
قورئاننده وها به حسا ئه هله ئيمانئ دکه

محمد ره سولئ خوه دايه، ئەو که سين پيره ژئ لهه مبه ر“



# Hurriyet; Xusûsiyeta Îmanê Ye

بِسْمِ اللّٰهِ الرَّحْمٰنِ الرَّحِیْمِ

Welîti û şêxîti û meznayî bi nefîşîkandinê ye, bi danîna enanîyetê ye, bi mehwiyetê ye. Ne bi quretî, kîbr û tehkkumê ye.

Demek kesê xwe qure bike ew "sebiyê muteşeyyix e."

Ew çax hûn jî wî mezin qebûl nekin.



**S: - "Çewa hurriyet xusûsiyeta îmanê ye?" Hi-nik kes hene hurriyetê xusûsiyeta 'îsyane û delaletê dibinin. Tu çawa karî wiha bêjî? Ev gotina te ne gunekari ye?**

**C: - "Çimkî kesê ku bi îmanê xwe bi sultanê kaînatê ve girê bide tenezzulî zeliltiyê nake. 'Izzet û cesareta wî zilamî nahêle ku xudyê wê têkeve bin zulm û te'deya keskî din. Û şefqeta îmana wî jî nahêle ku ew zilam destdirêjiya hur-**

**riyet û huqûqê keskî din bike."**

Ehlê îmanê bi sebeb ku xwe bi xudyê kaînatê ve girê didin xwedî cesaret in, li hember tu kesî xwe zelil nakin û sutwê xwe xwar nakin. Û bi sebeb ew xwedayê ku îman pê anîne Rehman û Rehîm e ew jî bi rehm û şefqet in. Neheqiyê li kesî nakin û dest-dirêjiya heq û hurriyeta kesî nakin. Xweda Te'ala di Quranê de wiha behsa ehlê îmanê dike:

"Mûhemmed resûlê Xweda ye. Kesên pê re jî li



*hember kafiran bi şiddet, di nav xwe de jî bi rehm in.”*  
–Sûretê Fetih, ayet: 29-

*“Li hember muminan şikestî û sitûxwar, li hember kafiran jî bi ‘izzet û serbilind” - Sûretê Maîde, ayet: 54-*

Belê, ğulamkî sadiq yê padîşahkî, xwe ji şivankî re na tewîne” Çimkî ğulam, bi padîşah ve girêdayiye û bi serbilindaya wî serbilind e.

**“Û wî ğulamê sadiq li xwe danayne ku zulm û tehekkumê bike jî li keskî bêçare. Yanî çiqas îman mükemmel be, hurriyet jî hewqas xweş e û qedirbiha ye. Ha, vaye ‘esra se’adetê!...”**

Însan li gorî dereca îmana xwe dibin ‘ebd ji Xweda re û dîsa li gorî dereca îmana xwe li hember mexlûqatan serbilind û azad dibin. Mîsala viya jî ‘esra se’adetê ye. Mîsalên hurriyeta heqîqî yên bi can û qewîn di wê ‘esrê de gelek xweşik xuya dikin. Ê ku li wê ‘esrê binere wê çêtir fêmbike.

**S: - “Madem hurriyet, serînetewandina li hember însana ye; wê demê li hember însankî mezin, li hember şêxkî, li hember ‘alimkî mezin emê çewa bibin hur? Bi sebab ku meziyetên wan hene, wesfên wanî mezin hene heqê wan heye ku tehekkumê li me bikin. Em jî wek hawê hêsîrê wan wesfên wan in.” Çimkî em cahil in, wesfekî me nîne, ew jî ehlê kemalê ne. Ka çewa emê li hember wan bibin hur?**

**C: - “Welîti û şêxîti û meznayî bi nefîşîkan-dîne ye, bi danîna enaniyetê ye, bi mehwiyetê ye. Ne bi quretî, kîbr û tehkkumê ye. Demek kesê xwe qure bike ew “sebiyê muteseyyix e.” Ew çax hûn jî wî mezin qebûl nekin.”**

Qistas û ‘eyar ji bo meznayîyê ev e. Kesê ku welîti û şêx be quretiyê li serê xelkê nake. Ê ku quretiyê bike ew “sebiyê muteseyyix e”. Yanî zarok e, dixwaze xwe bi zor mezin bide nişandan, bi zor hurmetê ji xwe re bide nişandan. Hûn jî ne mecbûr in ji ê wiha re hurmet bikin û hurmet nekin.

**S: - “Çima tekebbur û quretî ‘elametê biçûkiyê ye?”**

**C: - “Çimkî ji her însan kî re mertebeyek mezinantî û şuhretê heye. Însan di wê mertebê de derveyê xwe temaşe dike û ji derve ve xelk wî di wê mertebê de dibînin.”**

Her însan li gorî malbat û tevgera xwe di civakê de jê re mertebekî çêdibe. Mu’amela wî di gel însanan û mu’amela însanan di gel wî li gor vê mertebê ye.

**“De îjar ew merteba wî ya ku însan wî tê de dibînin, heger ji qama qabiliyeta wî bilindtir be, ji bo ku di sewiya wê mertebê de were xuyakirin, bi quretî xwe dirêjî wê mertebê dike.”**

Yanî xelk di heqê merteba wî de zennkê dikin, bes ew ne layiq e û naghêje wê mertebê. Îja xwe bi zor mezin dide nişandan û xwe dirêjî wê mertebê dike. Wek wî zîlamê qama wî kinik û dixwaze xwe dirêj bide nişandan. Dibe wek karê zarokan.

**“Û îja heger qîmet û heqê wî bilindtir be xwe ditewîne û dadixe bibal merteba ku di çavê însanan de ye.”**

Yanî merteba ku însan wî tê de dibînin, ew bi qîmet û heqê xwe ji wê mertebê bilindtir e. Wê demê xwe ditewîne û dadixe bibal wî kesê ku wî li jêrtir dibîne. Kesê ku me’nen merteba wî bilind e bes xelk wî li jêrtir dibîne, tewadu’ dike û nefsa xwe biçûk dike û xwe dadixe wê merteba ku însan wî têde dibînin. Wek însanê dirêj ku xwe ditewîne û dighîne sewiya însanê kinik.

Hezretî ‘Elî Kerremellahû wechê gotiye: “Kesê ku liserê însanan tekebburê bike zelîl dibe. Tekebbur û quretî ji cahilan cahiltiyê nade alî. Tewadu’ jî tu zîrê nade kesên bi’aqil. Bes kesê bi’aqil dema tewadu’ê dike pê zêde dibe. Quretî ji tişkî nade xwedyê xwe.

Hasilê kelam; hurriyet ji îmanê ye. Di de’wa hemî pêğemberan de heye. Bes tiştê ku em musulman ji hurriyetê fêm dikin û tiştê ku fêmberiya cahilî dibêje ne yek in. Li gor fêmberiya cahilî ehkamê şer’î û bilxasse men’ û mueyyideyên şer’î manî’ên hurriyetê ne. Hurriyeta ku em musulman li hember dertên û xerab dibînin ev e.

Temamê mexlûqan bi qanûn û ‘adetên Îlahî ve girêdayîne. Bi vê nêrînê ji bo mexlûqan hurriyeta mutleq tune ye. Ev qanûn jî ji ber ku bûne tebîî, girêdayîna bi wan ve ne esaret e, belkî hurriyet e. Kesên ku li hember qanûn û ‘adetên Îlahî dertên û dibêjin emê xwe ji wan jî azad bikin, wê demê jî dikevin bin qanûnê nefsanî, yanî qanûnê şeytanî.

# JI MESNEWÎYA MEWLANA

## ‘HÎKAYETA MÊRIKÊ BEQAL Û

### RÛNRÊTINA TUTÎ YE DÎ HUNDURÊ BEQALÊ DE

(Zemanek) hebû dikandarek digel tûtî  
Xweşdeng û rengêşîn û xebergo bû tûtî

Di dikanê de, ew bûbû notirvanê dikan  
Nuktedan bû nukte digrand li ber taciran

Di xîtabê de wek însanê natiq bû  
Bi newayê di nêv tûtîya de haziq bû

Xwedî rojek ber bi malê çûbû  
Tûtî di dikanê de notirvan mabû

Ji nişka ve pisîkek peyda bû di dikan  
Ew li pê mişk bû, tûtî hilpekî ji tirsca can

Firr da çû li goşekî dikanê danî  
Şûşeyên rûnê gula rêt bi xwarê de anî

Xwedîyê wî vejerî ji mal hate dikanê  
Wek dewlemendê dilrihet rûnişt di dikanê

Dît ku dikan noqî rûn e, hem wî berg û cil  
Derbek danî li serî, tûtî ma serzelût û kel

(Tûtî) çend roj hew xebardan xir  
Mirovê beqal bi nedametî pir ax kir

Ruyê xwe dikşand û digot: Hey wax li min  
Ku çuye bin ‘ewr afitaba nîmettê di min

Xwezî destê min bişkestina ew zeman  
Ku ez çûme ber serê (tûtîyê) xweşziman

Dida wî bi her derwêşî xelat û hediye  
Da ku vebe devê teyrê wî dîs biştexile

Piştî sê şev û sê roja heyran û bêzar  
Rûniştibû li dikanê, neumîdwar

Tiştên xerîb û balkêş bi wî teyrî nişan  
Da ku dîs biştexile û vebit lê ziman

Di wir ve buhurî cewlaqîyek serzelût  
Bê mû bû serê wî mîsle tas û teştâ rût

Bûd beqalî û vey ra tûtî  
Xoşnevayî, sebzi ve gûya tûtî

Ber dukan bûdî nîgehban-i dukan  
Nukte goftî ba heme sûdageran

Der xîtab-i ademê natiq bûdî  
Der nevay-yî tûtîyan haziq bûdî

Xoce rûzî sûy-i xane reftebûd  
Der dukan tûtî nîgehbanî nimûd

Gorbeî ber cist nageh ber dukan  
Behr-i muşî tûtîyek ez behr-ican

Cest ez sûy-î dukan sûyî gorixt  
Şîşehayê ruxen-î gul r ara berixt

Ez sûy-i xane be yamed xwace eş  
Ber dukan benşest farix xwaceves

Dîd por ruxen dukan û came çerb  
Ber sereş zed, geşt tût î kel zî zerb

Rûzekî çendî sûxen kutah kerd  
Merdê beqal ez nedamet ah kerd

Rîş ber mîkend û mîgoft: Ey dirix  
Kî afitab-i nîmetem şod zîrî mîx

Destê men beşkestebûdî an zeman  
Çun zedem men ber serê an xoşzeban

Hedyeha mîdad her dervîş ra  
Ta bi biyabed nutq-i murx-i xwîşra

Be’d se rûz û se şeb heyran zar  
Ber dukan benşeste bûd nevmîdwar

Mînumûd an morx ra hergûn şigoff  
Takî başed kender ayed begoff

Covleqî-î serbirehne mîguzeşt  
Ba serê bîmû çu postê tas û teşt



Tûtî dest bi xeberdanê kir ew ziman  
Bang li derwêş kir gote: Ey fulan

Tu çima keçeli? Çima ketî nav keçela?  
Gelo ma te jî şûşa rûn rêtiya hela hela!

Kenîyan hemî xelk bi vê qiyasa di wî  
Lew sahibê cubbeê wek xwe hesaband wî

Tu hîç qiyas me ke bi xwe re karê pakan  
Şîr û şêr gerçê yek bin nivîsandina wan

Cumle alem bi vî sebebi derketin ji riya heq  
Kêm kes hayîdar bûn ji 'ebdalên Heq

Serî bi enbîya re kişandin  
Ewlîya wek xwe hesabandin

Gotin: Nuho em jî beşer in ew jî beşer  
Em û wan mehkûmê xew û xwarinê her

Wan ji koraniya xwe nedizanibû ku nuha  
Heye ferqiyet di mabeyna wan bê munteha

Du new'ê mêşan çêriyan li yek mer'ekî  
Ji yekî jehr peyda bû hunguv ji yekî

Du xezala li yek cîkî gîya xwarin digel av  
Ji yekî sergîn peyda bû ji ya dî miskeav

Du neya av vexwarin ji çavkanîyeki  
Yek xalî ma ji şekir tijî bû nava yekî

Mîsalên wihareng tu bi sed hezaran bibîn  
Ferqa bi heftê salî tu di nabeyna wan bibîn

Ev dixwe (xwarina wek) gû jê cûda dibe  
Ew dixwe nûra Xweda lê peyda dibe

Ev dixwe tim jê dizên çavtengî û hesed  
Ew dixwe jê dizên tim eşqa Ehed

Ev zemîn pak e, ew şor û hişk û bed e  
Ev ferîşte a pak e ew cinawirek dirind e

Rast e, gerçê bi suret herdû manendê hev  
Lê yek ava tal e yek ava şîrîn û bi sefa ye tev

Tûtî ender goft amed der zeman  
Bang ber dervîş zed kî hey fulan

Ez çî î kel? ba kelan amîxtî?  
Tu meğer ez şîşe ruxen rîxtî?

Ez qiyaseş xende amed xelq ra  
Kî û çu xod pîndaşt sahibdelq ra

Kar-i pakan ra qiyas ez xod meğîr  
Gerçê maned der nibîştên şîr û şîr

Cumle 'alem zîn sebeb gumrah şod  
Kem kesî zî 'ebadl-i Heq agah şod

Hem serî ba enbîya berdaştend  
Evlîya ra hem çu xod pîndaştend

Goftê: Înek ma beşer îşan beşer  
Ma vû îşan beste-î xwabîm û xwer

În nedanistend îşan ez 'ema  
Hest ferqî der miyan bî munteha

Her do gûn zembûr xordend ez mehel  
Lîk şod zan nîş û zîn dîger 'esel

Her do gûn ahû giya xordend û ab  
Zîn yekî sergîn şod û zan muşk-î nab

Her do ney xordend ez yek abxer  
În yekî xalî yû an dîger şeker

Sed hezaran încônîn eşbah bîn  
Ferqîşan heftad sale rah bîn

În xored gerded pelidî zû cûda  
An xored gerded hemî nûr-i Xuda

În xored zayed heme boxl û hesed  
An xored zayed heme 'îşq-i Ehed

În zemîn pak, van şûr est û bed  
În firîşte-î pak û an dîv est û ded

Her do suret ger behem maned revast  
Ab-i telx û ab-i şîran ra sefast



# Ey Dilo Rabe!

✍ Mela MIZGÎN

Ey dilo rabe xwe karke  
Bîn û bayê cennetê  
Tê ji Kurdîstanê dîsa  
Bernede vê fersetê

Dîcle dîsa sor diherke  
Gûlşenên nû av dide  
Ref bi ref şalûl û bulbul  
Têne bağê wesletê

Dîsa karwanê şehîda  
Ket riya azadîyê  
Firr û perwaz dan kevokan  
Ber bi 'erşê izzetê

Bû lehî xûna şehîdên  
Dîne Îslama Mûbîn  
Amed û Wan û Çebexçûr  
Xemilîn bi mîhnetê

Xayinên dîn û welat tev  
Wek guran êrîş kirin  
Memleket wêran kirin tev  
Bi şewat û şiddetê

Wek xuya be perikên wan  
Waye dîsa hatine  
Lê belê mizgîn li wan be  
Kurt e 'ûmrê wehşetê



# EM GUH BIDIN PÊXEMBER

✍ Fexreddîn ŞEMREXÎ

Ronya çavê me, pêxemberê me Hz. Muhammed 'eleyhîsselat û wesselam wiha kerem kiriye:

**"Musluman birayê musluman e. Li wî zulmê nake, wî teslîmî dijmin nake."**

**"Kî hewcehiyeke birayê xwe yê mumin peyde bike, Xweda jî hewcehiyeke wî pêk tîne."**

**"Kî birakî xwe ji tengasiyekê xelas bike, Xweda jî roja qiyametê wî ji tengasiyan xelas dike."**

**"Kî qisûra muslumanekî binixumîne, Xweda jî roja qiyametê qisûra wî dinixumîne."**

**"Buğd û hesûdiya hev nekin, berê xwe ji hev neguherinin. Ey 'evdên Xweda! Bibin bira."**

**"Ji we, yê ku wê roja qiyametê herî nêzikî min be, ewê ku exlaqê wî herî xweşikê."**

Gelî biraw pismama  
Dêyû xuşk û dotmama  
Qîz û jin û zilama

**Em guh bidin pêxember**

Gelî koçer û siwar  
Cotkarê ehlê cîwar  
Gavan û hostê dîwar

**Em guhbidin pêxember**

Mamê min û metka min  
Xalê min, xaltîka min  
Zarok û berxika min

**Em guh bidin pêxember**

Gelî azadperwera  
Dozvan û şoreşgera  
Mamostew xwendegera

**Em guh bidin pêxember**

Hey cîranno, hevalno  
Dost û hogir, delalno  
Nas û kesên di malno

**Em guh bidin pêxember**

Hey guhdarê hazirno  
Silav li we camêrno  
'Umir diçe heyderno

**Em guh bidin pêxember**

Lo welatîw omîdno  
Hey merivno, kirîbno  
Xwedîxatir, 'eşîrno

**Em guh bidin pêxember**

Gelî rêwîw mêvana  
Malbat û mazûbana  
Ehlê civat û zana

**Em guh bidin pêxember**

Gelî xort û ciwana  
Kal û pîr û şivana  
Maqûl û sermiyana

**Em guh bidin pêxember**

Kesê bi qedr û qîmet  
Bila neçe axîret  
Bi 'îbadet şefa'et

**Bixwazin ji pêxember**

Gelî hêjaw 'ezîzan  
Bajarîyû gundîyan  
Ehlê çiyaw deştîyan

**Em guh bidin pêxember**

Ronya çava limêje  
Ji herama d-parêze  
Qur'an bixwîn bixwaze

**Şefa'et ji pêxember**



# ŞÎROVEYA HIN ÇARÎNÊN BABA TAHIRÊ 'ÛRYAN -2



✍ Ehméd AQTAS

Kesên di vê helwestê de ne hem hundirê xwe hem jî derveyê xwe, derdora xwe ronî dikin. Dema meriv li ba wan be, meriv di bin bandora wan de dimîne.

**Ez ku li çolan digirim şev û roj, Û histêran dibarînim şev û roj  
Ne tayî me û ne derek min têşe, Ez vê zanim ku dinalim şev û roj**

“Ez çolperwerem” angî ji çolê hez dikim û min jî vê dinyayê çav, rû û dilê xwe zîvirandiye. Loma ev çol min perwerde dike. Bi şev û roj angî her gav ez li dû evîna te me ya rebbî. Ez jî bo vê evînê bi dest xim her tim hêsiran dibarînim. Lê belê carna ez bi xeyalên dinyevî di’eliqim û ji ber vê yekê ez her tim bi êş û elem im, dinalim. Mirovên jî rêzê wexta nexweşiyek li wan peyda dibe, laşê wan diêşe. Yê min tu nexweşiyek zahîrî angî diyar tune. Lê belê êşa min tenê ji bo Xwedayê Teala ye. Di hundirê wê de her gava “bê xweda” valahiyeke û ev valahî her gav digel xwe êş û elemê tine.

**Tu ku zanî, bi min çare biamoj, Ku ez van şevan bi kê re bikim roj  
Geh dibêjim, ma wê çi dem roj derê, Geh dibêjim ku ti dem dernayê roj**

Heke dawîya rojekê me neheqî û zilm li tu zindîyan nekiribe, wê çaxê însallah emê bikarin bi dilekî aram vekevin. Lê dijî vê rewşê angî roja me bi neheqî û zilmê derbas bûbe, hewceye bawermend ne aram bin. Di be ku ev şevên tarî qebra mirov be jî. Heke li dinyayê ezmûna pîroz bi serfirazî derbas kiribe ku ew qebr jê re dibe bexçakek angî gulîstanek bihuştê. An jî vê ezmûna pîroz li gorî rê û rêzikên îlahî nebihurandibe, ew qebr jê re dibe kortek ji kortên dojehê. Carna xwe li qebrê dibîne ku qet lê nabe sibe, lewra mirovekî gunehkare û qebra wî bûye mîna kortek ji kortên dojehê. Carna jî dîsa xwe li qebrê dibîne û qed naxwaze lê bibe sibe. Dixwaze ku ew rewşa hanê her dem bidome. Angî ew qebr bûye gulistan û bexçeyek ji bexçeyên bihuştê.

Di vir de armanca wî ya sereke dema li qebrê angî li gorî jî her ezabî rizgar be û netirse, pêwîste li dinyê di rîyeke çawa de bimeşe û di nav çalakîyên çawa de cih bigre, destnîşanî xwe û derdora xwe bide.



“Beriya mirinekê xwe bimirîne” ev hedîsa pîroz heman wateyî de wek hişyariyekê dide bawermendan.

**Wer’ bilbil em binalin ji serê soj, Were eşqa seher ji min biamoj  
Tu jibo gula pêncrojan dinalî, Ez jibo dilaraya xwe şev û roj**

Ey bilbil evîna te gul e, evîna min jî rebbê min e. Ey bilbil tu herî xweş wexta dawiya şevê ber bi qedandinê ye û ronahîya sibê dike dest pê bike (dema fecrê) tu çav evîna xwe gulê dikeví û herî xweş wê demê dinalî. Lê belê ev evîna te demborî û fanî ye. Were evîna heqîqî ji min hîn bibe. Ji min bi’ellime. Ez ne pênc rojan ez di temenê jiyana xwe de her gav û her an dinalim. Ev evîna te evîneke xapanok e. Ev evîna te piştî pênc rojên din, ewê dev ji te berde, lê belê evîna min mayînde ye, payîdar e. Hezkirinên me yên dunyevî tevahi demborîne. Lê belê dema ev hezkirinên me ji bo razîkirina xwedayê Teala be, ewê li axîretê me pêşwazî bike. Ewê bibin nîmetên bihuştê. Ev tiştên ku li dinyayê demborîne, bi razîbûna xwedayê teala dibin mayinde. Dibin danûsitendineke bikêr.

Hezkirinên li dijî razîkirina xwedayê Teala, her razîbûnên demborî heta devê qebrê ne. Heke em bixwazin ku kirinên me bi erênî derbasî axîretê bibin, her tiştî bi navê xweda bide, bi navê xweda bistîne, ji bona xweda hez bike û dîsa jibo xweda biqehire. Heke bi rasti em evîndarê xwedayê Teala bin, hewceye em her dem rêya wî bişopînin. Di vê şopandinê de her dem wê astengi û musîbet li pêşberî me bin. Di vê rêyê de kişandina êşê ji bo axîretê dibe xelat.

**Ey Xweda hawarê dilê bibhîs, Kesê bêkes tu yî, ez mame bêkes  
Hemû dibêjin, kesê Tahir nîn e; Xwedê yarê min e, çî hacet bi kes**

Her kes dibêje Tahîr bêkese û tu kesî wî tune. Ango bêxwedîye. Ji ber vê rexneya civakî feryada wî bilind dibe û dibêje: Dibe ku ez li dinyê bêkes bim, lê belê ev bêkesî ne bêkesîyeke rastî ye. Ev bêkesiyek demborîye. Bav Tahîr Êryan ji civakê re wiha dibersivîne: Dema xwedayê Teala ji me re bibe dost, ne hewceye tu kes ji me re bibe dost û xwedî. Ev xwedîtî tenê bese. Lê belê serwerê serweran ango hakimê hakimî hebe, ezê mirovên aciz çî bikim. Bi rastî xwedîtîya heqîqî ewe ku Xwedayê Teala xwedîyê meriv be. Ne ‘evdên aciz û beşer xwedîyê me bin. Bav Tahîr Êryan mîna Hz.Îbrahîm *“Hesbûnellahû we ni’mel wekil”* *“Tenê Xwedayê Teala ji bo me bes e.”* gotiye.

**Xem û derdê min ji ettar bipirse, Dirêjiya şevê j’nexweş bipirse  
Hemû mexlûqat halê min dipirsin, Tu ku can û dil î, yek car bipirse**

Ev cihê ku ez piranî lê dijîm, rêya kesan pêr lê nakeve. Ji ber ku di wê demê de kargeh ango dikan tineye, danûstendin piranî bi destê ettara pêk tê. Tenê ettar ango gerok rastî min tê û rewşa min a hanê jê agahdar dibe. Ez li vê dinyê her dem nexweşê evîna te me. Çawa ku ji bo yekî nexweş, şev qet derbas nabe û lê nabe sibe. Yê dirêjiya şevê herî baş hîs dike yê nexweş. Li hember vê rewşê ji bo mirovên nexweş, şev herikbar e. Li min jî mîna vê şeva tarî ev jiyana min a li dinyê bê êş û elem qed derbas nabe. Hemû tiştên afirandî, rewşa min dipirsin, lê belê ji min re bê nîrx û bê bandor e. Lewra evîna min evînek îlahîye. Ez dixwazim ku Xwedayê Teala, carekê tenê rewşa min bipirse. Dema Xwedayê Teala rewşa min bipirse, ewê derdê min derman bike ango ezê ji derd û xemên xwe rizgar bibim. Ewê ji vê dinya xapînok û derdkêş min bikîşîne cem xwe. Ê derd û derman afirandiye Xwedayê Teala ye. Kîjan dermana ji bo kîjan derdan hatiye afirandin, ê herî baş dizane, dîsa Xwedayê Teala ye. Ji ber vê yekê tenê dixwazim Xwedayê Teala rewşa min bipirse. Lê belê dema Xwedayê Teala rewşa min bipirse, ezê ji her cûre nexweşiyên aram



bibim. Mînak: Çawa ku ji bo mirovekî nexweş mirovekî ji rêzê çi qasî nêzik be ji bêkêre. Ji bo derdên Baba Tahir jî civak bêkêre. Loma ji bo nexweş bijîjk çi be, ji bo Baba Tahir jî bijîjk Xweda ye.

**Şev tarî ye û gur êrîş dikin mêş, Du zulfên xwe hemayîl ke were pêş  
Ji wan xonçelêvan maçek bide min bêje, jibo Xwedê mi' da bi derwêş**

Şev piranî bi "xwe xwe" dimîne ango tenê dimîne. Xweza û dinya mîna dikeve bêhnvedanê. Di van şevên tarî û dirêj de gelek wesweseyên şeytên êrîşî wî dikin. Ji ber ku di çarîne de gur pirjimarî, ev rewş gelek hevalbendên şeytên nîşan dide. Dibe ku ev hevalbendên şeytên hewa, hewes, nefes, weswese û hezkirinên dinyewî bin. Di vê rewşa hanê de dikeve nav êş û xeman. Ji rebbê xwe dixwaze ku wî ji van êrîşan rizgar bike. Çareserîya vê pirsgerîka wî, ji vê dinyayê koçî axîretê bike û bigihêje cemala Xwedayê Teala. Dixwaze ku rizgarkirina rewşa hanê bi rêbaza ruhîstî bê çareserîkirin. Lê belê dixwaze ku gava ruhîstî hat, bi awayekî xweşik wî pêşwazî bike. Maçekê bide wî û giyana wî bistîne. Bi vî awayî ji ezabê van şevên tarî û dirêj xelas bibe. Wexta ku tu hatî, bêje ji bo Xwedayê Teala ez hatime giyana te, rûhê te bistînim. Evîndarên Xwedayê Teala, mîna şehîdên îslamê dixwazin ku gavek berî gavekê bigihêjin rebbê xwe û li cem rebbê xwe bîn riziqîrin.

**Gula ku min bi destê xwe çandîye, Û bi histêrên du çavan av daye  
Ma ev li dergehê Xwedê rew a ye, Gul a min be, lê gulav a yê din be**

Evîna min be, derd û êşa evîne ya min be û li hember vê rewşê, xelata evîne ya yekî din be. Kesên li dinyayê bêevîn, bêêş, bêelem û bêked dijîn û bihuştê ji bo xwe layiq dibînin, li cem Xwedayê Teala ne derfete. Ev kes tenê xwe dixapînin. Hinek mirov li ber doza Xwedayê Teala tu ked nerijandine, li pêşberî tu tengasî û derda nehatine û ji xwedayê xwe bêhaydar jiyane. Ev kes dibêjin ku li axîretê emê derbasî bihuştê bibin. Lê belê ev rewşa rengin li ba xweda ne wiha ye. Dibe ku li dinyayê yên dikin û yên dixwin ne heman kes bin. Ango hinek kes dikin, lê belê ev berdêla kirinê hinek kesên din ên cûda dixwin. Ev rewşa hanê li dinyayê di gelek beşî de, di gelek warî de diqewime. Lê belê li axîretê, li cem Xwedayê Teala qet ne derfete. Li vê dinyayê ji bo ezmûna pîroz çi kirinên te hebin, li axîretê ev kirinên te ne kêma zêde ewê te pêşwazî bikin. Ango li dinyayê gul çandibe, ewê li bihuştê vê gula çandîye bîn bike. **"Fe men ye'mel mîsqale zerretîn xeyren yereh - We men ye'mel mîsqale zerretîn şerren yereh" "Kî qasî misqalê zerre xerê bike, ewê berdêla wê bibîne û kî jî qasî misqalê zerre xirabiyê bike, ewê berdêla wê bibîne."** (Sûreya Zilzal, 7 - 8)

**Dilo jar im, dilo jar im, dilo jar; Şûşa namûsê j' destê min kete xwar  
Tev dibêjin, tu bênav û bêar î; Kesê aşîq, çi bike bi nav û ar**

Ew mirovekî hejar û bêçare ye. Êdî li gorî rê û rêgezên civakê tevnagere. Ji ber vê yekê ji aliyê civakê ve tê şermazarkirin. Ew jî dibê kû "Ez evîndarê Xwedayê Teala me" Ev sînoren ku di helbestê de mîna namûsê derbas dibe, ji bo wî bêniirxe û negirînge. Ew sînore ku civakê li dora wî saz kiriye û jê re dibe astengî, nasnake. Dibê; "ez ne di sînoren we de, di sînoren Xwedayê Teala de tevdigerim. Ez di çarçoveya emr û nehyê Xwedayê Teala de tevdigerim." Rê û rêgezên pergale bînpê dike û li gorî pergala îlahî tevdigere. Îro mirovên bawermend ji ber bawerîya xwe, ji ber dirûvên xwe, ji ber nuxumandîna xwe, ji ber hizir û ramanên xwe tenê şermazarkirin. Lê belê ev bawermend bi taybetî yên li herêma me ji bo doza Xwedayê Teala bûne parêzer û leşker. Di vê rewîtiyê de her dem bedel didin û mîna **Bav Tahîrê ÛRYAN** evîndarên rebbê xwe nin.



# Em Herin Bêriyê

✍ Ehméd NAS

Bihar piştî sar û seqemê geş bû. Bi qudreta Xwedê, dar û newal tev şin bûn. Bixêr vê sebta bê emê herin bêriyê. Wê şivan civîne bidin maliya. Emê herin Hewşiyê Betta. Deng binav gund dikeve. Hin di ser taştê dene. “De zû law! Wextê bêriyêye.” Lez bi kuflet dikeve, firağa hazir dikin û davêjin ser kerê. Li dervê gund wek kervanekî dighin hev. Bêriyan ji hev re dibêjin “Te pîvaz anî?”

Çûna bêriyê roja pêşî bikêfe, wek da’wetê ye. Di rê de hem dişteğilin hem jî çavê xwe li şivanê xwe digerin. Her şivanekî nîşaneke wî heye. Nîşana şivanê me; kulavê zer e. Xwedî kulavê zer û keriyê pezê wî li sukura mezêl xuyabû. De heyde bilezînin. Emê herin bêriya xwe bigrin û kevirê ku ketine emê lêkin. “Mala qeymonçiya ne ava, kevirê me bar kirine.”

Bêri hazir bû. Bêriyanan şerwal û fanêrê berbêriyê li xwe kirin, wa ew jî hazir in. Şivan bizin dan pêşiya xwe û pez kişand bêriyê. Wê du zilam herkê li alîkî pez bidin bêri. Pîvaz di ser bêriyê re avêtin ji hev re. Û dûvre li ber bêriyê diçînin. Du pîrek jî wê bidoşin. Ji wan re digotin hellêbî. Hellêbiya jêhatî gulîskê bi ser satilê dixê. De bera du qiz jî bi serî bigrin. Ku yek bigre zor e. Hinek heywan mekroh in. Xwe li serbêriya diqelibînin. Hinek jî nigê xwe li satilê dixin. Divê baş bêne zeftkirin.

Ji şivên dipirsin, “Pez da’wa bêriyê dikir?” Yanî têr buxara meğel dihat, ma’na wê wextê bêriyê hat. Satil tijeh dibin, wê valakin. Kulavê şivan wê bikin talde ji bo ba lê nexê. Striyek xweşik jî bibînin, emê têxin devê kovika xwe. Maşallah galon tijeh bûn, tev satilan. Zarok radihêjin kevirê biçuk û kefa ser satila dixun. Şîkr û subhan ji Rebbê ‘alemê re. Mîh

û bizin li vê çolê gihayê şin dixun. **Û di nav xwin û rêxê ra şîrê sipî didin.** Ê kû bifikire, jê re gelek îbret tê de heye. Ku şîr hindik bûya, ji şivan re digotin. Te şiv û şevîn nekiriye. Şivan digot belê. Îcar wan jî digot: **Şiv û şevîn şîri, berî bêriyê tu meğelkî goştê mîha pîri, Hela xwedî ne li berî, Ma qû ne şivan jî kurî.**

De zûka bidoşin, wê cîran berî me xelas kin û serbêriya ji me bistînin. Bêri vala bû, mîha ku ji bêriyê revîya bû jî çûn di meğel de girtin û dotin. Dibêjin: Adar e, bibar e, ğedar e, ne bar e bihar e. ‘Ewr reş bûn, berî ku baran bibare, em xwe bigihînin malê. Îcar wê vegerin û alinçvan li ber pez bihêlin. Di turîkê alinçvan de gûz û hejîr hebûn. Alinçvanê me çillek bû. Çawa ji ba wî dan rê, ji xwe re got: “Ha di tûr de, ha di hûr de.” û ket ser, gişt xwar. Se’etê buxwe. Baranê dest pê kir. Kulavê zer kişand ser sere xwe.

Wexta alinçvan tuneba wê bêriyana bi xwe re taştîya şivan bianîya. Hêk ya ji bastêq diqelandin. Hineka jî helaw dianî. Mast ne dianîn, digotin wê xwewa şivan bê. Tenêbûn zahmet bû. Belê piştî her tengasiyê firehîyek hebû. Bêriyan vedigeriyan malê. Şîrê xwe diparzûnandin û germ dikirin. Şîrê germ berra teştê didan. Heta hinekî sar biba, wê havên kiribanayê. Zarokan binê beroşê dixwar. Ma tê bê xweş bû? Şekirê çeçolat li ber wê ne tiştêk bû.

Wextê nivro tê, divê ku firavîne deynin. Belê berî wê jî divê destmêj bigrin û nimêja nivro bikin. Tenê karê dinyayê nedibû. Ji axiretê re jî divêt. Ji xwe ê ku te’eta xwe kiriba û xwe ji gunaha biparêza, karê wî yê helal jî dibû îbadet. Xwedê qebûl bike.



# HARÛN REŞÎT Û FUDEYL B. 'IYAZ

✍️ Îsmâîl FURQAN

**F**udayl b. 'Iyaz êvarê li mala xwe runiştîye Qur'anê duxwîne, dema dighêje ayeta ku dibêje **"Ma hûn gûman dikin ku emê mirovên îman anîne û yê gunehkar wekhev bigrin"** (Casiye :21)

Ah di vê hengamê de Harûn Reşît û wezîrê xwe Fedl Bermekkî li devê derîyê Fudayl in. Harûn Reşît dengê Qur'anê his dike û dizîvire ser wezîr dibêje:

"Heger em şîreta buxazîn ev besî me ye."

Piştî herdû li derîyê Fudayl dixin. **Fudeyl dibêje:** "Ew kîye?"

**Harûn Reşît:** "Ez emîrul-muminîn Harûn Reşît im! Ji Kerema xwe re derî veke!"

**Fudeyl derî lê venake dibêje:** "Çi Karê Emîrul-muminîn la ba min heye? Ji kerema xwe re min Meşxul nekin."

**Wezîr:** "Ey Fudeyl îta'eta ji emîrul-mumin re wacib e. Heger bi xweşî tu derî veneke emê bi zorê vekin."

Fudeyl dîsa derî venake. Harûn Reşît û wezîr bi zorê derî vedikin û dikevin hundir.

Fudeyl ji bo wechê wan nebîne çirê vedimrîne. Harûn Reşît rûdinê, destê wî dighêje destê Fudeyl.

**Fudeyl dibêje:** "Ev dest çi qas destekî nerm e heger ji cehennemê azad bibe." **Harûn Reşît digrî û la-**

**vayî wî dike dibêje:**

"Ey Fudeyl! Ji Kerema xwe re hinek şîret li min bike."

**Fudeyl:** "Ey Harûn! Kalê te Hz. 'Ebbas (Apê pêxember bû) rojekê diçe ba Pêxember û dibêje "Ya Resûlallah! Min bike walîyê bajarekî."

**Resûlê xweda (s.e.w) dibêje wî:** "Mamo! Min te li ser nefsa te kire amir. Heger tu nefsa xwe bi 'îbadet û îta'eta ji xweda re meşxul bike ev ji bona te çêtire ji 'îbadeta Însana ya hezar salî. Çimkî serokantî roja qiyametê poşmanî ye."

**Harûn Reşît:** "Ey Fudeyl hinek şîretê din li min bike!"

**Fudeyl:** "Ey Harun! dema U'merê Kurê 'Ebdulêzîz bûye xelîfe gazî Salim b. 'Ebdullah, Rec'a b. Haywe û Mûhemmed b. Ka'b kir. Gote wan: Hevalno! Ez bo vî karî hatime amade kirin. Ez ketme bextê we riya xelasîya ji wê çîye? Pêş min bikin. Hevalê wî wiha bersiv dan: Ey 'Umer! Heger tu dixwazî roja qiyametê bi rûyekî sipî ji vî Karî azad bibî; ça'vê bavê xwe li îxtiyarên mîslumana binere; bi ça'vê birayê xwe li ciwanên mîslumanan binere, wek zarokê xwe li zarokê Mîslümanan miqatebe, û jin û Keçê wan jî xuşku dayika xwe qebûl bike. Heger tu wiha bike tê xilas bibe."

**Harûn dîsa lava kir û got:** "Ji kerema xwe re hinek şîretên din li min bike!"



**Fudeyl:** "Ey Harûn! Devleta Mislumana wek mala te ye. Însanên dewletê 'erz û iyalê te ne. Bi bavê wan re bi qencî û bi dayikê wan re jî bi başî mu'amelê bike.

**Di pêyre zivirî Ser Harûn got:** "Ey Harûn! Ez ditirsim ev wechê te yê xweşik di agirê cehennemê de bişewite û Qebîh bibe. Lewra gelek wechê weke yê te di cehennemê de şewitîne û qebîh bûne nuha di cehennemê de esîrin."

**Harûn Reşît:** "Ey Fudeyl! Ji kerema xwe re hinek şîretên din li min bike!"

**Fudeyl:** "Ey Harûn, ji xweda bitirse! Bifikire sibehê tê çi cewabê bide Xweda. Bersivê xwe ji nuha de amade bike. Lewra xweda roja qiyametê hesabê temamê însana wê bi te re bibîne. Ji bona tema- ma edaletê wê ji te buxwaze. Heger pîrekek îxtîyar bi tenê birçî li mala xwe raza be sibehê li meydana mehşerê wê bi dawa te bigre û bibe dujmin ji te re."

**Harûn Reşît** digrî heta riya wî ji hêstirê ça'vê wî şil dibe. Piştî dibêje:

"Ey Fudayl! Gelo deynê kesekî li te heye?"

**Fudayl dibêje:** "Belê deynê xweda li min heye, ku ew jî îta'et e. Heger ez wiha deyndar derkevime huzûra wî weyl li min be."

**Harûn** piştî hezar zêrî datîne ber wî û dibêje: "Ev zêr yê diya min e, helal e."

**Fudayl** zêrê wî Qebûl nake, dibêje:

"Weyl li te be Ey Harun! Evqas şîret bandor li te ne- kiriye." Piştî radibe diçe.

# XWEDA DAYE

✍ Cîhad GUZEY

Jibo jinê heyat daye  
Bêje heqyê ziman daye  
Rebbê 'alem pir mezine  
Binêr ewqas **nî'met** daye

Helal bixwe te'am daye  
Tetbîq bike Quran daye  
Netirse tu ji zaliman  
Wekî çiya **îman** daye

Yeqîn bike pê qelp daye  
Xêra bike firset daye  
Sebir bike li eziyetan  
Di paşî da **cennet** daye

Li pey here Resûl daye  
Nî'metê xweş Îslam daye  
Liber kufrê serî rake  
Feda bike wî **can** daye

Daykê rabe min kar bike  
Kar û tevger bo min bike  
Ji bo jêra feda bikî  
Xweda vaye "**Cihad**" daye



# SÛREYÊ ‘ADİYÂTÎ SER VATEYÊKO KÎLM

Bi nomeyê Homayê ko Rehman û Rahim o.

Qesem bi ay astueroni ke henjîyaye (henjîyaye) vazdonî,

Û qesem bi ayin rî ke (nalonê xu ra) adir pernenî,

Û qesem bi ayin rî serê sibe de gal erzenî(duşmenî ser)

(Û qesem bi ayin rî) Herindê lingonê yîn ra gerd bena ra(tuez û dumağ kenî tîmonî),

(Û qesem bi ayin rî) Xu verdenî mîyonê duşmenî,



✍ YUSUF ARİFOĞLU

Ina sure nomeyê xu ayeta yoyîni ra gurewto. Zey ‘Ebdullah b. Mesud, Cabîr, Hesên Basrî, Îkrîme û ‘Eta tayî ‘alîm vonî ‘Ina sure Mekkî ya!; zey Enes b. Malîk û Qatade tayî zî vonî ‘Ina sure Medenî ya.’ Labelê uslubê sure ra ma vînenî ina sure, Mekkî esena.

Ina sure, inay ra behs kena: Eg însôn, axîret înkâr bîker û axireti ra çafîl bimon in hal hetê ehlaq ra yi beno yo dereceya cêr. Rina behs bena ke, însôn axireti di tena ‘emelonê xu ra nê fikîr û hîssonê xu ra zî persîyen û hesab dono. O wext ‘Erebîstoni di xirabî, zulûm, anarşî zafî bî. Her ca di nêheqî, gûn, lec esti bî. Qebîlon, yobînan perişon kerdên. Ters ver, kes şew rehet nêkowten ra; çimkî ihtîmal

esti bi duşmenêk nizdiyê sersibe bierzoyin ser û ya malê yin talan û yan zî yin qetil bîkero yan zî esîr bîgero.

In durum, her cayê ‘Erebîstoni di û mintîqayê bînoni di vilabîyaye bi. Merdimo zulûmkar û tecavuzkâr wextêko bikowten ser, gureyê xu xirab ra başer bi, bi inay bîyen keyfwêş. O ku çerîb, belengaz û nêçaro binê lingon û mîyonê derdoni di menden; labelê çî wext merdimo çidar û zulûmkar, zulûm dî û darbêk gina ci fohmkerdene ke zulûm, nêheqî û anarşî çendek xirab a.

Sure, in meselono hinayin ser yo nîşone dona û vona: **“Însôn, nêzanî ser cuyiyaşêko mer-**



**gi ra dima wo înkâr keno û hesabêko dono Homê ay ser sist moneno."**

Zafê înonî, quwwetêko Homê do ci zafî ser o quwwet qey zulm, lec û gûn rişnayiş şuxulnenî. Hskerdişê mal, olad û dinya çimê yin hina kerdokuar çendek gureyo pîs, xebata xirab û reya ğelat esta ay raşt vînenî û depîşenî. Rabbê yi quwwetêko do ci cayo ğelati di şuxulnen, nonkuarî ken û hayê yi zî çînî ya ke aleyhê xu di şahîdî virazeno. Eg bizono ke wextêko kowt qebrê xu û qebrê xu ra wurişt şî raştîyê mehşer'a nîyet, meqsed, hîşê yi xirab û 'emelê yi pîs bena eşkera û dest, lîng û çimî yi gerreyê ey kenî çire hina nêkerden. O wext înon fohmkeno ke;

Kom hol o, kom dinya di sekerdo komî!

**Bi nomeyê Homayê ko Rehman û Rahim o.**

**1- Qesem bi ay astueroni ke henjîyaye (henjîyaye)<sup>1</sup> vazdonî,**

**2- Û qesem bi ayin rî ke (nalonê xu ra) adir pernenî,**

**3- Û qesem bi ayin rî serê sibe de gal erzenî(duşmenî ser)**

Ayeta yoyini di, qesdê 'Aye ke vazdonî' astuerî; çendek çend hebî mufessîr bivacen 'vazdayoğoni' ra qasid, deve yê. Labelê ina me'na binek dûr a. Ê ke vonî qasid 'astuerî' hina yo delil anî:

'صبح Dabha', yena me'nayê 'wexteko astuer vazdonî semede boyê xu veradayiş sowt vecenî.' In sowti ra vonî debha."

Rina ayeta diyin, hîrîn û çharini di kelîmeyê 'ê ku adir pernenî, helê sibe gal erzenî, tuez û dumağ kenî tîmon' vîyerenî qey astueron omîş benî. Îbn Cerîr, ina mesele di, vatê 'astueron' tercih keno; çimkî 'buyê xu veradayişê devoni ra' nêvonî 'dabhe'! Ina kelîme tena qey astueron şuxulyena. Îmam Razî zî, hina qebul keno û vono:

**"Kelîmeyonê in ayetoni ra qesdêko akerde 'astuerî'. Ling puridayişê kerroni di çeçî dayiş tena qey astueron o. Rina, serê sibe gal eştişê cayêk rina bi astueron beno."**

Adir vetiş, çeçî pernayiş taybetîyê qey ê astueronê ku tarîtiyê şewi di vazdonî. Kerroni ra çeçî dayiş tena şew bena.

'Erebni di usulêk esti bi. Çi wext yin bieştên dewêk, qebilêk ser tarîtiyê şewi de hereket kerdên. Vatên, ma roşnayîyê sersibe di her çî bivîn; inay ra nizdiyê şodirî wexteko rewî di cayê ku erzenî ser eştên ser. Hina kerdên wa duşmen xu pawitiş û gal yin eştiş ser fîrset nêvîno.

**4- (Û qesem bi ayin rî) Herindê lingonê yin ra gerd bena ra(tuez û dumağ kenî tîmoni),**

**5- (Û qesem bi ayin rî) Xu verdenî miyonê duşmenî,**

**6- (Ez sondî wuneno), Biraştî înon qey Rabbê xu zaf nonkuar o.**

**7- Û biraştî wu bi xu inay sera şahîd o,**

**8- Û biraştî wu/înon qey heskerdişê mal û milk zaf zixm(qayil) o.**

**'Henjiyayişê astuerî, bi vazdayiş çeçî dayiş, sersibê rew bi tuez û dumağ tîmonkerdiş gal eştişê cayêk, xu verdişê miyonê duşmenî'...** In çiyê ke ser sond dîyo heme qey astueron ê.

Tayê mufessîr vonî bêla in astuer inê mucahîdonê û yi hucum kenî kafiron serî. Hina nê ya. Îta di sond, 'nonkuariyê înon' sera wendiyo. Xura ayetê bînî me'na anî ina nonkuarî seri. Eg ê ke cihad kenî û reyê Homê di erzenî duşmenon ser yin ra behs bibo, dima behsê nonkuariyê înon bîyo in wurd ticadi nêbenî. Inay ra ma fohmkenî ke ayete verîn 'edetêko miyonê 'Erebni de bîyo vila û meşhur, hîş oncenî o 'edet seri. O 'edet çita wo:

'Erebî, omayişê Peyğamberî ma ra ver cayo rehet ra zulm kerdên, gûnê yobînon biela bibela rişnên û qabilêka çime yin birnên eştên ser û mal û canê yin telef kerdên. Dewrê cehaleti de, şew, tarîti çiyêko zaf zuari bî; çimkî wext biyên tarî her qebîla xu rî tehlukayêk pawitên.

Kom ça ra zono duşmen ça ra û çî wext hucum

1 Cif dayeye, boyê xu veradaye, cenisknaye



keno? Wextê ku bîyen tîj eştên roşnayî yo rehetî virazyên. Benatê qebileyoni di tena semedê duşmenî û nêyartî herb nêvecîyen; rê rê keyf ra, çimnêbarî ra, waştîşê talan kerdişê mal ra, qey kole kerdişê tuton û cinîyoni ra zî lec virazyeni.

Ina duşmenî, zulumkarî û nêheqî de yin zaftir astuer şuxulnên. Homa, în ayetoni de nonkuariyê însoni rî yo misal dono. Astuer, însoni rî yo nîmet o. Înson nişeno ci, bi astuer barê xu beno, gureyê însone keno şenik... Labelê yin in nîmet ra holî û başî ser nê, xirabî û nêheqî ser îstîfade kerdên. Îmkonêko Homê da bi yin, yin in îmkon reyê fesadî û zulumi de şuxulnên. Çikêko hinayin yo nonkuariya pîl a û hemî zî Homê rî sarevedartîş o.

Xora vîcdon û 'emelê zaf kafiron nonkuariyê yini rî yo delîl û şahîd ê. Ca ca ê kafirî biemrîyê Homê kenî, ca ca hukmê Homê qebl nêkenî, ca ca la erzenî benatî însone û bi qurretî zulum kenî, ca ca bi zuarî dest erzenî mal û namusê însone, ca ca zî estîyê Homê qebl nêkenî. Raşt ina wa, însone hinayin nê qiyetê nî'meti zonî nê zî Homê rî şikir kenî.

Ayeta heştini de, îbareyê *وانه لخب الخير لشديد* de xeyr tena me'nayê holî de nê ya; egleb me'nayê mal û sermîyani da. Ma ina me'na sureyê Beqera di ayeta 180i di vînenî.<sup>1</sup>

Kelîmeyê xeyr ça di qey holî û ça di qey mal şuxulyena sîyaq/vernî û sîbaq/peni ra bellî bena. Vernî û penîyê ina ayeti ra bellî bena ku kelîmeyê xeyr me'nayê mali di şuxulîyawa. 'Emelê însone hinayin nonkuariyê yi rî şahîdî keno. Inay ra qey merdimonê hinayin ma nêşkenî vaci 'Wu, holî ra zaf heskeno!' Encağ ma bi nişondayîşê ayetî ma eşkenî vaci 'Wu, mal û mülk ra zaf heskeno.'

**9- Gelo (însone) qey nêzono ê ku hê guer/ qebre di wextê ku erziye teberi,**

**10- Û (Wextê ku) O çiyêko ho sîneyoni de eşkera bi,**

**11- Biraştî, a ruc Rabbê yin, yin ra raştî ra xeberdar o.**

Însoneko merd o, ça beno û senî beno wa bibo bi şeklê xu verîn benî gonî. A îrade ku însone dona

1 *كَيْبَ عَلَيْكُمْ إِذَا حَضَرَ أَحَدَكُمُ الْمَوْتُ إِنْ تَرَكَ خَيْرًا الْوَصِيَّةُ لِلْوَالِدَيْنِ وَالْأَقْرَبِينَ بِالْمَعْرُوفِ حَقًّا عَلَى الْمُتَّقِينَ* / Eg şima ra komî rî merg ome fekê berî eg xu dima xeyrêk/malêk verdêno dayî, bayî û eqrebayo nîzdî rî nêheqîra dûrî wasîyet kerdiş biya farz.'

'emel kerdiş, gure viraştîş; nîyet, meqsed, fikr û hîsê yin a ruc-rucê qiyamet- benî eşkera. Ina eşkera bîyayîş ser holî û xirabî, heq û nêheq, raşt û çowt cîya benî. Tena bi gure, xebat û karo ku eseno qerar nêdiyeno. A nîyetêka qelbê yini di limtî mendi bî, o sîrrêko yin nê eştibi teber hemînê yin ra yeno perşayîş. Eg însone raştî û xueri ra bifikirîyo inay fohm keno 'edaleta raştîqin tena huzurê Homê di rucê qiyameti di bena raşt.

Qanunê ke ina dînya di bi destê însone virazîye guerê yini zî sucêk tena esayîş ser nê pîya nîyetê faîli zî sencîyena û hina qerar diyeno. Labelê dînya di yo mehkema zî tam nêşkena nîyet û qesdê kesî tesbît bikero.

Mavac, merdîmek bîela bîbela qetil bikero eşkeno vaco 'Wullê mi nêwaşt wa hin abi, mi encağ nefse xu pawit!' Eg delîlek çînî bo, ma ça ra zonî in merdim raştî yan zurker o. Nîyet û qesdê ku ho penîyê gure însone do encağ Homa zono û Wu zî guerê in zonayîşî ceza yan zî mukafati dono. In qerar tena bi zonayîşê Homê nê, bi kesbê însone yeno dayîş.

Homa, çendek nîyet û qesdê însone vercu ra bizon rina zî rucê qiyamet 'emelê însone guerê holî û xirabî, nîyet û qesdê însone bi terazîyê 'edaletî sencîyena û eşkera bena. Hînî komcî xeyr û komcî şer a mucnîyena însone.

Inay ra ayeti di îfadeyê 'O çiyêko ho sîneyoni de' şuxulîyo. *حاصل* me'nayê 'eşkera kerdiş yan zî vetîşê çiyê ko.' Misalen mavac, '**Sarê yi şikit û mezgê yi vet teberi!**' Rina *حاصل* me'nayê 'ciyakerdişê cizbonî' di şuxulîyena. Inay ra îta di în wurd me'na zî estî:

'Eşkera kerdişê çiyêko limtî yan zî ciyakerdişê holî û xirabî.'

**Homa, zaf hol zono ke; Kom ina dînya di sekerdo, çi nîyet pawito û kom ceza û komî zî mükâfat heq kerda, kom şino Cennet û kom şino Ceherme...**



# Ya Mûhemmed Fexra 'Alem

📖 Mela CEUHER

Navê te ye Rasûlullah  
'Işqa te me xiste dila  
De'wa te me daye mila  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Jboyî de'wa Îslamê  
Em tev rabûne qiyamê  
Lew derketine meydanê  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Em de'wetvanên Îslamê  
Xemla heyvên nîsanê  
Her tijîdikin meydanê  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Mewlida te-m hişyarkirin  
Li tarîxê em yazkirin  
De'wên batil danbarkirin  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Mezlûm tev rabûn qiyamê  
Wan dest avête Qur'anê  
Lew bûn serwerê cîhanê  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Behsa te-j mer mizgîn e  
Îflasa de'wa şeytîn e  
Heq û batil-j hev-d qetîn e  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

De'wa rast her de'wa te ye  
Wekî dî beyhude ye  
Li ber çavan eşkere ye  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Navê te hat ser lîsan  
'Alem helweşand meydan  
Umît da ehlê zindanan  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

Ji mewlida te-m têt nabin  
Tu car em te jibîr nakin  
Li ber zulmê esîr nabin  
Ya Mûhemmed fexra 'alem

مظلوم تف رابون قیامی  
وان دس آفیت قرانی  
بون سروری جهانی  
يامحمد فخر عالم

بحسا ته ژ مره مزگینه  
افلاسا دعوا شیطینه  
حقو باطل ژهف دقتینه  
یا محمد فخر عالم

دعوا راست هر دعوی تیه  
وکی دی بیهودیه  
لبر چعقا اشکریه  
یا محمد فخر عالم

ناقی ته هات سر لسانان  
عالم هلوشاند میدانان  
امید دا اهلی زندانان  
يامحمد فخر عالم

ژمولداته م تیر نابن  
توجار ام ته ژبیر ناکن  
لبر ظلمی اسیر نابن  
يامحمد فخر عالم

ناقی تیه رسول الله  
عشقا ته مه خسته دلا  
دعوی ته مه دیه ملا  
يامحمد فخر عالم

ژبویی دعوی قرانی  
ام تف رابون قیامی  
لو درکتین میدانی  
یا محمد فخر عالم

ام دعوتقائین اسلامین  
خملا هیفتین نیشانین  
هر تژی دکن میدانی  
يامحمد فخر عالم

مولدات م هشیارکرن  
لتاریخی ام یازکرن  
دعوین باطل دان بارکرن  
يامحمد فخر عالم







# ÇÊROKA HOSTAYÊN KERISTANÊ

✍ 'Ebdulbaqî BOTÎ

Li welatê Keristanê kurtançêkerek meşhûr hebû. Kurtanên ku vî hosteyî çêdikir, li pişta kera nedixist û pişta kera nedişand. Navê vî hosteyî Hostê Xweşik bû. Hostê Xweşik ji keran pur 'hez dikir. Lewra kurtanên nerm û xweşik ji keran re çêdikir. Her çi qas **Hostê Xweşik** ji keran 'hez bike jî hinek kerên Keristanê qet ji Hostê Xweşik hez ne dikirin. Zen dikirin ku Hostê Xweşik nebe, wê Keristan bê hoste bimînin û kesek wê kurtana li pişta wan neke. Digotin qey wê kerên Keristanê tev azad bibin.

Ji bo ku Hostê Xweşik zû bimre her şev hinek kerên Keristanê berî nimêja sibehê radibûn şevnimêj dikirin û Cewşen dixwendin. Paş xwendin û

nimêjê tev bihev ra nifn û beddua li Hostê Xweşik dikirin. Paş demekê Hostê Xweşik nexweş dikeve û êdî nema dikare kurtana çêke.

Xebera nexweşiya Hoste Xweşik li Keristanê zû belav dibe. Hinek Kerên Keristanê bi twêt, fêsbok, baylok û bi medya civakî li ser internetê xeber didine hev û bi kêfxweşî li kolan û cadeyên Keristanê bi zirezir dimeşin û li meydana Keristanê tev kom dibin.

Li Keristanê pîrekerekî rîsipî û dinyadîtî hebû. Ji lawê xwe dipirse, dibê: **"Lawê min eva xêre îro çi bûye ji van kera, ewqa dikine zirezir?"** Lawê wî dibê: **"Kalo ma te ne bihîstîye çi bûye?"** Pîrekerek dibê: **"Na, ma çi bûye lawê min?"** Law dibê:



“Kalo Hoste Xweşik li ber mirinê ye. Bona vê yekê em ewqa kêfxweş in. Pîreker, bîstkê mitale dike û dibê: **“Lawê min! Ma kêfxweşiya kera bona mirina Hostê Xweşike?”** Law dibê: **“Belê kalo.”**

Pîreker dibê: **“Lawê min! De were em jî herin meydana Keristanê. Da em bizanibin pirsgirêk çi ye û çareserî wê çi be.”** Li meydana zirezira kera ne, tev dibên **“ke-ra-re, a-za-dî, ke-ra-re, a-za-dî”** Bi vî dengî zimme zimm ji her derê Keristanê bilind dibê û yek dengê ê dinê nabihîse...

Pîreker, hêdî hêdî derdikeve ser platformê, radihêje mikrofonê û du sê caran uxtê uxt dike, gewriya xwe paqij dike. Kerên li meydana kom bûne, hêdî hêdî dengê xwe dibirin û gohdarî pîrekerî dikin.

Pîreker, mikrofon di desta de rast û çep dinêre û hêdî hêdî mikrofonê nêzî devê xwe dike. Cardin deng ji meydana bilind dibe. **“Her bi jî Pî-re-ker... Her bi jî... Pî-re-ker...”**

Hêdî hêdî deng kêr dibe û Pîreker dest bi gotina xwe dike: **“Gelî hevalno! Îro civîna me li vî derê civîneke dirokî ye. Belê ez naxwazim wextê we zêde bigrim. Ê di nav we de herî rîsipî û serpehatî ezim. Ez dinêrim iro hûn tev bi nexweşbûna Hostê Xweşik pur kêfxweş in.”** Cardin deng ji meydana bilind dibe: **“Bimmm-re... Hos-tê-Xwe-şik, bimmm-re, Hos-tê-Xwe-şik”** Pîreker dibê:

**-Gelî hevalno!** Çewa ku hun dizanin berî niha Hostê Silik û Hostê Reşik hebûn. Ez bawerim pur kes ji we ev herdu hoste dibûn. Hun jî dizanin ev herdu hoste ocaxkor û bê zurriyet bûn. Bona vê yekê mer’hemet çiyê ne dizanîn. Ji xwe ez be’hsê ji ên berya wana nakim. Lewra ew dewr dewrek pur tarî bû. Wê çaxê bê kurtan bar li piştta me dikirin. Piştta me tev dibûn birîn û sax nedibûn. Ger hun baweri naynin werin li piştta min binêrin.

**Hoste Silik** ji xwe ne hoste bû. Şivan bû. Belê weke gurê postê bexê li xwe ke, xwe dixiste her şiklê. Bi vî awayî heft carî çûye û cardin hatîye. Dewra **Hoste Reşik** jî pur bi tengasi derbaz bû. Hoste Reşik ne hosteyek baş bû. Kurtanên wî çêdikir piştta me diêşand û tev dikir birîn. Sibê heta êvarê em dixebitîn, êvarê jî alifê ku me têr bike ne didane ber me. Em tev bi zikê birçî sibê cardin diçûna ser kar û diketine bin bar.

Piştî Hostê Reşik û **Hostê Silik**, Hoste Kinik dest bi kar kir. **Hostê Kinik** ji hosteyên berîya xwe hostetir bû. Kurtanên çêdikir piştta me ne diêşand. Êvarê jî alif didane ber me, em birçî jî ne diman. Belê tenê alifê me bê ceh bû. Lewra ceh alifê kerên mezin bûn.

Bona Hoste Kinik jî, wê çaxê hinek hevalên me nerazibûna xwe nişan didan. Belê piştî mirina Hostê Kinik ‘halê me cardin nexweş bû. Hosteyên piştî Hostê Kinik ne hosteyên baş bûn. Cardin alifê me kêr kirin û em birçî dihiştin. Ji xwe kurtanên li piştta me dikirin piştta me diêşand.

**Gelî hevalno!** Ev gotinên ha tev bi serê min de hatine. Ji xwe zor û zehmetiyên ku bi serê bab û kalê mede hatî ez nikarim bêjim.

Carcaran kalê min digot: **“Lawê min tiştên ku bi serê me da hatî bi serê gurên çiya de neyên.”** Digot: **“Lawê min, Keristan welatekî xweş bû. Çi hate serê me, di dewra Hoste Şînik de hate serê me. Hoste Şînik li xerbistanê bûbû hoste. Tiştêkî ku ne li gor xerbistanê ba tev şewitand. Keristan talan kir. Avahiyên ne li gor xerbistanê tev xera kir. Axur jî nemabûn ku kes lê bisekine. Bona vê yekê mizgeft kirine axur. Belê di mizgefta de jî ne dihiştin kesek berê xwe bidine qiblê. Çiko qible ne li hêla xerbistanê bû. Hoste Şînik dixwest herkes berê xwe ji qiblê veqerîne û bide xerbistanê, bona vê yekê jî ji dil şer kir.”**

Belê çend şêr ji çiyayên şerqistanê deng didin û li hember Hostê Şînik bi mêranî radibin pîya. Bi vî awayî şêr ji xwe haydar dibin û li her derê serî hildidin. Belê mixabin xiyaret ruê xwe yê reş cardin nişan dide. Hirç û gur û çeçel bi alîkarîya xayîna şêra êsîr dikin û ji holê radikin. Kesek ji tîrsa êdî nema bi şêranî derkeve pêş. Hingê kurtan û bar li puştta şêran jî dikin û weka kera wana jî bê deng dihelin. Carcarna eger şêrek serê xwe hilde û bêje: **“Ma em kerin, eva çi kurtane li piştta me?”** Gur û çeçel, bi tevê xayîna, li şêr tene hev û wî ji holê radikin. Lewra gur û çeçel û xayîn qet ji şêran ‘hez nakin. Dizanin cihê ku şêr lê dijîn li wir cihê jiyane ji wan re namêne.

Bi vî awayî dengê şêra hercar tê birîn û herkes bi keritîyê razî dibe. Ji xwe lewra navê welat bûye



Keristan. Evana jî siloganên keristsnêne.

**“Her kerekê keristanê bedel dinyakî ye”**

**“Xwezil bi wî ku dibê ez kerim”**

**“Keristan welatê kerane”**

Her çiqas em ne kerbin jî lakîn xeyn ji kera mafê kesekî tine ku li keristanê bijî. Bona em bikaribin li keristanê bijîn, bivênevê me jî xwe dixiste rengê kera. Belê li gor kerên keristanê rengê me hinekê reş dima. Ji ber vê yekê alif jî ne didane ber me, alif didane ber kerên boz tenê. Bona vê yekê hinek hevalên me yên çavbel hebûn, li nav tozê digevizîn, xwe bi tozê boz dikirin û digotin em jî kerên bozin. Lazime alifê bidin ber me jî.

Kalê min digot: **“Her roj zor û zehmetî zêde dibûn. Ji ber vê yekê li her derê Keristanê serhildan çêdibûn. Hoste şînik bona van serhildana bitemisîne û bi’eciqîne, li cîyê xwe de şagirtê xwe Hoste Kerrik Dani”**. Kalê min çî demî behsa dewra Hoste Kerrik dikir, rudinişt û digrî. Digot: **“Wê çaxê ez, çar/pênc salî bûm. Li ber çavê min, bi sedan şêrxistine axurekî û agir bi axurê xistin. Babê min, şeş mamên min, yazdeh birayên min, çar xalên min, li ber çavê min şewitandin, hê jî qêrînên wan li ber guhê mine.”** Li herderê Keristanê ev deng bilind dibû. Belê Hoste Kerrik ne dibihîst. Çiko ji herdu gohên xwe kerr bû. Paş Hoste Kerrik Hoste ‘Edik hostetiyê dike. Dewra Hoste ‘Edik hinek firehî çêdibe, carcarna alif didane ber me. Belê Hostê ‘Edik jî ji teref gur û çeqela ve tê girtin û tê xeniqandin.

Ji xwe paşê hingê gur û çeqel hîn dibin, deh sala carekê ji hewingê derdikevine û dikevine nava gund û bajara. Kesekî ku rengê şêra lê dide, teva dixine heps û zindana û her û daîm zindanên keristanê tije şêrin û vala namênin. Paş hingê kalê min bi van kul û derda serê xwe datêne û diçe ber dilovaniyê.

**Gelî hevalno!** Çewa ku hun dizanin di dîroka Keristanê de, Keristan tu carî bê hoste nemaye û wê bê hoste nemêne jî. Madem ‘hal eve, lazime ku em hosteya nas bikin. Ka kîjan hoste zêde me naêşîne û barên giran li me nake. Eva çend sale Hostê Xweşik hostetiyê dike. Birastî Hoste Xweşik şagirtê Hoste Necik bû. Hoste Necik çawa ku hun jî dizanin, ne li Keristanê tenê, li tevê dinyayê hos-

teyekî meşhûr bû. Mixabin hirç û gur li gel çeqela bûne yek Hostê Necik ji kar dûr xistin. Eva jî ji Hoste Xweşik re bû ders û bêhtir hay ji xwe ma. Eva îro dewra Hoste Xweşike. Çawa hun jî dibînin kurtanên Hoste Xweşik çêdike nerme li pişta me naxe û pişta me birîn nake. Hem têr alifê dide ber me û hem hinek ceh jî li ser dike. Dibe ku carcarna barê giran li me bar bike jî, belê çaxê em ewan hosteyên din bênine ber çava, em evê zêde nakine pirsgirêk. Lewra karê me barkêşandine.

Ji xwe gotinên mezina ye. **“Ger em ker bin, kesên bar li pişta me kin wê her hebin.”**

**Gelî hevalno!** Ger hun guh bidin min, ezê evê jî ji wera bêjim. De ka ez evê mikrofonê bigirim, bila kes dengê min nebihîse û hun jî ji kesekê re ne bêjin, lewra bizanibin ku em ne kerin wê jiyane li me bikin tarîstan û keristanê li me bikin zindan û goristan. Jixwe heta em kertiyê qebûl bikin, Keristan tu carê namîne bê hoste û em jî namêninin bê kurtan û hefsar.

Lazime em bawer bikin ku em ne kerin, em jî îro pê da li ser pişta xwe kurtanên tu hosteyan qebûl nekin û em ji tu kesî re keritiyê nakin, wê çaxê emê serfiraz û azad bimênin. Çepik...”

**Dekanê em henek û lakirdîya bihêlin li hêlekê, û em werin ser heqîqetê.**

Bi rastî her hêzekê beşerî hefsarek di desta de ye û li pêş insana kemîn vedane. Kesê ku bikeve kemîna wan heman demê wana êsîr digrin, hefsar diken û li puşta wan siwar dibin. Weka kera ji xwe re bar dikin û li kîjan derê dixwaze berê wana dide ne wê derê. Bizanibin hêzên beşerî tev herîceqan û çiravin, insana di xwe de difetisînin. Belê Ellahê dilovan, bi rehma xwe ji bona insanî ji van kemîn û herîceqanê bi selametî derxe û têxe ewlehîyê, me haydar dik e: **“Tev bi benê Ellah bigirin û ji hevûdû nefelişin”**

Ev benê Ellah dirêjî me kirî, çaxê em xwe pê bigirin, emê ji tevê hefsar, kemîn û defikên xapînoka azad bimênin û bikevine ewlehîyê. Lewra Xuda bi benê xwe insan û insanîyetê ji tevê nebaşiya derdixe, hildikşîne jor û bilind dike.

**Azadî me û we teva dorpêç bike, bimênin di xêr û xweşiyêde.**



# GOTINÊN PÊŞÎYAN

✍ Mehmed TIBYADÎ

- ❖ Mezinbûna gunda di pa'niya riya de xûya ye.
- ❖ Konê reş bênamûsiyê qebûl nake.
- ❖ Dê û dotê şer kir, bêa'qila bawer kir.
- ❖ Ji welî dikeve xwelî, ji xwelî dikeve welî.
- ❖ Malê ne ji ewladê çê û ne ji yê xirab re bihêle.
- ❖ Heçî bi mal e bi xaltîk û xal e, û yên bê mal e bê xaltîk û xal e.
- ❖ Agir bi erdê dikeve, terr û hişk tevî dide ber xwe.
- ❖ Xweş xeber e lê min jê ne bawer e.
- ❖ Mêvan ji mêvan nexweş e, ma'zûban ji herda nexweş e.
- ❖ Di şer de xal û xwarzê, di xwarinê de ap û birazê.
- ❖ Serê du beranan di beroşekê de hilnayê.
- ❖ Dîkê çê di hêkê de azan dide.
- ❖ Golikê malê ji gayê malê natirse.
- ❖ Dîwaro ez ji te re dibêm, bûkê tû fêm bike.
- ❖ Çavê li derîya xwelî li serîya.
- ❖ Rê dibe bihost dujmin nabe dost.
- ❖ Da'şikek meriv hebe, barê meriv li erdê namîne.
- ❖ Ku simbêlê lawê te çêbû, riya xwe kur bike.
- ❖ Ku şêr ji newalê dibe xalî, rovî lê dibe walî.
- ❖ Şêr şêr e, çî jin e çî mêr e.
- ❖ Berê xweha li bira ye, berê bira li çiya ye.
- ❖ Sikût zêr e şiteğalî zîv e





# LEZ BAR XU JÊK

✍ Nurettîn KAWARÎ

Qaz û quling serhad ra şî berri  
Bi toq u dêzewî qerî yin şî azmon tari  
Cıtkar û şonî ena vaqa ra ders nêgené bi verg hari  
Ûmri bêbexton ho şino zê hori  
Lez bar xû têk.

Tij kota gil darono, hini şono  
Dest xû lez bigéré, kerwon şino  
Dınya biya zerrıkı hor şino  
Wirz xû ser eka zimiston yeno,  
lez bar xû têk.

Mûné kot biyo kuz, nûn toqe ra kotû leti  
Guné nê gerena dûmaron ra, felek ra kotû weti  
Herdiş biya sıpi, çim bi tari, por kotû rutı  
Awé xûsl biya germın, wuyayış kotû meftı  
Lez bar xû têk

Nûn û sol biryawa, fermon homa yo  
Rê gurên , varon vareno  
Payiz peyin, derd girono  
Lay û goçin bi hedrı,  
Lez bar xû têk.





# BIRA DEST ERZENO BIRAYÊ XU

✍ İbrahim ÇABAĞÇURİ

Zimistoni ra rucêka serdi bi. Hewa 'endêk serdi bi teberi di gonîti ser yo 'elamet çîni bi. Husên şebaki ra onên teberi ra. Bad wextêk, onîya sareyê kuçe ri ra di hebî tutî yeni. Halê yin balê Husên onti. Tutêkon in serdi di erebayê kaşkaş kaşkerden û seba in kaşkerdişî zaf bî rencon, mîyonê areqi di mendî bî. Zerrê ereba di kağit estî bî. Tutê ke ome nîzdî, Husên onîya kinci yinî zî diryaye û pînekerdî bî. Husên xiyalê xu di, xu û in tutî nê tîver! Wu in serdi di keyê di bi. Wuadêyo germi di ders xebityen û bavî yi zî wazîfedarî bi. Ê wurdî serdê teberi di qey debareyê xu kağit denê arî û kuçe ra kuçe bine erabayo giron û xişni de kirîştên.

Halê in qicon Husên ser tesîrêko pîl viraştî. Zerê Husên yini rî deca. Zeg çîkêk omi bî iyi virî nişka cê xu ra erzîya û şî mitfağ. Dayê yi wuer viraştên:

**-Dayê! Kuçe di di hebî tutî est î. In serdi di kağit donî arî. Labelê ez vono yi zaf mîsel bî. Ma nêşkenê yini rî binek ardim bikeri?** Dayê yi ina qalê Husên ser huya. Gurê xu ra dest vera da û qiftonê Husênî ra depîşt û bi sowtêko nerm va:

**-Lawê min o zerwêş. In hali di zaf insonî est î. Ma dest bierz kom û nêertz komî? Tî şu, wazîfeyê xu biqedin!**

Husên, qalonê daye xu ra zaf şîkiya. Husên, mitfaği ra vecîya, zaf qehiryaye bi. Rina şî şevak. Tutî hema zî kuçe de bî. Verê beroni ra kağit dene arî û cayêki ra zî serd ver ra destî xu eştên pistina xu. Rina xiyalê xu di xu û ê wurdî nêtîver. Kinci yi zaf zafî bî. Bî dayî û bayî yi rê rê pîrîkê, xalê yi zî cî rî puetî ardên, xela kerden. Qerar da û xu xu va:

**-Muhaqqaq, ez eşkeno çîk bikeri! Tewr tay ez eşkeno kinconê xu ra bi dî, in wurd birayon. In fikirayîş ser şî wuadeyê xu. Bi leza lez poşetêk dî û kinci kerdî ci. Hedî hedî ber kerd a, onîya dayê yi ha mitfaği di bîlbîyaye gûreye xu biya. Vecîya teber, tutî hîni rasebî peniye kuce.** Husen, bivazd yin dima vazda. Bad çend deqqon rasa yini. Zaf bi rencon û bi ina renconî veng da:

**-Vinderên! Labelê ê wurd lacêki nêvindertî. Benatê yini di tay yo mesafe estî bî. Rasa yin û destê xu da kiftê yo lacî. Lacêk, agera û onîya rî Husenî ra. Bi 'erebî çîk va.** Husên, fohmkerdî ke in wurd lacî mihacir î û Suriye ra ome. Nêzonen derdê xu yinî ra sînî vaco, tena poşet kerd derg. Lacêk, poşet gurewten labelê lacêko bîn birayê xu ra hersbi. Ê wurd birê rina kowtî reya. Destê Husenî pa poşetî



ra hewa di mendî. Husen, yin dima bi fekêko bermaye va:

**-In kinci ine şîma yê, ez rîca keno bîgerên! Ê wurdînon çîk awir nêda Husên û reyayê xu dewom kerd. Husên, ina holî ser hewk qerar dabî. Gera in kincon bido yin!** Husên qayilî bi kincon hina bido yinî ku wa zerê yin nêverdo. Hetê penî ra bi vazdayîş zivirîya ku bivecîyo vernîyê yin; labelê Husên hema nêrasabi yini û kutîkêk ome yi ver.

Kutik, hem xişn hemî zî veşon esenî. Husên zaf tersa û ti vaten bêla qurfê yi qerifiya. Nêşkiya biramo, gera nêrameni zî. Mat mendibi, nêaftên nefesi zî bîgero. Hîn tay mendibi qelbê yi ca ra vecîyênî. Nêşekno biqerîyo, biramo û bilerzo. A lehza çîkêk kowtî vetê Husênî. Kutik, hevîliya o hetî. Husên, onîya lacêkonî Suriyeyijoni ra yo yî, mîyonê qirş ra letêyê nonî eşti bi. Kutik, xura veyşonî ra bêhal mendî bi û xu cad eşt leteyê nonî seri.

Husên, ina holî û ardimkarî ra hem bi wêş hemî zî şermiya û xu xu va:

**-Gera inay ra pê se biker û nêkerî in kincon bidî yini.** Bi sowtêko berz û qerarin va:

**-Ma birayê yobînonî. Eg şîma mihacir î, ez zî ensar o! Şîma çîra xelayê mi nêgenî. Ez rîca keno, şîma mi zaf metengnên! Lacêko qic, onîya birayo pîlî ra. Birayo pîl, gurewtîşê xelayê husenî bi çîmonî xu tesdîq kerd. Birayo qici zî poşete kincon,** Husên destî ra gurewt û bi yo Tirkîyêka tîmonkerde va:

**-Homa, tu ra razî bo bira! Wurd biro, poşetê kincon gurewt û reyayê xu ra şî.** Yi heta verê çîmonî ra bîvînî Husên, yin dima ra onîya. Şaşmendî, şayî, ters û zerwêşî... Halê Husên hina bi...



# TESEWWÛF-5

✍ M.Ce'fer BÊCIRMANÎ

**T**esewwûf, 'ilmekî berfireh û kûr e. Ji bo fêma û jiyana wê xwendin ne bes e. Ji ber vê yekê 'arifan gotine: "Yên tam neke nizane." Ji bo zanîna wê tam kirin mercê yekem e. Ji bo tam kirina wê jî divê mirov serî têxe vê rê û xwe teslîmê Şêxekî Kamil bike. Dema mirov xwe teslîmê şêxekî kamil kir wê demê seyr û sulûk destpê dike û di heman demî de îrada meriv êdî ji destê meriv dertê û dikeve destê şêxê kamil. Ji bo kemala seyr û sulûkê ev yek pêkan e. Lewra dema meriv derdikeve rêyeke dûr û nizane, meriv tabî'ê yekî zana dibe. Ev ji bo gihîştandina meqsedê pêkan e. Di dema çûyînê de meriv muxalefeta rêberê xwe bike dê meriv rê hundake. Seyr û sulûka di tesewwûfê de jî dişibihe heman tiştî. Bi tenê ferqekî di navbera wan de heye. Ew jî; yek: Rêya maddî ye. A duduyan: Rêya manewî ye.

Rêwiyên rêyên manewî ji rêwiyên rêyên maddî pirtir muhtacê rêbertiyê ne. Lewra Resûlên Xweda silav li ser hemiyana be, ji ber vê pêkaniyê ji alî Xweda Te'ala ve hatine şandin. Xatemê Resûlan Hezretî Muhammed 'Eleyhîsselat û Wesselam jî bi peyva xwe ya şerîfa sehîh: "Alim warisê pêxemberan e." Wazîfa rêbertiya însaniyetê li piştî 'aliman kiriye. Her 'alim di beşa pisporiya xwe de vê wezîfê pêk tîne û divê pêk bîne. Pisporek qelb û dilan jî li gor ehlê tesewwûfê şêxên kamil in û li gor edeba tesewwûfê divê murîd her dem li pey wan herin. Lê ji bo lipeyçûnê divê şêx jî xwedî hinek taybetmendiyan be. Îbrahîm Heqqiyê Erdêromî di vê mijarê de pirtûkek bi navê "Însanê Kamil" nivîsandîye û xweş beyan kiriye. Ji ber vê yekê, emê jî jê îstîfade bikin û wesfên ku divê di Şêxê Kamil de hebin hin ji fêma xwe ya tesewwûfê û hin jî ji pirtûka wî bijmêrin.

Însanê Kamil Kî Ye?

Însanê Kamil ew kes e ku divê ev taybetmendî pê re hebin:

**A Yekem:** Ew di her kirin û tevgerên xwe de li pey Quran û Sunnetê û rêça selefên salih e.

**A Duyem:** Di dilê wî de 'eşqeke tam ji bo Mevlayê bi zatê xwe pak û temize heye. Digel vê yekê di dilê wî de li hember Zatê Akdes tewhîd, tewekkul, tefwîd, tehemmul, teslim, kemal û razîbûn heye. Ji bo wî bi dilxweşî terka kêfxweşî, pesin, xwestekên nefîsê û hewa xwe dike, yanî: Ji bilî wî Zatê Eqdes terka her tiştî dike û feqîrtiyê qebûl dike. Lewra ew însanê kamil, di deryaya muşaheda Xweda de fetîsiye. Ji ber vê yekê çî bê serê wî li hafa Xweda Te'ala edeba xwe xira nake...

**A Sêyem:** Însanê kamil, du'a û xwestekên wî li ba Xweda yê wî meqbûl in û tu demî nayê vegeandî. Lê ji ber ku edeb û heya wî gelek li pêş û zedeye, jê tu demî daxwazî nake. Lewra însanê kamil, tevî perçên kaînatê, tevî zerreyên wê, di destê qudreta Xweda de dibîne. Tevger û seknên tevî mexlûqatan, bi xuluqandina ji tunebûnê bi destê Xweda Te'ala û bi hikmet dibîne. Her kar jê re di cî de, xweşik û şîrîn; her tevger jê re di wext de, bi awayekî herî munasib û bilind xwiya dike...

**A Çarem:** Însanê Kamil, li nig Mewla xwe gelek bi rûmet û xwedî qîmet; di nav gel de evîndarên dilan û layiqê rûmetê ye. Evîna mirovan yê jê re eserê hêzeke ku mirov mecbûrê evîna wî dike û sedemê wê nayê zanîn. Sedemê rûmetgirtina hezkîroxan evin, a xerîban jî ev hêza ku nayê zanîn e. Digel vê evîna zêde jî ew tu demî îltîfatê bi bal wan ve nake, bi tu awayî hez ji zaliman nake. Bi vî awayî jî agirê tebîet û exlaqê wan di ewlehiyê de dimîne... Ewî, ceribandîye ku ew çiqas xwe ji însanan dûrke jî ew bêhtir nêzî wî dibin.

**A Pêncem:** Însanê kamil, bi ilhama: "Ey Evîndarê min! Tu sîrrê min û ez jî sîrrê Te me" jî êş û janên



xwe azad bûye. Ji meqamê 'ilm-el yeqîn gihîştîye meqamê 'eyn-el yeqîn û bi wesleta meqamê heqq-el yeqîn gihaye meqamekî ku naheje. Batinê vê alema ku ava û xiradibe jê re xwiya bûye. Îşareta: "Herçî tiştê li ser rûyê zemînê dê winda bibe" bi ilham zanîye. Ji zikrê Xweda tu demî dûr namîne. Ew, bi tevî bedena xwe, bi dest, dev û dilê xwe yê safî zikrê Xweda Te'ala dike, tu demî jê ğafil namîne.

A Şeşem: Di çavê Însanê kamil de, xwarin û bêhnên herî bi qîmet û yên bê qîmet; cil û bergên herî delal û nedelal wek hev in. Ji ber vê yekê li nig wî ferqa, hevîr û nan, birinc û ce, sîr û misk, hirî û hevrişim, doşek û kulav, xort û yextiyar, namdar û bêxwedî, beg û feqîr, biçûk û mezin, hindik û pir nîne. Kîjan ji van hebe yên li miqabilê wî hevî û daxwaz nake.

A Heftem: Însanê kamil, di birçîbûn û têrbûna xwe de, di razan û hişyariya xwe de, di peyv û sukûta xwe de, di tevî 'îbadet û adaten xwe de, xêrtirînê karan rêya weset (navgîn) dişopîne. Ango: tevî kârên wî ji ifrat û tefrîtê dûrin. Lewra kamiltirînê kamilan û rûhê rêberên riya heq Hebîbê Ekrem 'Eleyhîsselat û Wesselam wiha kerem dike: " Sond bi navê Xweda Te'ala ku ez ji we hemiyar pirtir ji Xweda ditirsim, ji we hemiyar pirtir ji muxalefeta fermanên Xweda Te'ala xwe diparêzim. Di gel vê yekê ez rojî jî digrim û difitirim jî, limêj jî dikim û dirazêm jî û bi jinikan re dizewicim jî."

A Heştem: Însanê kamil, dema 'ehdek da tu demî ji 'ehd û peymana xwe navegere. Her tiştî têxe cihê wê û ji xetika 'edaletê zerreyek durnakeve. Kesê ku di derheqê wî de bi xirabî bipeyve feqîrbe jî tu demî wî mehrûm nake. Hin dema hewqas camêrî dike ku yên lê dinihêrin dibên qey îsrafê dike. Dema ne cihê wê be hewqas qeder hindik dide, yên li dora wî dibên qey tima û destgirtî ye. Di tevî kare xwe de xêzikeke di navbera ifrat û tefrîtê de digre. Daîma 'eybên mirovan diveşêre, 'eybên kesî ji tu kesî re nabêje. Bi taybetî jî sîrrên dilan, hewqas qeder dibarêze ku tu tiştêk jê aşkere nake. Nefsa wî, bi qasî ku ji tu mirovî re dest veneke dewlemend e. Hewqas qeder xwediyê exlaqekî xweş e ku tu demî hêrsa wî nakeve pêşîya hilma wî. Ji tu kesî re peyva nexweş nabêje.

A Nêhem: Hal û karê wî her dem xêr û 'îbadet e. Nefesên wî yên pak her dem tesbîh û pîrsa nexweşan e. Peyvên wî yên şîrîn, 'ilm û hîkmet in. Zimanê wî yê dibê, bi lezzet û şîrîn e. Wechê wî yê xweşik şahî dide û qeflê dilan vedike. Kesê ku vî zatê mubarek dibine, Xweda Te'ala bibîra wî tê û di 'ezemeta wî de difikire. Çawa Xweda bibîra wî kesî neyê? Lewra wechê dostê Xweda dîtiye. Bi van hincetan û ehwalên fewqel'ade însanê kamil xwiyayî û weke rojê aşkerene.

Di hejmareke din de Xweda bê erê emê peyva xwe ya di derbarê şêxê kamil de bidomînin.

Bimînin di xêr û xweşiyê de.





# DI WARÊ DANASÎNA TESEWUFÊ DE FÎLMEKÎ BALKÊŞ: (BAB ‘EZÎZ)

✍ Cewdet KARAMAN

Her dem û dewr çek û sîlahên xwe yên rewacî hene. Di destpêka însaniyê de belkî şûr û meretal li rewcaê bûn. Lê çawa ku **Bedî’üzzeman** jî dibê:

**Serdestiya li ser medeniyên ne bi cebrê, belkî bi qani’kirinê mimkûne. Di qirên me de çekê herî rewacî fen û huner in.**<sup>1</sup> Belê bi derbasbûna demê re ev heqîqet hê çêtir tê fêmkirin. Lewra di vê ‘esrê de çek û sîleh hêdî hêdî ji rewacê dadikevin. Îdî dem dema teknoljî, qani’kirin, sin’et û hunerê ye.

Digel ku ji destpêka nubuwetê bigre heta nuha, bi hezaran kitêb li ser hezertî pêxember hatine hunandin jî, em dikarin bêjin ku li ser însanan tesîra Filmê Dawet (çağ-ırî) ji van kitêban zêdetir e. Lewra ne mimkune ku herkes van kitêba bixwîne. Lê mimkune ku giraniya însanan li ser rûkê cihanê, bi wesîla înternet an jî televizyonê vî filmê sêr bikin û bi wesîla vî filmê Îslamê binasin. Belkî jî ev naskirin ji wan re bibit wesîla destpêka lêkolînên Îslamî.

Filmê Bab ‘Ezîz jî filmekî balkêş e. Ku di derhêneriya hunermendekî Tûnûsî de hatiye hûnandin. Ev film, filmeke îrfanî ye. Di vî filmê de gelek xalên îrfanî û tesewufî veşartî ne. Em dikarin di serî de bêjin ku filmê Bab ‘Ezîz, hê di destpêkê de wijdana temaşevanê xwe tevdide. Û însaniyeta wî tînit bîra wî.

Hema di destpêkê de ji nijka ve qehramanên me Bab ‘Ezîz û torina xwe îşxar ji bin axê di bişkivin. Ev sehne tînit bîr ku eslê însan ji axê ye. Piştî rabûna ji bin axê rêwîtiya dûvdirêj dest pê dike. Çolekî bê ser û ber. Ev col di şibhe dinyayê. Çawa ku di çolê de rêç û şopa însan ‘eyan e. Herwiha tu îş û karê însan li dinê wî nabe. Lê bawerî lazîm e. Bê îman û rêzan, însan dê di vê çolê de wîna bibe.

**Rê û rêçên nêzîkbûna bi bal Xwedê Teala ve, bi qasî jimara mexluqata ye.** Ev sehne û ev peyv dide nîşandin ku bidest xistina rîza a Îlahî bi yek awakî nînê. Herkes li gorî îxlas û îtîqada xwe di demeke kurt an dirêj de dikare bigîje rîza a Îlahî. Bi te’bîrekî tesewûfî eger em vê beyan kin: Dirêjahî û kurtiya rîya seyr û silûkê ji bo her salikî yek nîne. Hin ji bo tolhildanê dadikevin çolê, hin ji



bo evînek wek xezalê. Lê mirov nizane hevgihîştina meqsedê dê çi wext û bi çi wesilê pêk bê. Car heye kî dibit sebebê hîdayetê. Car heye evîn.

**Îdî dem, dema seyr û sulûkê ye.** Di rîya dûvdirêj de Torina Bab ‘Ezîz’ dixwaze ku Bab ‘Ezîz’ çîrokek jê re bi nûhurîne. Lewra jîyan bi xwe çîrokek rêwîtiyê ye.

Çîroka Bab ‘Ezîz ji windabûna presekî dest pê dike. Di çîrokê de prens li ser piştê hespê, li pêy xezalekî derdikevit çolê. Xezal prensê xwe li pey xwe dibe ser avê û ji ber çav wîna dibe. Îdî prensê me li ser bîrê, dadikevit bîra tefekkure. Ev sehne di tesewufê de **meqamê heyretê** tînit bîr. Lewra qehremanê çîrokê, li ser bîrê dikeve heyretê û ji heqîqeta ruhê xwe hayîdar dibe û hildikêşê bi bal meqamê heyret û evîna heqîqî ve. Û di avê de heqîqeta ruhê xwe temaşe dike. Xezala me di şibhe evînê. Ku evîndarê xwe, di çola dinê de, li pey xwe digerîne. Hinka noqî bin axê dike, hinka jî meqamê ‘eşqa mecazî derdixê bi bal meqamê eşqa heqîqî û heyretê ve digerîne. Di encamê de ‘aşîq û meşûq tenê dimînin. Çawa ku di encama çîroka prens de ji bil xezal û derwêş herkes prens di terikîne.

**Çol û rêwîtiya derwêşa:** Derwêşê me di çola dinê de ji bo hevgihîştinê derketiye rê. Di sehnekî filmê me de ji sî sala carkî derwêş cem’ dibin. Û zikir dikin. Ev sehne cem’a çîla ‘Elewî û Bektaşîyan tînit bîr. Ku li gorî bawerîya wan, di mî’racê de pêk hatiye. Ji bo xatirê vê cemê

1 Nûrsî Saîd. İçtîma’î Reçeteler weşanxaneyê Tenwîr



derwêşên 'Elewî û Bektaşî jî di demên mu'eyyen de cem' dibin. Û zikir dikin.

**Dergevaniya ber derê mehbûb. An jî di riya seyr û silûkê de pelixandina nefse:** Di tesewûfê de kuştin û pelixandina nefse xalekî pir muhîm e. Di sehnekî filmê me de ev peyva derwêşekî vê tînit bîr:

-Ger tu bi ruhê xwe paqij kî ber derê maşûq wê demê tu dê bibî aşiq. Di tesewûfê de heta salik nefsa xwe li ber dergahê pîr nekuje û nefspiçûktîya xwe îspat neke, nagî-jit meqamê'eşqê.

Bi rastî dema min di film de ev peyv ji devê devrwê-şekî wek dergevanê mizgeftê bihîst, Mawlana Xalidê Şeh-rezorî hat bîra min. Dema ku Mawlana Xalid ji bo intisaba murşidekî kamil çu Hindistanê. Şêxê wî ew kir dergevanê dergahê xwe û wezîfa paqijkirin û şûştina tiwaletê da wî. Ev wezîfa wî bi qasî salekî domîya. Rojkî ji roja ev wezîfe li zora nefsa wî çû Mawlana Xalid ji nefsa xwe re wiha got:

-Ey Xalid! Nefsa xwe mezin nehesibîne. Naxwe ezê van tiwaleta bi vî ruyê te bidim şûştin. Piştî ku Mawlana Xalid nefsa xwe hewqas kuşt, hê murşidê wî wezîfa îrsadê dayê. An jî bi te'bîra tesewûfî'aşiq hê gîha me'şûqê xwe.

**Reqs û sema an jî Mewlewîti û Bektaşîti:** Di vî filmî de reqs û sema Mewlewîtiya Mawlana Celaleddînê Romî û Terîqa Bektaşîtiyê tînit bîr. Lewra derwêş di vî filmî de, di hinek sehneyan de wek mewlewîyan bi wecd û reqs û sema li dora xwe vedigerin. Ew jî wek Mawlana destekî ber bi Xaliq ve yê dî ber bi mexlûq ve vedigerînin. Ku ev motif di terîqa Mewlewî û Bektaşîyan de tê wê wateyê ku derwêş rehmetê ji Xaliq digre li mexlûq belav dike.

**Lixwekirina post an jî murşidê Kamil:** Me di serî de got ku şehzadeyê me, li ser birê di bîra evînê de, di sey-ra rûkê me'şûqa xwe di tefekûrê de ma. Bîr, av û tefekûr. Dîtina halê rûhîyê heqîqî. Vexwarina meya evînê. Gihana evîna heqîqî. Çûn û hatina xezalê. En nihayet dema şeh-zadeyê me dighê meqamê eşqê. Derwêşek tê kurkê xwe jî xwe derdixe ji şehzade re dihêle û ji holê winda dibe.

Ev tê wê wateyê ku îdî şehzade di riya seyr û silûkê de gîhaye merteba kemalê. Koşk û seraya dinê, zewq û sefa a serayê bi terka dinê re vediguherin. Lewra îdî di 'alema mecazê de şehzade derwêş e. Derwêşîya heqîqî meqamê seltene manewî ye. Seray kurk e, zewq û sefa jî zikr û îbadet in.

**Teqdîra qederê an jî teslîmiyet:** Li gorî bawerî ya tesewûfê qedera însan ne di dest wî de ye. Lewra ê ku

qederê teqdîr dike Ellah e. Tîştê ku di vî filmî de bala min kişand ew bû ku rêwîyek ji bo qetla birayê xwe ketibû pêy şopa derwêşekî. Lê derwêş birakî kuşt yê dî bi avê ihya kir. Me jî vê jî fêm kir ku di vir de ev hinarîya tesewufî wek şîfre veşartî ye. Însan li ber qederê wek mirîyê li ser tenaşoyê ye.

**Nî'metê Xwedê yên li ser însan texlit bi texlîd in:** Hin bi deng hin bi reng, hin bi nefes û her tîştê dî. Dibê ev nî'met neêne îsrafkirin. Her wekî Bab 'Ezîz ji torina xwe re dibêje:

-Nefesa xwe badilhewa xerc neke. Dê di riya dûr û dirêj de bi kêrî te bê. Ji yekî dengxweş re jî dibêje:

-Ev deng dê te bighînit qonaxa mexsedê. Yani li gorî tesewufê qabiliyeta kê çî be dikare bi wê bighîje mexseda xwe. Ku ev bawerî jî di vî filmî de bi van sehneyan xweş hatiye temsîlkin..

**Dawîya seyrû silûkê vebûna qelb û dîtina manewî ye:** Çawa ku Bab 'Ezîz di dawîya Filmê de ji Torina xwe re dibêje:

-Ez îdî hatim dawîya rê. Lê tu bi şopîne. Lewra îdî teka-mula îştare jî li ber kemalê ye.

**Sirrê Bezmî elest an jî deqa li ser herdû leva:** Li gorî bawerîya tesewûfê dema Ellah Te'ala ruhê însan xuliqand, di'alema ruhanî de her tişt û nav pê da zanîn. Û xwe pê da naskirin. Însan heta wexta ku ji diya xwe di welide jî jî vê heqîqetê hayîdar e. Lê bi welidandinê re melaiket her tiştî bi wî didin jibîrkirin. Bes ji bo nişan û bîranîn û fêrbûnê deqeq li ser herdû lêva datînin. Bab 'Ezîz vê sirrê wek mî-nak bi torina xwe dide zanîn.

**Hevgihîştin û şahîya heqîqî an jî şebî arûz:** Dawîya seyr û silukê û kemalata herî mezin mirina li ser îmanê ye. Lewra li gorî tesewufê mirin ne helak e, belkî destpêka jiyana ebedî û hevgihîştina 'aişq û me'şûq e. Ji lew qehre-manê filmê Bab 'Ezîz roja mirina xwe wek dawet dihesibî-ne. Û dibêje: "Çawa ku dinya ji rehma dê firehtir û rihettir bû, her wiha axret jî ji dinyayê xweşiktir û rahettir e. Hem temamî evînên mecazî li axretê di sûretê heqîqî de dibin sebebe se'adeta ebedî. Bes ku ew evin bi gunehên din-yewî nelewitî be. Ev sehne jî yeko yek di şîbhe felsefa şebî aruza Mawlana Celaleddînê Romî

En nihayet em dikarin bêjin ku filmê Bab 'Ezîz, di warê danasîna tesewûfê de filmeke balkêş e. Film ji serî heta binî ji motifên tesewufî hatiye dagirtin Û di hengama te-maşekirinê de temaşevanê xwe jî nawestîne.





## عَبْدُ اللَّهِ جَوْهَرٌ

قُرْآنَ شِيفَايَ قَلْبَانُو  
دَرْدَانِي مَارِي دَرْمَانُو  
طَبِيبِي مَا نِيَوْشَانُو  
هَم مَلْهَمِي بَرِينَانُو  
حُكْمِي قُرْآنِي قُرْقَانُو  
حَقَّهُ بَاطِلِرَا فِصْنَه نُو  
أَهْلِي كُفْرِي عِيَان كُنُو  
مُؤْمِنَان مُفْرَح كُنُو

قُرْآن مَارِي هِدَايْتُو  
جَعْدِي اللَّهُ مُوجِنْتُو  
رَهْبَرِي مُتَقِيَانُو  
فِي مَا هَمِينَه بَرُهَانُو  
قُرْآن حُكْمِي الْإِهْيُو  
عَدَالْتُو خُزُور دُنُو  
هَر كَسِي مُحَيَّر كُنُو  
كَام تَابِعُو فَلَنتُنُو

قُرْآن دَاعِيَم خَيْرِن فَانُو  
خِرَابِيرَا مَا دُور دَانُو  
بَاشُو هَوْلِي مَا وَازِنُو  
جَهَنَّمِرَا مَا دُور دَانُو  
قُرْآن حَقَّهُ بِيَان كُنُو  
أَهْلِي كُفْرِي رُسُوَاي كُنُو  
ضَلَالْتِرَا مَا دُور كُنُو  
مَا دَعْوَتِي جَنَّة كُنُو

قُرْآن ذِكْرُو تَفَكُّرُو  
مَارِي وَعْظُو نَصِيحْتُو  
هَرْدَاعِيَم مَا شِيرْت كُنُو  
مَا دَعْوَتِي ثُوبَه كُنُو  
قُرْآن كَلَامِي دُوجَلَالِي  
حَيَات دَانُو مَا زِي آوِي  
سَمَد دُنْيَاو آخِرْتِي  
رُوشَنَايِيَه چِمَان مِي

قُرْآن فِي مُؤْمِنَان نُورُو  
طَارْتِيَدَه نِيَقْرَدُنُو  
ظَالِمَان عَشْكِرَا كُنُو  
فِي مَارُوشَنُوشَعْلَه دَانُو  
عَبْدُ اللَّهِ بَعَشَق فَنَدُنُو  
هَر كَسِي زَاف شِيرْت كُنُو  
فَاتَشُ اللَّهُ مَارَا فَانُو  
قُرْآن مَارِي شَرِيَعْتُو



# XELASÎYA ÎNSANÎYETÊ BI ÎSLAMÊ YE

✍ Mamoste HEZEXÎ



Erda ummetê îro bi girîn û qîrîn e, talan û penaber e, li ser kuştin û zilm û zorî ye. Ummet perîşan e, mirovahî bûye wek çûkeki pirtikandî û hatibe çengokirin. Neteweyên dinyayê îro li Sûriyê xwîna pîrek û zarokan dirjînin. Li Tirkîyeyê, li 'Iraqê komkujiyan dikin. Li Myanmarê zilma ku 'evd û însanan nebihîstîye pêk tînin. Ev zordestî, tev jibona hizûr û rehetî nekeve nava ummetê, jibona çek û sîlehên gerba xwînrêj bèn firotin û jibona dewlemendiya misilmanan têkeve destê wan tê leyistandin.

Baş tê zanîn ku sîstemên kufrê yê bi navên wek emperyalîzm, komonîzm, sosyalîzm, laîktî, hwd ev zêdeyî sed salîye ji xeynî talankirinê, dagirkirinê û rijandina xwîna mezlûman, tu tişt nedane mirovahiyê. Sloganên van îdeolojîyên qirêj: **“mafên insanan, demokrasî, mafên ajalan, xweşbîni, musamaha navbêna olan ...”** Lê di kirinên wan de beravejî vê yekê heye. Mademkî van sîstemên kufrê ti xweşî û hizûr neaniye, çima em bi şopandina wan, dîn û dinya xwe dikine dojeh?

Gelo di dîroka îslamê de, di

hemî herbên ku Resûlê Xweda û sehabiyên wî beşdar bûne de, ji misilman û kafiran tev çend kes hatine kuştin? Ji xwe yê ji herbê bêrî mînakek jî nîne. **“Di herbên ku Resûlê Xweda û sehabiyên Wî di 23 salan de kirine de, ji misilmana 150 û ji muşrikan 250 mirov hatine kuştin”** (Mûhammed Hamidûllah, *Herbên Hezretî Pêxember*)

Heke ku mebesta Resûlê xweda û sehabiyên Wî, kuştin bûya, wê bi hezaran însan hatibana kuştin. Lê mebest islahkirin û xelaskirina ji tarîtiyê bû. Delîla wê jî eve: Wexta Resûlê Xweda diçû herbê digot **“bila zarok, pîrek, yextiyar, ehlê ilmê zararê nebînin”** û wexta di herba Bedrê de jî muşrikên hêsîr hatibûn girtin her yek, di ber perwerdekirina deh zarokên Medîneyîyan de hatine azadkirin. Yê hatine kuştina Resûlê Xweda jî pêxember ew 'efû kirine. Ev jî dide diyarkirin ku mebest xilasiya însana ya ji tarîtiyê bi bal ronahiyê ve ye.

Pêwîste ku em li vê wêneya dîrokî meyzînin û bi van qetlîamên ku çêliyên Ebû Cehîl, Ebû Lehebên vê dewra xwe bidin ber hev û biryara xwe bidin ku xelasî bi Îslamê ye, bi şopandina rêçika Pêxemberê rehetê ye. Em destê xwe bi bal 'ezameta Xweda ve vedikin, dikin qêrîn ku yekîti û biratiya misilmana bê avakirin û ev xwîna li erda îslamê tê rijandin ku tenê xwîna misilmana ye, bi dawî bibe.





# WERIN JI ME RE BÊJIN

📖 EZÎZ MEZRAQENTERÎ

Sebebê xizaniyê,  
Dermanê nezaniyê,  
Vê êşa cahiliyê,  
Werin ji me re bêjin

Em kî ne û ne kî ne?  
Em xwedî jî bo çi ne?  
Armanç ji me ra çi ne?  
Werin ji me re bêjin

Emrê rebbê me çiyê?  
Nebyê wî çi gotiyê?  
Qur'anê çi xwestiyê?  
Werin ji me re bêjin

Gelî jîr û pispora  
Xwendekar û diqtora  
Ji kanya 'ilmê behra  
Werin ji me re bêjin

Ji mekteb û dibistan  
Ji qelema mamostan  
Av bidin bağ û bostan  
Werin ji me re bêjin

Ey şêx û melê hêja  
Hûn neseknin tu roja  
Li hêvya we ne hêja  
Werin ji me re bêjin

'Ilmê sunet û Qur'an  
Dîsa bidin feqîyan  
Li ser erda gulîstan  
Werin ji me re bêjin

Ey 'alimê 'ilimdar  
Rabin dîsa wek her car  
Ji me re bibin pîbar  
Werin ji me re bêjin

Bêjin bi şev û rojê  
Deynin ber me projê  
Da em nemeşin dojê  
Werin ji me re bêjin

Ev 'ilmê biha giran  
Nayê kirin bi zêran  
Ji 'ilmê behra Qur'an  
Werin ji me re bêjin

Çiyê bingeha îman?  
Çiyê ma'neya jîyan?  
Weke Bediuzzeman  
Werin ji me re bêjin

'Umir da doza Qur'an  
Heta jê re bû qurban  
Weke Huseynê rêzan  
Werin ji me re bêjin

Her bibêjin qencîw baş  
Xera bikin rêyên şaş  
Beheşt qet nayê belaş  
Werin ji me re bêjin

Bê sekn û bê betlane  
Roj û meh û salane  
Bêjin ji dil û cane  
Werin ji me re bêjin

Deng bidin sitûxwara  
Hêvya feqîr û jara  
Di sibeh û êvara  
Werin ji me re bêjin

Bo destê biratiyê  
Rake vê firqetiyê  
Şerrê xwe bi xwetiye  
Werin ji me re bêjin

Êşa ji qewmîyetê  
Cehalet û 'illetê  
Rakin ji nav ummetê  
Werin ji me re bêjin

Biratiya Qur'anê  
Hezkirna ji îmanê  
Rêya silh û emanê  
Werin ji me re bêjin

Kesî negot bi sala  
Nabe bi 'eqlê vala  
Em bûn wek dil û lala  
Werin ji me re bêjin

Rahêjin qelema xwe  
Girêdin şaşika xwe  
Li xwe bikin cubê xwe  
Werin ji me re bêjin

Dîsa av bidin bağan  
Da bidin reh û şağan  
Bîn bidin hemî taxan  
Werin ji me re bêjin

Ummet li hêvya we ye  
Çavê wê l-riya we ye  
Rabin dewrana we ye  
Werin ji me re bêjin

Bi sala fikrên gemmar  
Em kirine tar û mar  
Mihacir bê cih û war  
Werin ji me re bêjin

Evan felsefê batil  
Ji me bir hiş û aqil  
Ji me dizîn gula dil  
Werin ji me re bêjin

Van îzmê beradayî  
Bêdîn û bêxwedayî  
Ji namûsê bêpayî  
Werin ji me re bêjin

Zarokê me jehr dadan  
Dûr hiştine ji kalan  
Lew bindestin bi salan  
Werin ji me re bêjin

Çiyê îman çiyê dîn?  
Çiyê 'eşq çiyê evîn?  
Doza Muhammed Emîn  
Werin ji me re bêjin

Ba xelkê mîsliman kin  
Wan ji xewê şiyar kin  
Wek berê bi bira kin  
Werin ji me re bêjin

Bêjin bêjin wek mêra  
Bêjin bêjin wek şêra  
Gazi bidin her dera  
Werin ji me re bêjin

Zulma kufra gemmarî  
Ji me re eyb û 'arî  
Rakin vê şeva tarî  
Werin ji me re bêjin

Mîsliman bûn çend firqe  
Heryek bû qewm û 'irqe  
Bê al û bê beyreqe  
Werin ji me re bêjin

Ev çi derd e çi hal e?  
Çi girîn nalenale?  
Neqediya çend sale  
Werin ji me re bêjin

Banga 'Ezîz ji dil e  
Dilê wî b-hezar kul e  
Jibo Qur'an bilbil e  
Werin ji me re bêjin



# Ey Fexrê Cîhan

✍ Şêx Tahirê ŞOŞÎ

Ey fexrê cîhan û weledê Adem  
Ey tacê serê cemî'ê 'alem

Ey nûrê hîdayeta Xweda yî  
Menzûrê 'înayeta Xweda yî

Navê te Xwedê bilind anî  
Xulqê te gelek mezin wî zanî

Ey serwerê cumle murselînan  
Wey pêşerûwê me muminînan

Mînzarê tereqiyî û 'îbadet  
Serdarê hemû xudan se'adet

Ey her tu şeffî'ê rojê mehşer  
Her tu vedikey derî ji mehder

Sahib'elem û meqamê mehmûd  
Bes da te Xwedayî hewdê mewrûd

Ey saqiyê avê hewdê kewser  
Hêvî me nekey ji bîr di mehşer

Sahib keremî meqamê (lewlak)  
Durra sedefa sicûdê emlak

Ey sorgulê bağê feyd û unsê  
Wey bilbilê murxuzarê Qudsê

Mîftahê xezîneya kemalî  
Dellalê terîqeya cemalî

Pêxemberê axirê zemanî  
Tu murşidê cumle ê cîhanî

Lê nesebê mezin sîfatî  
Dunya veji lew dema tu hatî

Ey nûr û çirayekê munîrî  
Mizgîn derê lem û nezîrî

Quran ji te ra Xwedê hinarî  
Bo ummeteka ku wî bijarî

Sed şukir tu yî me yar û yawer  
Pêxemberî tu me tu yî rehber

Anîn te ji tariyê bo nûrê  
Dilxweş te kirîn bi vê sirûrê

Ewwel me tu yî delil û rehber  
Axir me tu yî şeffî'ê mehşer

(Tahir) te yek e ji cumle yaran  
Qurbanê te ye herro du caran

Ey fexrê cîhan û weledê Adem  
Ey tacê serê cemî'ê 'alem



# NALÎ Û HELBESTEKA WÎ

Hêmin OMAR

Navê wî **Mela Xidir kurê Ehmedê Şawêsi Begî Mikayîlî** ye. Ji 'eşîreta **Caf** e. Di sala 1897an de li gundê Xak û Xol girêdayî devera Şarezûr ji dayik bûye. Li bajêrên Silêmanî û Sine û Koye û Helebce û Mihabad xwendî ye. Piştî wê li ber destê Mewlana Xalîdî Neqîşbendî îcaza melayetiyê wergirtiye. Mela Xidir (Nalî) di helbestan de texellusa/nasnava Nalî bo xo danaye û zanayekî mezin û meşhûr bûye û helbest bi zimanên 'Erebî û Kurdî û Farsî nivîsandîye. Di sala 1848an de diçe Şamê û piştî wê diçe hecê û piştî wê jî dizivire Sitenbol û di sala 1877an le stenbolê wefat dîke û her li wir dête defin kirin.

Nalî ji bo yekemîn car helbesta Soranî bi kêşa 'erûzî nivîsandîye û yek ji mezintirîn helbestvanên Kurd têtê hesabandin ku bi diyalêkta Soranî hatiye nivîsandin

Nalî Le Hîcazê li ba 'Ebidulla bin 'On emîrê Mekkeyê dibe mêvan û gelek hurmet ji wî re hatiye girtin û di pirtûka ('Usmanlî Muelliflerî) de behsa Nalî hatiye kirin û weke 'alimekî navdar hatiye nasandin.

Dîwana Nalî ji layê Mela 'Ebdulkerîmî Muderîs di salên heftê sedsala borî de hatiye şîrovekirin û ta niha zêdetir ji 10 tîzên Master û Diktorayê li ser helbestên Nalî hatîne nivîsandin.

Ev helbesta Nalî, li nêz merqeda Pêxemberî nivîsiye û şekwa û derdê dilê xwe bo wî beyan dîke:



## *Ey Sakîni Riyazî*

Ey sakîn<sup>1</sup> riyaz<sup>2</sup>î medîney munewwer e  
Lutfê bike, biferimû<sup>3</sup>: medîney minew, were

Erşî berîn ke dayire ye, rewze merkez e  
Ferşî zemîn be 'erseyî<sup>4</sup> teybe mucewher<sup>5</sup> e

Teybe<sup>6</sup> ke ye'nî 'eksî beqî'î hemû ›ebîr  
Teybe ke ye'nî mayeyî<sup>7</sup> ew mişkî ezfer<sup>8</sup> e

Teybe ke ye'nî roj û şewî Tib<sup>9</sup>î ‹alem e  
Rojî ke wişke, şew terr e, kafûr<sup>10</sup> û 'enber e

1 Sakîn: Akincî

2 Riyaz: Pirjimara baxçan

3 Biferimû: Kerem ke

4 'Erse: Parçek Erd

5 Mucewher: Bi Gewhar hatiye ciwan kirin

6 Teybe: Bajêrê Medîne

7 Maye: Madde

8 Mişkî Ezfer: Mîsk a bîn xwaş

9 Tib: Bê n xwaş

10 Kafûr: Dermaneka bîn xwaş û reng sipîye



Lêwm, le rojî roşînî kafûrî wişkî, wişk  
Çawim<sup>11</sup>, le şebnimî şewî wek'enberî terr e

Teybe ke ye'nî Teyîb û Tahîr<sup>12</sup> be rewh<sup>13</sup>î roh<sup>14</sup>  
Ferqî ellên: gill<sup>15</sup>î le gull, awî le kewser<sup>16</sup> e

Ye'nî gullawî quds e gillawî ref' eka  
Ew xak e çake pak e û ew Aw e methere

**Nali** kewa seg<sup>17</sup>î segî ew merz û bûm<sup>18</sup>eye  
Emma segî mu'ellem<sup>19</sup>î bê deng û bê werr e

Ferşî pellas e, doşekî xak e, serînî berd  
Bê tûk<sup>20</sup>û, rût û qût û, feqîr û qelender e

Bê tûkî cîfexwarî<sup>21</sup> û gurgîn û bê wicûd  
Lem aw û xake zahîr û batîn mûkedder<sup>22</sup> e

Gerden keçî qelade<sup>23</sup>yî rist<sup>24</sup>î wefat e, dê  
Bo rawî bînî ew der û deşt e mu'etter<sup>25</sup> e

Da kûçe kûçe<sup>26</sup> xollî beserde bika be çing  
Lew xake efexer<sup>27</sup> e ke hemû tac û efser e

*Kehfulenam*<sup>28</sup>î hîcretî eshabî bê ruqûd!<sup>29</sup>  
Bike be xakî xadîmî Qîtmîr<sup>30</sup>î ew der e

Belkû le ferrî Teybe ke Tîbî Peyember<sup>31</sup> e  
Sakin bibê gerrollî ew kelb e bê ferr e

Peyxamber û hebîbî xuda, *xatemulrusul*<sup>32</sup>  
Rewzey le erz û saye<sup>33</sup> le ser çerxî exzer<sup>34</sup> e

Qet sêberî debê le ser em Erze fanî ye  
Ew taqe nexl<sup>35</sup>î çerşe ke tûba<sup>36</sup>yî sêber e!<sup>37</sup>

Ew sêber e ke qubbeyî firdews<sup>37</sup>î baqî ye  
Ew sêber e ke xêwetî sehrayî mehşer e

Ew sêbere ke 'alemî 'ulwîy<sup>38</sup>î le nûriye  
Şems û nucûm<sup>39</sup> û herçî lewanda muqerrer e

Ew sêbere ke mezherî hubbî xudayî ye  
Kenzi mutelsemî nezerî heyî Ekber<sup>40</sup> e

Cê bazî meqdem<sup>41</sup>î şewî Qedr û me'arîcî  
Serbanî 'erş û kursî û Cubrîlî şehper e

Dinyay çilon dewê ke be qed hîmmetî nekird  
Em xel'et<sup>42</sup> e ke Etlles<sup>43</sup>î no çerx<sup>44</sup>î eîster e

Teşbîhî husnî fayqî, axir, be çî bikem!  
Nûrî sunûhî tel'et<sup>45</sup>î sed lewhî enwer<sup>46</sup> e

Me'lûm e çunkî cem'î rusul muqtebîs lewin  
Yûsif yekê lewane ke serlewhî defter e

Guftarî noşî şahîdî sed şehd<sup>47</sup>î fayqe  
Ruxsarî xoşî ezher û mîn şemsî enwer e

Ew şahî mah<sup>48</sup>î mîsre, ehalî le rêy sucûd<sup>49</sup>  
Quran dellê ke bende emew bende perwer e

11 Çawim: Çavê min

12 Teyîb û Tahîr: Paqij

13 Rewh: Nefes

14 Roh: Rohulemîn, angò Cubrayil.

15 Gill: Ax

16 Kewser: Hewzekî Avê ye li Cennetê

17 Seg: kûçik

18 Merz û Bûm: Welat

19 Mu'ellem: Hîn Kiray

20 Bê tûk: Kînaye ye ji Feqîriyê

21 Cîfexwarî: Ew kasê ku goştê miry bixwe

22 Mûkedder: Aciz û xembar

23 Qelade: Gerdîn bend

24 Rîst: gurûs û petkî gerden bend

25 Mu'etter: Bêhnxweş

26 Kûçe: Kolan, Tax

27 Efexer: Tîjî ji şanazî û Fexir

28 *Kehfulenam*: Şikeftê xelkî

29 Ruqûd: Xev, Razan, xwedîrêj kirin

30 Qîtmîr: Navê segê Eshabulkehf

31 Peyamber: Pêxember

32 *Xatemulrusul*: Pexemberê Dawî

33 Saye: Siber, sî

34 Çerxî Exzer: Asmana Kesik

35 Nexl: Darê Xurma

36 Tûba: Navê Darekiye ji Beheştê

37 Firdews: Cennet, Behîşt

38 'Alemî 'Ulwîy: Meh û Roj û Stêr

39 Nucûm: Pirjimara Stêran

40 Heyî Ekber: Mebest Xûda ye

41 Meqdem: Hatîn

42 Xel'et: Xelat

43 Etlles: Coreyekê Qumaşê ye

44 No Çerx: Neh Çerx, Heft Asman û meh û roj

45 Tel'et: Rû

46 Enwer: Zede Ronak

47 Şehd: Hunguvîn

48 Mah: Bajêr, Şar

49 Sucûd: Ew kesên secde dikin



Ew dê deba be keşmekeş, em dê deba be lutif  
Ew şahî dilber e, ne şehenşahî dilder e

Efradî murselîn hemû yek raz<sup>50</sup>e, am kalam  
Lem cêgeda bizane muqeddem muexxer e

Şubhey nîye ke Şems û Qemer sêberî ewin  
Nîsbet be herdû wechî wekû nûr û sêber e

Burhan<sup>51</sup> e sûretî beşerî çunke nûre, nûr  
Bê zîll<sup>52</sup> e, masîway be dû nîsbet mu'ebiber e

Waqîf<sup>53</sup> be herçî ketm<sup>54</sup>î xebaya<sup>55</sup>yî mazîye  
Alîm be herçî dêt û debêt û muqeddider e

Ew ruwî le ke'be, ke'be be ruwî ew muşerref e  
Ye'nî cebînî qîble û mîhrab û minber e

Ba bêyne ser wecahetî qedrî lekin xuda  
Bo 'asiyan<sup>56</sup> le mexfîret û serfî mexfîr e

Rehmet be husnî sûret<sup>57</sup>î însan zuhûrî kird  
Xeyrulbeşer<sup>58</sup>leqeb be Şefa'et mubeşşer e

Mujde le 'asiyan ke ew îqbalî rehmet e  
Îsmî Rehîm û xews<sup>59</sup> û Şefî' û Muxeyyer e

Ey şemsî maye perwer û îksîrî qelb<sup>60</sup>î xak!  
Binwarre hallî halîkî em xake ehqer<sup>61</sup> e

Hîfzî şeban û, ême reme û, ew le'îne gurg  
Em nefse gurge mêşe legel ew bed exter<sup>62</sup> e

Dayim le cenb û xwar û kemînda be roj û şew  
Bo firsete le rêgeyî îmanî em merr e

50 Raz: Qise, axaftin  
51 Burhan: Delil, belge  
52 Zîll: Sî, sêber  
53 Waqîf: Agehdar  
54 Ketm: Veşartin  
55 Xebaya: Hatye veşartin  
56 'Asiyan: Gunehbaran  
57 Husnî suret: Xoşikiya şiklê  
58 Xeyrulbeşer: Pêxember  
59 Xews: Firyadres  
60 Qelb: Guherîn  
61 Ehqer: Gelek sivk û bê mifa  
62 Bed exter: Bexit nebaş

Ême beqîfî xîretî toman hezîreye  
Em nefis e Gurge mêş<sup>63</sup>e şeyatînî'esker e

Xoy kirduwe be gewre û qerralî mulkî ten  
Pişt û wezîrî ew sege Deccalî e'wer e

Qurban! dexîlî helqeyî şubbak<sup>64</sup>î rewzetim  
Sê îltîca<sup>65</sup>m heye, ke legel ew duwem şerr e

Ewwel le îltîcam ewete ey xeyûr<sup>66</sup>î dîn  
hazir bibî le keşmekeş û şorî xerxere<sup>67</sup>

Goçanî xîretit le milmda mu'ewze bê  
Ta mujde dê ke nûrî yeqîn<sup>68</sup>im muzeffer<sup>69</sup> e

Fayiz<sup>70</sup> debê be nûrî necatî hebîbî heq  
Lew cêge da be kwêrî ew xesm<sup>71</sup>e ebter e

Rû zerd û wişk û xayib<sup>72</sup> û xasîr bibê'edû  
Wasîl bibm be rehmetî baranî, meqber e

Dûmîne<sup>73</sup> îltîcam emete ew demey debê  
Elwahî elhedim be zenabîlî me'ter<sup>74</sup> e,

Tenge ewa debê ke le ew cêge tengeda  
Sayil Nekîr<sup>75</sup> û 'arîf û me'rûf û Munker<sup>76</sup> e,

Îmdadî fethî babî zuban<sup>77</sup>im be fezlî to  
Zû bê, ke ewwelîn guzerî pird û me'ber<sup>78</sup> e

Sêmîne îltîcam dellêm<sup>79</sup> ey xewsî'asiyan  
Hawarî bigre berdeyî aşûbî mehşer e

63 Gurge mêş: Ev Segê ku digel Gurgê dizî ji şivanê bike  
64 Şubbak: Paj, Pencere  
65 Îltîca: Hawar, Rica, Tika  
66 Xeyûr: Cesûr  
67 Xerxere: Wexta Ruhkişandinê  
68 Yeqîn: Bawerî, îman  
69 Muzeffer: Serkeftî  
70 Fayiz: Xewdan feyz û bereket  
71 Xesm: Duşmîn  
72 Xayib: Bê Hêvî  
73 Dûmîne: Duwemîn  
74 Me'ter: Dukanê etirfiroş  
75 Nekîr: Ew melayiketê ku ji kesê mirî ra pîris dika  
76 Munker: Hevalê Melayiketê Nekîrî  
77 Babî zuban: Deriyê ziman  
78 Me'ber: Cihê derbasbûnê  
79 Dellêm: Dibêjim



Ew rojî axîre<sup>80</sup>y ke çi rojî le dû niye  
Rû tirş û qemterîr<sup>81</sup> û 'ebûs û xezenfer<sup>82</sup> e

Em ferşe xakîye detekênin le toz û gerd  
Em'erşe no sehîfe ye deyken be yek perr e

Dengî fuxan û coş û xuroşî cemî'î xeliq  
Gwê lêre deybiyê<sup>83</sup>, ke lewê gwê hemû kerr e

Rojî qiyametî feyza *hum qiyam*<sup>84</sup>û, şexis  
Qayim çeçîwe, kêle, leser xakî mehfer<sup>85</sup> e

Aya qed û qiyafeyî xoy bû be kêlî xoy,  
Ya saqî 'ebher<sup>86</sup> e ke dû çawî leser ser e!

Dinya buwe be tawe û, sehra be jîlemo  
Dinya dellên ke agire, narî semender<sup>87</sup> e

Dîwanî germî barî xuda ye, be paye 'am  
îsxayî xelq e, sa'etêkî 'erzî mehzer<sup>88</sup> e

Layek «zebaniye<sup>89</sup>» le serukar<sup>90</sup>î nare, nar  
*Hel mîn mezîd*<sup>91</sup> zubaniye wek marî ejdere

Layêkî keş le ceninet û rîzwan<sup>92</sup> tedarek<sup>93</sup>e  
Horî ewa be muntezîrî dêne menzere

Eşxasî xasse<sup>94</sup> teşxes û *ebsaruhum*<sup>95</sup> hemû  
*Wa nefsi* yane her yeke bo xoy muheyzer<sup>96</sup> e

Zêr<sup>97</sup> û zeber<sup>98</sup> debin be dû firçe, le firçeteyin  
Waweyl û îmtiyaz<sup>99</sup>e ke kê bêne kê bere

Ekser kesîne, tabî'î berd û heraret<sup>100</sup> e  
Ye'nî weqûdî nar<sup>101</sup> e, buxarî museyiyer e

Baqî ke ruwî le keffeyî mîzane, yekser e  
Herçend sere mutabî'î mî'yarî dû sere

Lew kêşe kêşeda ye kewa reş sipî debê  
Lew kêşe kêşedaye kewa Ehmer<sup>102</sup> Esfer<sup>103</sup>e

E'malman legell hemû ewza'î halliman  
Mexşûş<sup>104</sup> û cem'î, hazire, ger xeyr, eger şerre

Mexzûnî ruq'e<sup>105</sup>, hebibe be hebibe, le keffe da  
Xalîs diyare, mis ke mise, 'eyinî zerr zerre

Zerrêk le çawî boteyî serrafî keffeda  
Mexfî niye, diyare, wekû rojî nîmerre<sup>106</sup>

Giryan hemû reşaw<sup>107</sup>e leber ahî dûd<sup>108</sup> reng  
Mujgan buwe be xame û, dîde be mehber<sup>109</sup>e

Mîzimar<sup>110</sup>î şehsewarî toye ke sef sef e  
Kogayî hasîlatte beyda<sup>111</sup>yî beyder e

Rojî ceza rica bike bo **Nalîyî** derbeder  
Çun lem cîhan gunahî gelê zor û ekser e

80 Axîre: Roja qiyametê

81 Qemterîr: Dijwar û teng

82 Xezenfer: Weke şêrê bi heybet

83 Deybiyê: Dibihîze

84 *Hum qiyam*: Ewan li ser lîngan diwestîn, ayeteke Quranê ye

85 Mehfer: Çal, gorîstan

86 'Ebher: Zilamekî dirêj, nêrgîs

87 Semender: Heywaneke efsaneyî

88 Mehzer: Xizmet, huzur

89 Zebaniye: Ew melayiketên berpîrsiarê agirê cehennemê ne

90 Serukar: Serperîşt

91 *Hel mîn mezîd*: Gelo yê zêdetir hene?, ayeteke quranê ye

92 Rîzwan: Dergevanê cennetê

93 Tedarek: Hazîr, amade

94 Eşxasî xasse: Kesên taybet

95 *Teşxes û ebsaruhum*: Çavê wan noq u dibe

96 Muheyzer: Eceb mayîn

97 Zêr: Jêr

98 Zeber: Ser

99 Îmtiyaz: Cudayî

100 Heraret: Germayî

101 Nar: Agir

102 Ehmer: Sor

103 Esfer: Zer

104 Mexşûş: Tevlî heviya tiştên baş û xirap

105 Ruq'e: Kaxed

106 Nîmerre: Nîvro

107 Reşaw: Ava reş

108 Dûd: Dûman

109 Mehber: Şuşeya murekebê

110 Mîzimar: Meydana rimb hawêjî

111 Beyda: Deşt



بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

وَلِلَّهِ الْعِزَّةُ وَلِرَسُولِهِ وَلِلْمُؤْمِنِينَ وَلَكِنَّ الْمُنَافِقِينَ لَا يَعْلَمُونَ

Şeref û 'izzet her ji Xwedê reye, ji pêxemberê wî re  
û ji bawermendan reye.

Lê belê munafiq nizanin.

(Munafiqûn: 8)

# ŞEREF Û 'IZZET -2

✍ M. Salih MISQEYNTERÎ

**“We lillahil ‘izzetû we liresûlihî we lilmumînî-ne welakinnel munafiqîne la ye’lemûn”** Şeref û ‘izzet her ji Xwedê reye, ji pêxemberê wî re û ji bawermendan reye. Lê belê munafiq nizanin. **(Munafiqûn: 8)**

Ji vê ayeta pîroz me gotibû pênc nukteyên girîng û hêja derdikevin. Me di nivîsa xwe ya buhurî de sê nuqte beyan kiribû, emê di vê nivîsê de jî yê mayî beyan bikin:

**A ÇARAN:** Cî û mekan û warê ku di destpêka ‘ewil de wehîy li wan daketiye. Hem jî ew zemanê yanî şev û roj û sala ku wehîy tê de daketiye. Ha

evana jî bi şerefa wehyê pîroz û muşerref bûne. Ew welatê ku pêxemberê Xwedê tê de jîyane, wehîy lê daketiye û bi hezaran enbîya, ewlîya, şehîd û ‘ulema tê de medfûn in, wan jî bereket ji wehyê sitendine, Xwedê bi wan cîyan sond xwarîye.

(Wettinî wezzeytûnî, wetûrî sînîne, we hazel beledil emîn: Ez bi hejîr û zeytûnê - cîyê ku ‘îsa lê jîyaye - bi çîyayê Tûra pîroz û mubarek û bi vî bajarê ewle -Mekke- sond dixum. Her wiha bajarê Mekkê, Çîyayê Nûr, Şikefta Hîrayê jiber ku bûbûn dergûş û himêz, ji bona wehyê dema daketina ‘ewil wê jî şeref stend û pîroz û mubarek bû.



Çiyayê Tûrê bûbû warê pîroz ji ber ku dema 'ewil wehîy tê de ji Mûsa ('e. s) re hat. Xwedayê Te'ala ferman kirîye: **Çi dema, Mûsa, hat texma agir, ji kêleka newalê ya rastê di mekanê pîroz de ji cem darê hat gazîkirin: "Ey Mûsa! Bêguman ez Rebbê 'alemê me" -Sûretê Qeses: 30-**

Xwedê dîsa ferman dike: **"Çi dema Mûsa hat texma agir, hat gazîkirin: Ey Mûsa! Bêguman ez Rebbê te me, êdî herdû solên xwe deyne. Bêguman tu li Tûwaya newalê pîrozî." -Sûretê Taha:11, 12-**

Xwedayê Teala ferman dike: **"Çi dema Mûsa hat texma êgir, hat gazîkirin: Kesê di nav êgir de - yanî di nav nûrê de - û kesê li hawêrdora wê hatiye pîrozîkirin." -Neml: 8-**

Li ser bereket û pîrozîya Mekke û camîya herêmê û li ser pîrozîya Qudsê û camîya wê, Xwedê Te'ala weha ferman dike: **"Munezzehe ewê -ew Xwedayê- ku şevê 'ebdê xwe -Mûhemmed- li rê bir ji camîya birûmet ku mizgefta Ke'beyê bi bal camîya dûrtir ku me hawêrdora wê mubarek kirîye." -Îsra: 1-**

Nûh ('e.s) dema li gemîyê siwar bûye, dû'a kirîye. Xwedê Te'ala ferman dike: **"Tu min li cîyekî mubarek daxîne." -Mumînûn: 29-** Xwedayê Te'ala dîsa ferman dike: **"Me ew -Îbrahîm- û Lût xelas kirin bi bal wê erda ku me ji bo 'alemê bereket xistibûyê." -Enbîya: 71-**

Her wiha zemanê ku wehîy tê de daketîye ew jî pîroze, biqîmete. Xwedê Te'ala ferman dike: **"Bêguman me ew Qur'an di şeva bi Qedr û Qîmet da daxistîye." Xwedayê Te'ala dîsa ferman dike: "Meha remezanê ewa ku Qur'an tê de hatiye daxistin." -Sûretê Beqere-**

Meha remezanê û Leyletul Qedr, Xwedê qedrê herduyan bilind kirîye ji ber ku Qur'an tê de nazil bûye.

**A PÊNCAN:** Wan muminên ku bawerî bi wehya Xwedê anîne, dilê xwe jê re musaîd kirine, nûra Xwedê di dilê xwe de hebandine. Bi mal û canê xwe di rêya Xwedê de xebat kirine ha wan jî para xwe ji şerefê stendin. Yek carekê tenê kesên ku piştî îmanê li cem pêxembera rûniştibin, Xwedê fezîlet û feyza sohbetê daye wan. Lê kesên ku pêxember nedîtibin jî hema îman bi wehyê anîbin, bi îmana

xwe re rast û durust bin, di kîjan zeman û welatî de bin, ferq nake ew biqîmetin, qedirbilindin heta roja qiyametê.

Me'lûm e, Xwedê bi sedhezaran nebî û resûl şandin ser cîhanê. Çawa ku Qur'an dibêje: "Me behsa hineka ji wan kirîye, nav û serpêhatîya wan gotîye. Û hinekî din jî me behsa wan nekirîye, nav û serpêhatîya wan di Qur'anê de derbas nebûye. Lê gelek nimûnê fedekar navê wan û serpêhatîya wan û peyamên wan ên tewhîdî di Qur'ana pîroz de derbas dibin, bi rehmet û sipasî têne yadkirin. Em dikarin di vê mijarê de çend heb mînakên ji Qur'ana pîroz bidin.

**1-** Di Qur'anê de sûretek bi navê "**Kehf**" (şikeft) heye. Piştî Îsa ('e.s) hinek xortên bawermend li ber serokê zordest û munkîr ku navê wî Deqyanûs bû, serî hildan, peymaneke tewhîdî dan. Ji ber melîk revîyan, ketin şikeftê. Sêsed û heft salan di xew de man. Ha jiber vê navê sûretê bûye "**Kehf**". Xweda ferman kirîye: **"Emê serpêhatîya wan bi heqqî ji te re bêjin. Ew hinek xort bûn, bawerî bi rebbê xwe anîn û me jî hîdayeta wan zêde kir. Me dilê wan xurt kir. Dibîr bînin dema rabûn ser xwe û gotin: Rebbê me rebbê erd û 'ezmana ye. Em ji wî pê ve ji tu îlahan re 'îbadet nakin. Bi sond be wê demê em peyvek beradayî dibêjin." -Kehf: 13, 14.**

Ne tenê wan şeref stend, heta ew kûçikê ku di mezhebê Îmamê Şafi'î de bi necaseteke giran necîse, lazime jibo tehareta wê carek bi axê, şeş caran jî bi avê bê şuştin. Ha ev kûçikê wan bi wan re ket şikeftê, ew jî **309 salan** di xew de ma û jiber ku hevaltîya wan başan kir, wî jî para xwe ji şerefê stend.

**2-** Di Qur'anê de sûretek bi navê "**Mumîn**" heye. Navê wî sûreyê ye din jî "**Ğafir**" e. Ji malbata Fîr'ewn pismamê wî îman anî. Jiber ku di wî sûretê de peyamên wî zilamê mumin derbas dibin, ev nav li sûreyê hatiye kirin. Xweda ferman dike: **"Ewîyê ku îman anîbû got: Gelî qewmê min! Bidin dû min, ezê we bighînim rêya rast. Gelî qewmê min! Ev jî-yana dinyê pertaleke, kêfek hindike, û bêguman axret mala seknêye. -Mumîn (Ğafir): 38, 39-**

**3-** Di sûreyê Yasîn de ew zilamê ji kêleka bajêr dûrtir hat dilezand, digot: **"Ey qewmê min! Bibin hevalên qasidan. Bibin hevalên wanê ku tu xelatê**



**ji we naxwazin û liser rêya rastin.” –Yasîn: 20, 21-**

Li gorî tefsîr dibêjin, wîya **Hebîbê Nekar** bû, hewariyên Îsa (‘e.s) bi qasidî hatibûn bajêr, wî jî bi wasîteya wan Xwedê nas kir, bi wehyê îman anî. Peyameke tewhîdî rêkir cihanê. Li ser vê gelê wî yê kafir ew şehîd kir. Lê hetta qiyametê wê peyamê wî bi pesn û sipasî bêne xwendin. Ev şerefa bawerîya bi wehyêye. Zeman, mekan û dîrok nikare wê bisekinîne. Xwezî meriv hevalê başan be, meriv kêmtirî wan be. Lewra xerabtirê başan çêtire ji baştirê xeraban.

**4-** Di Qur’anê de sûretek bi navê **“Meryem”** heye. Jiber ku serpehatiya Meryem tê de derbas dibe, ev nav lê hatiye kirin. Meryem digel ku ne pêxembere jî, peyamên wê derbas dibin. Jibo ku li cem Zekerîyya (‘e.s) şagirtî kirîye, bi wehyê perwerde bûye, bûye xwedîya keşf û kerematan. Qur’an behsa kerematên wê dike û melekê wehyê Cibrîl di şeklê însanekî de xwe pêş wê kirîye û bi fermana Xwedê pê re peyivîye. Ev şerefa wehyêye. Ev îzzet û serbilîndîya îmanêye. Xweda ferman dike: **“Êdî Xwedê ew, Meryem, bi qebûleke xweşik qebûl kir û terbiyeke xweşik ew terbiye kir û Zekerîyya kir kefilê wê. Her çi dema Zekerîyya di ‘ibadetxanê de derbasî cem wê biba, rizqek li cem wê didît. Digot: Ey Meryem! Ev ji te re ji ku tê? Wê digot ev ji cem Xwedêye. Bêguman kesê ku Xwedê jê hez bike, bêhîsab riziq dideyê.” –Al-î İmran: 37-**

**5-** Di Qur’anê de sûretek bi navê **“Loqman”** heye. Li gorî qewlê eseh ne nebî bû, şagirtîya Dawid (‘e.s) kiribû. Xwedê hikmet dabû wî. Peyamên wî yên îtîqadî, ‘emelî, exlaqî û civakî di Qur’ana pîroz de tên zikir kirin û bi navê wî nav li sûreyê hat kirin. Ev şerefa îman û wehyêye.

**6- Zulqarneyn,** ew jî li gorî qewlê eseh, ne nebî bû, melîkekî bawermend bû. Li rojhilat û rojava tevî hukum dikir. Xwedê serpehatiya wî di Qur’ana pîroz di sûreyê “Kehf” de derbas dike. Xwedê gelek derfet û îmkanên ‘ecêb û gîrîb dabûn wî, hetta sebeb û îmkanê ku dabûn wî, teknolojiya îro hê negihaştiye wê sewiyeyê.

**7-** Pîreka Fîr’ewn jiber ku îman bi Mûsa (‘e.s) anî bû, ji kanîya wehyê vexwaribû. Xwedê di Qur’ana pîroz de qala dua wê dike, hetta di hedîsê de Asiye,

yek ji çar pîrekên ku qencirê pîrekên cihanêne.

**8-‘Eshabê Mûhemmed** (‘e.s), Xwedê ji wan razî bû dema ku bi Mûhemmed (‘e.s) re bey’et kirin. Xwedê ferman kirîye: **“Bi sond be Xwedê ji muminan razî bû dema ku li bin darê bi te re bey’et kirin. Wî tiştê di dilê wan de nas kir, li ser vê wî dilxweşî daxist ser wan û fetheke nêzik ji wan re kir xelat.” Feth 18.** Xweda dîsa ferman kirîye: **“Ji mihacir û ensar ewanê ku ewilî bi îmana xwe ketin pêş û wanê ku bi qencî rêya wan şopandine, Xweda ji wan razî bû, ew jî jê razî bûn û jibona wan cennetên ku wê herdem tê de bin û ji bin wan çem diherikin amade kirin, evya xelasîya mezine.” –Tewbe: 100-**

**Resûlê Xweda** di hedîseke dirêj de behsa milyaketên seyar dike. Di paşîya hedîsê de ew civaka zikir, civaka baş Xwedê derheqê wan de wiha dibêjê: **“Gelî milyaketên min! Hûn şahid bin min ew ‘efû kirin. Liser vê zilamek ji Resûlê Xweda dipirse: Şexsek jibo karekî xwe bi rê buharî li cem wan rûniştîye. Ma qey ew jî? Resûlê Xweda weha bersiva wî dide: Ew qewm başe kesê li cem wan rûne jî nabe şeşî.”** Ha evêya bereketa hevaltîya hevalê wehyêye.

**9-** Ne însan bi tenê heta cin jî dema ku bi wehyê bûne aşiq û meczûbê heqqiyê, bûne nimûna şerefê di nav civaka hemcinsê xwe de. Xweda ferman kirîye: **“Di bîra xwe bîne dema ku me berê komek ji cinnan zîvirand bi bal te ve, li Qur’anê guhdar dikirin, çi dema hazirî xwendina wê bûn, gotin hiş bin, çi dema xwendin hat qedandin bi tirsdanê veşerîyan cem gelê xwe. –Ehqaf: 29-**

Seydayê me **Seidê Nûrsî** (r’ê) wiha gotîye: **“Eger ev peyvê min li dinyê belav bibin û însan jî wan bi’ecibînin, bipesinînin bêjin ev çiqas kelîmeyên xweşikin, ezê jî bi temamê qûwweta bêjîm ev kelîmeyên heqqin û heqîqetîn, lê belê ne malê minin. Malê Qur’anêne. Min bi xwe heqîqeta Qur’anê xweşik nekirîye heta ez nikarim xweşikîya wê bidim daxuyanî. Lê belê heqîqetên Qur’anê yên xweşik, peyvên min xweşik kir û qedr û qîmeta wan bilind kir.”**

Ya Rebb tu bi zemezma ava wehyê dilê me ji qirêja guneh û weswesên şeytanî bişo. Ya Rebbî tu bi cîla û nûra wehyê çavê me bi şewq û ronî bike, nêrîna tiştê batil li ber çavê me reş bike.



# BÊJE SEYDA

✍ Mehsûmê BAXÇAXÎ

Munafiqê l-derûdor  
Zalimê li hawîrdor  
Ew zulma wan qor bi qor  
Bêje Seyda çi zeman;  
Ma Ebûbekir neman?

Ji me re nabin serok  
Xwînxwarê hov û gezok  
Zulmê dikin van mijok  
Bêje seyda çi zeman  
Ma qey misluman neman?

Li Heleb Hamaw Şamê  
Ji avahîw ji 'amê  
Ma çi maye li qamê  
Bêje Seyda çi zeman;  
Ma Selaheddîn neman?

Kîjan heq kîjan batil  
Têrê nake hişaqil  
Kanî ronîw nûra dil  
Bêje Seyda çi zeman;  
Ma Se'îdên jîr neman?

Dûr xistin j-dîn û îman  
Nehîştin eql û ziman  
Dunya wan mij û dûman  
Bêje Seyda çi zeman;  
Mehdîyê axir zeman?

Kanî Sunnet û Qur'an  
Halê ummet perîşan  
Ji ber pençê zaliman  
Bêje Seyda çi zeman;  
Ma şêr Huseyîn neman?





# ÇIKÛS Û CAMÊR



✍ Fexreddîn ŞEMREXÎ

Meto, şelwarek lê, çefiyek reşbelek li dora stûyê wîye. Kincên wî gemmar û qetîyayî ne. Ji eşya û kar û îşê xwe pêve, tiştêkî din nabîne û nayê bîra wî. Kesekî çikos û çavnebar e. Ji lew ne ji xwe re, ne jî ji mala xwe re mesrefê dike. Sibehê zû motora xwe derxistîye derve. Wê ji gund mast, hêk û hinek tiştên din bive bajêr û bifroşe. Ji bajêr jî eşyayên wê li gund bifroşe, bikire û bi xwe re bîne. Ji ber li gund gundîkî din jî vî karî dike, Meto dixwaze zû biçê bajêr û berî wî gundiya vegere gund û eşyayên xwe bifroşe. Ehmedê (Hemo) kurê Meto, dora 14 salî ye, sol û cilên wî jî kevn û qetîyayî ne, rebenekî feqîr e, ji cir û hêrsa bavê xwe ditirse. Di çûn û hatina bavê xwe de alîkarîya wî dike. Meto li cem motorsikleta xwe ye. Qasa motorê dagirtîye û hê jî çavê wî li eşya ye. Gazî kurê xwe dike.

**METO:** Kuro Hemo! Ka wî mastî zû bîne. *(Ehmedê reben dest û lingê wî direcife, şerpeze û şaşmayîye. Gava Ehmed diçe, bavê wî di ber xwe de dipeyîve.)*

**METO:** Du elb rûnê nivîşk. Îcar petatê wî zêdebû. Her yek wê deh kîlo bê. Çiwalek kereng, tenekek penîrê parzone. *(Kurik 'elba mêt û şîrdankê bi xwe re tîne.)*

**METO:** Zû wûlan zû bîne. *(Meto wan dixwe herdû destê xwe weka wan biwezinîne û bikêf dibêje)*

Hiii..hi Dîya te îjar ava wan baş zêde kirye, çiqas giranin. Zahf başe. Kuro! Ka here ewan hêkana jî bîne. *(Gava kurik diçe, hinek gundî tîn û silavê li Meto dîkin.)*

**'ELÎ:** Birayê Meto! Me got hey tu diçî bajêr, hinek asûkê camiyê hebûn. Meyê perê wî bida. Te xêra xwe wan bistenda.

**HESEN:** Deh cot şemik, deh misîn, pênc empûl, du melkes. Jibo 'emelên mizgeftê jî, sê kîlo îsot, pênc kîlo firingî, çar kîlo balican.

**METO:** Weee hew! Ma ez ne hemmalê bavê we me. Motora min jî ne serwîsa gunde. Divê ez kar û îşê xwe bibînim.

**'ELÎ:** Eybe ji te re Meto! Ev asûkê mizgeftê. Ne jibo me kesîye.

**METO:** Ez çi karim li bendî asûkê we û camiyê bim. Wextê min tuneye ku wan hazir bikim.

**HESEN:** Meto! Ji Xwedê bitirse. Camî mala Xwedêye. Tu dikî, tu nakî. Tu bi xwe dikî. Kesê xêrê neke, xêrê jî nabîne. De ji te re oğir be.

*('Elî û Hesen, bi halê weka bêjin "madem tu ewqas li xwe tenê difikirî, çi derdê te hebe, pê bikeve" dev ji Meto berdidin û ji wir diçin. Gundî Evdilkerîm tê ba Meto.)*

**'EVDILKIRÎM:** Birayê Meto! Îlacê minî tensiyonê qediyaye. Hey tu diçî bajêr, evya reçeta wî ye. Ec-zexane hema li ber çeraxê. Te xêra xwe bianîya.

**METO:** Li qisûrê nenêre birayê 'Evdilkim! Zêde wextê min tuneye. Çi dibe çi nabe. Dûvre wenda bibe.. Ez naxwazim xwe bidim ber vî barî.

**'EVDILKIRÎM:** Yaw ma ewê çi pê bê? Bila tu biselametî bê, bese.

**METO:** Ê xwe ez naxwazim bînim. Ma ez ne memûrê tendurustiyê me. Ez ne gûlamê gundim.

**'EVDILKIRÎM:** *(Destê xwe dibe sînga xwe û dibêje)* Ya Sitar! Ya Sitar! Gava meriv tiştêkî ji te dixwaze, weka gurê manco werne te. Însan ewqasî xwetenêdîtî nabe. Ma tiştêkî ji kîsê te diçe? Hey xwelî nelisero! Felek dewran bi dore. De here, oğir be ji te re.



**METO:** *(Weka ew jî henekê bi 'Evdilkerîm bike)* Oğir be ji te re jî. We gûlamê gund dîtiye. Belaşe. Hema barê xwe li piştta kin. *(Di vê kêliyê de kurê wî tê, bitirs dibêje)*

**HEMO:** Bavo! Pantor û sola min qetiyane. Diya min jî dibêje zexîre nemaye.

**METO:** Wulan! Te çi zû qetand. Ev du sale ez van kincana li xwe dikim, hê tiştêk bi wan nehatiye. Ji diya xwe re bêje. Hinekî din debar bikin, qey ezê bînim. *(Eşyayên xwe li ser motorê bi kindir girê dide û dijdîne. Gava ewê birêkeve, feqîrek tê cem wan û dibêje)*

**GEROK:** Jibona Xwedê sedeqekê. Bila sedeqa serê zarokê te be, têkeve ber qezaw bela. Tu halê min dizanî. Jibo zaroka ji nan, ji xwarin, ji pere hema te çi da.

**METO:** Hew tu kêmbû. Here li derîkî din xe. Xwed-yê xêra pirin.

**GEROK:** Xweda dide û distîne jî. Malê çikûsa namî-ne di telîsa.

**METO:** Dûrbe ji vir, hê min dest ne avêtiye qirika te. Hem gerokî hem peyvokî.

*(Meto dikeve rê û berê xwe dide bajêr. Li gund Bedrî jî xwedîmotore. Lê ne weka Meto çikûse. Rûgeş û kincpaqije. Alîkarîxwaz û qenaatkare. Wî jî eşyayên xwe li motorê bar kirine. Berî birêkeve, gundiyên çûbûn cem Meto, îcar tèn ba wî jî.)*

**'ELÎ:** Kekê Bedrî! Hinek asûkê camiyê hene. Tê kari-bî xêra xwe bîne?

**BEDRÎ:** Tê karibî çiyê? Asûkê camiyê, sersera serçava. Înşallah ezê bînim. Tu ka lîsta wî bide min. Xîzmeta mala Xwedê, lime teva dikeve.

**HESEN:** Xwedê ji te razîbe. Xweda alîkarê tebe.

**'EVDILKIRÎM:** Birayê Bedrî! Welleh li qisûrê nenê-re. Îlacê minî tensiyonê qediyaye. Dixtor di vê re-çetê de nivîsandiye. Niza tê karibî bîne.

**BEDRÎ:** Tu ka reçetê. Înşallah ezê bînim. Xweda şîfa bide.

**'EVDILKIRÎM:** Wey Xwedê û pêxember ji te razî bin. Rêya te vekirî be, oğra xêrê be. Emanetî Xweda be.

**BEDRÎ:** Silamet ser çava. *(Feqîr jî derdê xwe dibêje.)*

**BEDRÎ:** Feqîrê reben! Êvarî heger bixêr ez vege-rî-yam, a li vir bendî min be. Temam?

**GEROK:** Wey Qur'an rêberê te be. Hîmmeta Nebî Muhammed ('e.s), destê Şêx 'Evdilqadrê Geylanî li piştta te be. Kar û qezenca te, bi xêr û bereket be înşallah.

Bedrî jî diçe bajêr. Gava ku ji bajêr vedigerin, Meto di rêya gund de qeza dike. Motora wî teqla davê, ew jî ji lingê xwe sivik birîndar dibe. Bacan û xî-yarên wî li derdorê belav bûne. Bi wî halî li xwe û li motorê digrî. Di wê hengamê de Bedrî jî ji bajêr vedigere. Tê li texma cîyê hedîseyê disekine. Diçe ba Meto.

**BEDRÎ:** Birayê Meto! Înşallah cîyekî te neêşiyaye. Halê te çawaye? Qeza çawa çêbû?

**METO:** Dîtina hew min dît, motor ji rê dageriya. Min xwest rast bikim, motor hema qilibî. Bizorê min xwe ji binî derxist.

**BEDRÎ:** Mala Xwedê ava, wa tiştêk bi te nehatiye.

**METO:** *(bi girîn)* Motora min! Asûkê min! Ka îja ezê çi bikim?

**BEDRÎ:** Tu dev ji motor û eşya berde. Bila tiştêk bi can neyê, mal û eşya hêçe. Ka te li motora xwe siwar kim. Li gund bila dixtor li te mêzeke. Înşallah tiştêkî te tuneye. Dûre emê motorê ji ca'l derxin. Ka têkevim bin milê te. *(Wî li motorê siwar dike û diçin gund. Gundî bi meraq li wan dicivin.)*

**METO:** Ya Rebbî! Min tobeye. Camêr û ciwanmerd li ba te qîmettirin. *(Gundî ji Meto dipirsin)* "Çawa çê bû Meto?" "Meto te çi kir?" "Înşallah tiştêkî giran tuneye?" "Qeza li ku çê bû Meto?" "Ewe Xwedê te sitirandiye."

**BEDRÎ:** Zêde meraq nekin. Tiştêkî wî tuneye. Ezê wî bibim nîşanî dixtor bidim.

*(Bedrî piştî tedawiyê Meto dibe mala wî)*

**BEDRÎ:** Xwarzê! Tiştêkî bavê te tuneye. Lingê wî hinekî êşyaye. Emê herin motora bavê te bînin. A ji tere ev sol. Bi xêr û xweşî be. Ev fêkî jî para wene. *(Bedrî vedigere cem gundîyan)*

**BEDRÎ:** Birayê 'Elî! A ji te re asûkê camiyê.

**'ELÎ:** Wey mala te ava. Xwedê xêra te qebûl bike.

**BEDRÎ:** Birayê 'Evdilkerîm! A ji te re îlacê te. Xweda şîfa bide înşallah.

**'EVDILKIRÎM:** Rehma Xwedê li dê û bavê te be.

**BEDRÎ:** Feqîrê reben! A ji tere! Evya jî para teye. *(kî-sek sebze û fêkî didê.)*



# ŞERMÎNE EM

✍ Ebuzer BAYRAM

Her çiqas bi gotin û qala, tînin ziman em car cara  
Di nav vê rojeva tarî, şorê me dertêne vala  
Evîna te li ser ziman, ne hêsane em bixin dilan  
Di vî qirnê axir zaman, me hêvî ji Xwedayê Re'hman

Hêz û qûwweta me qedîya, kezeba me li ser 'helîya  
Em bûne her weke gîya, ji me tiştêk nabe xwîya  
Di civînin mal û mulkan, me xwe kuşt wek 'hemalan  
Nabare îdî li me baran, lewra em mirin bi xeyalan

Jiyaneke bi daxwazîya, bû armanca me hemîya  
Qaşo me go em hêvîya, jar û feqîr û birçîya  
Mehrûm û mazlumê cihan, her roj dimirin bi sedan  
Li 'îraq Sûrî û Araqan, kes nabihîze dengê însan

Şermîne em ji te Xweda! Me neşopand riya cedda  
Rêya qenc û pêxembera, ji xwe re me nekir çîra  
Ey ewê hatîye bi Qur'an, ji bo însan û hem cinnan  
Navê te ye li ser ziman, me hêvîye bikev dilan





# LI SER ŞÊWRÊ

✍ Yehya ÊZDARÎ

**“Der barê karên tê bikî de bi wan re bişêwîre.”  
(Al-î Imran-159.)**

Xwedayê Te’ala di vê ayetê de emrî Resûlûllah (s.e.w) dike ku di şuglê xwe de bi eshabê xwe re îstîşare bike. Lê belê di şexsê Resûlûllah (s.e.w) de tevê muminan muxatabê vê ayetêne ku di şuglê xwe de şêwrê bikin, bi hev re bişêwîrin. Di sûretê Şûra, ayeta 38an de jî Xweda weha ferman dike: **“Karê wan (muminan) di nava wan de bi şêwrê-ye.”** Dema wê ji bo şuglekî qerarekê bidin, li hev dicivin û fikra xwe ji hevra dibêjin. Piştê li ser fikrekê bi hevra qerarekê didin. Û vê qerare pêk tinin.

Şêwr meseleke civakîye ku civak nikare dev ji vê dustûrê berde. Îslam dixwaze ku heger di heqê civakê de qerarek bê sitendin, ev qerar bi dilê civakê be, daku pêk anîna vî şuglê bi civakê giran neyê û bi dilekî xweş vê qerare bi cih binin. Aqil heye ji aqilekî din zanatire. Jilew heger di meselekê de emrekî xuyayî tunebe, lazime fikra aqilmenda bê sitendin. Çaga fikir bê sitendin, wê bê dîtîna ku tiştên mirov nafikire, hevalê mirov dibêje û tev de jê tê îstifadekirin. Îslam bi nefsa însên re jî mucadelle dike û enanîyetê bi tu awayî qebûl nake. Ji ber vêya digel ku nefsa dixwaze xerabîyê bide kirin pê ra tunebû jî ewwîlî emrî Resûlûllah (s.e.w) bi şêwrê dike. Peyre emrî tevê mumina dike ku şêwrê bikin.

Heger însan ji bo şuglekî şêwrê bike, lazime di kesên bi wan şêwir tê kirin de hinek xususîyet hebin. Divê fikir li gorî hewa û hewesê neyê gotin. Yek hesedê yekî bike, wî nekşîne, ne mumkine fikreke baş jê re bêje. Jibo vêya lazime mirov, kesê pê re dişêwîre baş bineqîne. Her wiha di meselê de kesên pê re şêwr tê kirin, lazime zana be. Nexwe wê rêya gelet ber mirov bixe. Kesê nezan be, ya jî nefsa pê re hebe û îdara şuglekî di destê de be, naxwaze li hember wî tu kes xeber bide û tişteki bêje. Gelek caran jî ji şêwra bi hinekan re ditirse. Naxwazin hinek aqilmend bipêş bikevin. Jibo textê

wan nekeve talûkê, îdara şuglê xwe li gor hewa û hewesa xwe dimeşînin. Ji tu kesî tişteki napirsin. Bi vî awayî yeqîn dikin ku wê îdara wan dirêjtir di destê wan de bimîne.

Şêwr jibo her şuglekî derence bi derenceye û bi awakî ji hev cûdane. Lê lazime em bizanibin ku şêwra herî berjêr, şêwra di nav mên û jin de ye yanî di şuglê malê de bi hev bişêwîrin. Şêwra di îdara dewletê de şêwra herî berjore ku îdarevanên dewletê bi xelkê xwe re bişêwîrin û fikra van bistînin. Di sîreta Resûlûllah (s.e.w) de em vêya xweşik dibînin, lewra di şuglê dewletê de bi eshabê xwe re şêwirîye. Piştê ji şêwrê çî qerar derketîye, bêşek ew qerar tetbîq kiriye. Nimûna herî xweşik û eşkere jî di herba Ûhûdê de tê dîtîna. Digel ku Resûlûllah (s.e.w) xewn jî dîtîbû, şêwr kir û ne bi dilê wî bû jî, qerara jî şêwrê derket pek anî.

Divê bê zanîna me’na ku Îslam dide şêwrê û me’na ku îdeolojîyên geyrî Îslamî didine şêwrê ne weke hevin. Belkî di hinek tiştan de bişibîne hevdû jî lê belê ev nayê wê me’neyê ku Îslam ‘eynî me’neyê dide şêwrê. Lewra tiştê ku di heqê wî de jî Qur’an û Sunnetê, ji îcma û qiyasê delilê qetî hebin, lazime bi ya vana bê kirin. Tu nikarî bêjî ezê ji xelqê bipirsim û bi ya xelqê bikim. Hingî Xweda û Resûlê wî çî gotibin, tê bi ya wan bike. Yan jî di îcma û qiyasê de çî hatibe gotin, tê bi ya wan bike. Lewra Îslam di vê meselê de emir eşkere kiriye. Di destê mirov de heqê neqandinê nemaye. Lê belê di mesela ku mezheban li ser wê îxtilaf kirine, di wê de neqandin mumkine. Her wiha esasê şêwrê di Îslamê de jî îdeolojîyên din cudaye.

Hate fêmkirin ku şêwr di Îslamê de gelek muhîme û di şêwrê de jibo jîna civakî û şexsî gelek hikmet û fayde hene. Heger mirov bixwaze qeraren bi îsabet bide, gavên bizanîna bavêje, lazime mirov emrê Xwedayê Te’ala bi cih bîne û şêwrê bike. Piştî ku meriv bi ya şêwrê kir, meriv alîkarîya Xwedayê Te’ala tê de bibîne. Heta nivîseke din bimînin di xêr û xweşîyê de.



# FEQÎYÊ TALIB

✍ Nûreddîn QOSERÎ

Em dîsa behsa feqîyan dikin. Lê ne feqîyên mubte-dî, feqîyên ku li medresê ji wan re tê gotin **“talib”** Her wiha emê behsa astengên li pêşîya wan û pirs-girêkên li ser rêya wan bikin. Bêgûman jibo tehlîl û tedkîka mijarekê, hewceyî bi haydariya ji wê demê heye, bi awayê meriv ji gellek tiştên (bûyerên) wê demê haydar bibe. Wek ku gelo çî bi sedem çî çêdibe. **YANÎ GEREK MERIV ZANEYÊ DEMA XWE BE.** Ka em vegehin mijara xwe û minakekê ji mijara xwe bidin, daku daxwaza me bê zanin. Mîsal em bêjin **“Gelo îro xortên dema me, bi çî hedef û armançê diçine zanîngehan? Gelo ji bo bibne mihendis û ji xelqê xwe re xizmet bikin an ji bo bibne mihendis û jiyaneke bi konfor û rehet biborînin?”** Bêgûman bersiva vê pirsê a rast, di haydariya meriv a derheqê vê dema deye. Heke em qebûl bikin, xortên me jiboni herdu armanca bi hev re dixwînin. A ku akil bêzêmet qebûl dike jî eve. Ew çax em di gelleke gelekî mezin dene. Lewra du armançên zidî hev, di qelbekî de nacivin. Welew ku bicivin jî biser nakevin. Yani xwendevan ya ji bo xizmeta xelqê û riza Xwedê dixwîne, yan jî jibo bidestxistina dunyayê. Heger kesek jibo Xweda bixebite, ewê Xwedayê Te’ala dunya wî kesî li pey armanca wî bimeşîne. Yani kesê ku jibo xizmeta xelqê bibe mihendis, ewe Xweda(c.c) berê heskirin û îhtiyacên xelqê bide wî. Ew jî ji alîkî ve wê xizmeta mexlûqê Xweda bike. Ji aliyê di ve jî ewê debara xwe biferehî bike. Bera kes nebêje pêxember (s.x.l) gotiye **“Kesê axretê dixwaze, bera ‘ilm bixwîne. Kesê dinyeyê dixwaze bera ‘ilm bixwîne. Kesê herduka jî dixwaze bera ‘ilm bixwîne.”** Li gorî vê hedîsê du armanç bi hevra di dilekî de dicivin. Nexêr ev hedîs nayê ma’neya ku du armanç bi hev re di dilekî de dicivin. Di serê hedîsê de pêxember(s.x.l) însên teşwîq dike ku ‘ilmê hew jibo Xwedê bixwîne. Heger kesê ne xwedî şî’ûra xwendina jibo Xwedê be,

bera jibona bidestxistina dinyeyê ‘ilmê bixwîne. Lewra hêvî heye ku xêr û fezîleta ‘ilmê, wî kesê dilxwazê malê dinyeyê vegehin ser armanca afirandina wî ya heqîqî. Jixwe qismê sisîyan jî hedîsê weke pêşîya hedîsê beyan dike. Dibêje: **“Ey însanê ku him mûxtacê axretêye, lewra jibo axretê afiriye, him jî mûxtacê pertalên dinyeyêye, lewra li dinê jibo berdeewamkirina jiyaneke hewceyî bi vana heye! Tu mûxtacê ‘ilmêye, jibo herdu hewceyîyên xwe ‘ilmê bixwîn.”** Xweda û Resûle Xwedê ya rasttir dizanin. Madem Xweda û Resûlê wî, me mislumana teşwîqî xwendina jibo riza Xwedê dikin, naxwe hewceye em jî xetika îstîqameta xwe rast bigrin. Û hew jibo razibûna Xweda bixwînin. A di vê derê de astenga herî mezin derdikeve pêşîya feqîyên vê dewrê.

Gelo feqîyen dema me, ji van saiqan xwe bi kîjan girtine? Wexta em ji ‘emelan bal bi niyetan ve biçin, pêwîste ku em li kirinên feqî û melayên xwe yê vê dewrê binêrin bê ka ji wan kî bi çî meşgûle. Yanî kirinê wan beyana nîyeta wane. Na heger em ji nîyeta bal bi ‘emelan ve herin, pêwîste ku em li dîroka xwe binêrin.

Heger em bi çend gotinan vê daxwazê binin ziman, em dikarin vêya bêjin: Sedema ku ‘alimên muceddîd û serdestî îdarevanan ên dema paşî a Osmanîyan çima di medreseyan me de negihane eve: Feqîyên wê demê, hew jibo meaşê ku yek dikaribû bi re’hetî pê debara xwe bike dixwendin. Jixwe hema ku ‘îcaze bidest dixistin, îdara dewletê ev wezîfedarî û tayînî cîhekî dikir. Ya dibûne qadî, ya dibûne katib, an tebîb an jî mihendis di xizmeta dewletê de. Ji vê rewşê dewlet jî memnûn bû, talib jî memnûn bû. Nûjenkirina ‘ilmê û berhemên nû û serbixwe di bala kê de bû. Rewşa ‘alema Îslamê îro li ber çavaye. Çî huner çî zena’et îro bi ‘ilmêye, ew jî dûrî koma me ehlê medresaye.





# TE TEMÎNA ÇAVÊN REŞ Û BELEK LI KÎ KIR?

✍ Cihan BAWER

Tê gotin ku rojekî ji rojan derwêşek bi hêla Farqîna Diyarbekir ve diçe û berê xwe dide mala şêxekî da ku lê bibe mêvan. Derwêş silava xwe dide û derdikeve 'hizûra şêx. Der û dora şêx ji mirîdên wî dagirtine. Piştî ku bixêrhatinê didin hev û li hev dipirsin şêx pirseki ji derwêş dike: "Eya derwêş! Ji war û cihên ku tu jê tê çî xeber heye?"

Derwêşê ku li mala şêx bûbû mêvan, pirsra şêx bi helbestê dibersivîne:

**"Çiyayê mezin berfê lê kir  
Kewa gozel hêlîn lê çêkir  
Wextê tu çûyî welatê xeribiyê  
Temîna çavên reş û belek te li kê kir"**

Çawa gotina derwêş xelas dibe, şêx di nav destên mirîdan de bêhiş dikeve. Biskek derbas dibe şêx tê ser hişê xwe û cardin ji derwêş dixwaze ku wan gotinên xwe bîne zimên. Derwêş ji ber daxwaza şêx gotinên xwe yên berê dubar dike. Şêxê reben dîsa bêhiş dikeve. Ev bûyera bêhişketinê û şitexaliya di navbera şêx û derwêş de çend caran dubare dibe.

Mirîdên şêx li rewşê mêze dikin ku rewşa şêxê wan qet nebaş e, hema radihêjin şêx dibin odekî, derwêş jî dibin odekî din. Demek dirêj derbas dibe û şêxê ku li ser hev ji ber gotinên derwêş bêhiş diketê tê ser hişê xwe. Şêx çawa ku tê ser hiş jî mirîdên xwe pirs dike: "Ka

derwêş li ku ye?" Mirîd wiha bersiv didin: "Eya şêxê me! Me dît ku tu ji ber gotinên derwêş bêhiş dikevi û rewşa te ber bi nebaşiyê ve diçe me we ji hev veqetand." Derwêş nuha di oda din bi tena serê xwe ye."

Piştî ku şêxê wan xebardana xwe xelas dike mirîd pirseke wihareng jê dikin:

"Eya şêxê me! Ev çî 'hal e, çima tu ji ber gotinên derwêş bêhiş dibî?"

Şêx di nava tefekkurê de bi şikleke aram wisa bersiva pirsra mirîdên xwe dide: "Herwekî ku hûn jî dizanin derwêş jî min re van gotinan got:

**Çiyayê mezin berfê lê kir  
Kewa gozel hêlîn lê çêkir  
Wextê tu çûyî welatê xeribiyê  
Te temîna çavên reş û belek li kê kir**

Şêx piştî ku gotinên derwêş dubare dike, dest bi şîroveya gotinên derwêş dike û wiha dibêje:

"Derwêş ji min re got ku "çiyayê mezin berfê lê kir." Ev tê vê manê: Ew çiyayê mezin serê însên e, ew berfa ku li ser wî çiyayê mezin dibare jî mûyên spî yên ku dikevin serê însên e û dîsa ew 'elametê kalbûnê û mizgîndarê mirinê ne."

Dîsa derwêş jî min re got: "Kewa gozel hêlîn lê çêkir." Ev jî tê vê manê: Dema ku mûyên spî mîna berfê li ser çiyayê ku mîna serê insanane dikeve, çawa ku kewê gozelê 'hinekîrî di wextê wê de hêlîna xwe bi şikleke baş û xweşik vedide û çêdike bi heman awayî hêlîna insanê ku ber bi mirinê ve nêzik dibe jî tê vedan.

Derwêş di berdevama axavtina xwe de dîsa jî min re got "Wextê tu çûyî welatê xeribiyê, Te temîna çavên reş û belek li kê kir?" Ew jî tê vê wateyê: Dema ku tu kal bûyî û gihastî ber mirinê hêlîna ku ji teref kewa gozel ve hat vedan dê bibe qebra te. Dema ku tu ketî wê qebrê ka tu dê xwe bisperî kê. Tuyê çawa hesabê wan tiştên ku te li vê dinê kiriye bidî.

Dema ku derwêş ev riste xwend tirs û ze'hmetiya hesabdayinê û zorbûna roja axretê hat bîra min û ez jî tirsra Xweda bêhiş ketim..."





# ÎSTÎQAMET KERAMET E, ĞEFLÛT HEZÎMET E



✍ Mustafa TURAN

أَحْسِبُ النَّاسَ أَنْ يُتْرَكُوا أَنْ يَقُولُوا آمَنَّا وَهُمْ لَا يُفْتَنُونَ

**“Însan dibê qey bêje “Me îman anî”, ewê dev ji wan bête berdan û ewê neyên ceribandin?” (‘Enkebût-2)**

Xuda Te’ala, dixwaze em bawerî pê bînin. Lê belê dixwaze ku em di bawerîya xwe de rast bin. Ji ber vê, me bi gelek wesîla diceribîne bê ka bi rastî me îman aniye yan na. Lewra gotina bi dev, ne bese jibonî qebûlkirina îmanê. Mirovê mu’min, hem bi gotinê xwe hem bi kîrinê xwe li gorî Rebbê xwe dijî. Heyeta wî li ser îstîqametê ye. Belê îstîq-

met çiyê? Îstîqamet, ewe ku meriv li ser rîya musteqîm be. Ew rê her tim raste û ti carî xwar naçe. Ew rêye ku meşa tê de, meriv dibe xelasîyê; lê terka wê meriv dibe xusranê. Çawa ku sûreyê ‘Esr ji mere beyan dike: **“Sond be bi ‘esrê! Bi rastî mirov tev di xusranê dene. Ji bilî (ji ğeyrî) yên ku bawerî anîn û karên qenc (‘emelên salih) kîrin û**



## heqqî yû sebrê li hev şîret dikin.” (Esr-1-3)

Ji vê sûreyê tê fehmê kû îstîqamet di jîna me de tune be, rêya em tê de dimeşin ne rêya rast be, xelasiya me tune ye. Ji ber vê mu'min, rêwingê vê riyêye her tim. Ew qet ji vê rê şaş nabe. Baweriya wîya ji Xuda, ti carî ji ciyê xwe naleqe. Hem bi jiyana xwe, bi 'emelê xweyî salih, îmana xwe îsbat dike. Emr û nehyê ku Xudê dane, bi cî tîne. Zikr û 'îbadetê xwe bê riya dike. Mu'min xwe di vê rê de tenê nafikire. Ew li însanê dora xwe jî difikire. Ji ware heqqiyê dibêje, dîne Îslamê tebliğ dike. Lê belê meşa di vê riyê de nerehete. Cewr û zehmetê wê zêdene. Wekî ayeta 'ewil ku borî dibêje, însan wê were ceribandin. Mu'min li pêş ber van îmtîhana lazime sebirkêş be, bi semağ be. Lewra îmtîhan ne rojek û du roje. Mirovê mu'min, di kirina 'îbadet û emrê Xuda de lazime bi qerar be. Ne ku rojekê 'îbadetê xwe xweşik bike, lê roja dî neke. Yan jî emrê Xuda carna bi cî bîne lê carna jî guh lê neke. Ev ne îstîqamete, ev ne meşa riya musteqîme. Hem dîsa lazime mirovê mu'min, ji dûrbûna ji guneha, ji parastina neqencîya jî, xwe bigre û sebir bike.

Hem di gotin û tebliğa dînê Xuda de jî, gelek îmtîhan wê werne pêşya mirovê mu'min. Neyarê Xuda wê wî bitirsînin, wê te'dê bidinê û heye ku qesta canê wî bikin. Li pêş van zehmet û zorîya, dîsa jî sebir lazime ji mu'min re. Lewra halê îstîqametê nerehete. Lê belê bi îzna Xuda Te'ala, mukafata wê jî hêjaye. Ku mukafata wê hem riza Xuda Te'alaye hem cenneta ebedîye. Kesê li ser vê rê bimîne û ji vê riyê nederkeve, ew kes xwedî keramete. Lewra kerameta herî mezin îstîqamete. Mirovê mu'min, bera vê qenc zani be kû li ser riya musteqîm dijmin pirin. Li ser vê riyê nefis û şeytana gelek xefik vedane. Lazime mu'min, hişyar û bîrwer be. Ew ticarî xwe bêtedbîr nehêle, destê xwe bide destê rêzane-kî û bi cema'eta mu'mina re bimeşe. Lewra nefis û şeytan kârin kesekî bi tenê, bi rehetî ji rê derînin; lêbelê nikarin cema'etekî ji rê derînin.

Şeytan, heta însana nexine gefletê, ew bi însana nikarin. Ji ber vê, dixwazin ku însana bi tenê

bihêlin û wan ji nav kom û cema'eta mu'mina dûr bikin; da ku kes neyê bi hewara wan de. Wextê însan bikeve halê gefletê, hingî çek û sîlehê xwe ji ser xwe dideyne û li ber dijminê xwe, xwe bêsênc dihêle. Wê demê însan, nikare li ber dijminê dijar xwe bigre û meğlûb dibe. Geflet, dûrbûna ji Xuda Te'alaye. Hem kislaniya di zikrê Xuda deye û hem te'wîzdana ji 'îbadetaye. Lewra wextê qelbê însan, ji zikr û fikra Xuda Te'ala dûr dibe û bi masîwayê mijûl dibe, ew demê şeytan deriyekî ji xwe re dibîne û tê ser qelbê însan, hêlîna xwe çêdike. Wê demê, şeytan îstîqameta wî însanî xera dike û wî ji riya Xuda Te'ala derdixîne.

Ji ber vê mu'min, lazime ticarî di kirin û bicîanîna 'îbadeta de, xwe bêgîret neke û li ber nefis û şeytana ne te'wîzkâr be. Hem lazime ew, li ber deriyê qelbê xwe, her û daîm nobedar be. Ew, ticarî nekeve halê gefletê û demekî jî, ji şeytan gafil nebe. Yan na ew xebata wîya bi sala, heye bi hicûma nefis û şeytana beyhûde here. Ustadê şîrê Şeyh Ahmedê Cezerî vî halî wiha di Dîwan'a xwede tîne ziman:

***Bi narê firqetê sohtim  
Ji ferqê ser heta pê da  
Xedenga gefletê nuhtim  
Ji berqa lami'a tê da***

***Xedenga firqetê re'd e  
Dilê ew gefletê lê dit  
Dibêjim wer cebel bit ew  
Bi ker bit wê di gavê da***

Di dawîya peyva xwe de, em dîsa gûh bidin فرمانê Xuda Te'ala, bê çî ji mer dibêje:

فَاسْتَقِيمْ كَمَا أُمِرْتَ وَمَنْ تَابَ مَعَكَ وَلَا  
تَطْغَوْا إِنَّهُ بِمَا تَعْمَلُونَ بَصِيرٌ

**“Naxwe tu û ewên ku digel te tobe kirine, çawa ji te re hatiye emirkirin wiha xwe rast bikin, li ser îstîqametê bin û heddê xwe derbas nekin. Bê guman tiştê wûn dikin Xuda dibîne.” (Hûd-112) Bê guman, Xuda Te'ala rast gotîye!**



# QÎMETA XWENDINÊ

✍️ Receb FÎDANCI

**Hemd ji Xweda re be. Selat û selam li ser Resûlê Xweda be.** Hûn xwendevanên bi rûmet! Ez li we bi silava Xweda silav dikim. Hevalên hêja! Bi îzna Xweda di vê nivîsa xwe de, emê qala qîmeta ku dîne Îslamê daye xwendinê bikin.

Em mensûbê dînekî wisane ku emrê wî yê yekem “bixwîn”e. Ji lew gerek em daîmî bi xwendinê ve meşxûl bibin. Çûnkî Îslam li hemberî cehaletê herb îlan kiriye. Giringî daye ‘ilm û xwendin û hînkirinê. Li ser rûyê erdê ti dîn û ti îdeoloji, qasî dîne îslamê giringî nedaye ‘ilm û xwendinê.

Di vê dinya roja me de her çiqas em ji pêşveçûna mewcûd fêhmî dikin jî xwendin karekî pir giring e. Musluman di vê mijarê de gere Resûlê Xweda ji xwe re bikin mînak. Piştî herba Bedrê her muşrikê ku esîr hatibû girtin, di bedêla xwendin û nivîsandinê hînî deh misilmana bike, serbest dihate berdan. Ev nişanî me dide ku Resûlê Xweda çî qas giringî daye xwendinê. Di dewra ‘esra se‘adetê de mescîd ne tenê mekanê ‘îbadetê bûn, wek meclîsên ‘ilmê jî dihatin bikaranîn. Hînbûna ‘ilmê û xwendina kitêban, ‘hewcetîyeke zarûriye. Çûnkî şexis çewa ku gava ji xwarin û vexwarinê qut dibe, maddî bêhal dikeve, gava jî ‘ilm û xwendinê dûr dikeve jî manewî nexweşînek derbas dike.


Însan çî qas dixwîne, fêhmî dike ku ‘ilmê wî çî qas hindike, xwedî ‘ilmekî piçeke. Mîna ku hînbûna xwendinê qezenc dike, bêtir dixwaze bixwîne. Xwendin bergeha însan vedike. Çavnêriya însên a li dinyayê firehtir dike. Pirên me em gunehên biçûk, wek

talûkeyan nabînin, lê encax xwendineke ‘ilmî Îslamî ya hûr û bi ‘hîkmet, di musulmanan de li hemberî gunehan hessasîyetekê çê dike.

Kesên ku Xweda ji wan hez dike, xisûsiyeteke wan jî ewe ku ehle ‘ilmê ne, ‘umir bi şiklekî derbas dibe dere lê tiştê muhîm, evana wextê xwe tije derbas dikin. Bi çaya ku dîne Xweda bighînin însana teva, guhê xwe dane ‘ilmê. Sebebê şandina însan a vê dinyayê jî bi heqqî ‘evdîtîya ji Xwedê Te‘ala re ye. Kesên ji Xwedê Te‘ala re herî baş ‘evdîtîyê dikin, yên zêdetir bi ‘ilmê re meşxûl dibin, Xwedê bi heqqî nas dikin, bi Xwedê îman tinin û jê re ‘îbadet dikin. Heger ‘ilm tunebe, ‘îhtîmala ketina xefikên şeytên zêdetir dibe.

Kesê dixwîne, gencîneya wî ya peyvan zêde dibe. Axaftinên wî bi ‘hîkmet û tesîr dibin. Xasseten dozvanên dîne Îslama kamil û bêkêmasî, yên li ser dinyayê hakimbûna dîn ji xwe re kirine derd, bi armanca dîne Xweda bighînin zêdetir civatan, gere daîmî kitêba bixwînin û bi ‘ilmê re meşxûl bibin.

Musluman divê şukur bikin ku mensûbên û peyrewên dîne wî pêxemberî ne ku ‘ilm û hînbûnê teşwîk dike û hînbûna ‘ilmê teşwîk dike. Û hem jî gerek emrê Xweda û Resûlê Xweda (s.x.l) bi heqqî bi cih bînin.





# EM ŞİYAR BIN

✍ M. Mustefayê Mela 'Elîyê ÊZDARÎ

Ev çî geflet em tê dene  
Kârê me tev lîsk û kene  
Dinya ji mer ne meskene  
Şiyar bin ey birayê min

Boy çend rojê vê dinyayê  
Çima axret me bîr nayê  
Me xêrê xwe dan ber bayê  
Şiyar bin ey birayê min

Me j' bîr kir dinya fanîye  
Me barê xwe lê danîye  
Qîma xwe me pê ânîye  
Şiyar bin ey birayê min

Qenc xerab dinya dibûre  
Me war tirba reş û kûre  
Bawer kî ew j' me ne dûre  
Şiyar bin ey birayê min

Dinyayê em ğirandine  
Şağê xwe l' me gerandine  
Qelbê me tev mirandine  
Şiyar bin ey birayê min

Kâ şiyâr bin ji vî hâlî  
Xwe j' dinyayê bidin âlî  
Xebat kin j' boy Rebbê 'âlî  
Şiyar bin ey birayê min





Di doza îslamî de ji bo mislimanan Girîngiya şîarên

# SIR, RAZ û VEŞARTÎYÊ

✍ Muhemmed ÇELÛK



**Belê gele xwendevanên bi rûmet û bi-rayên hêja.** Her weke ku ji teref we ve jî tê zanîn şerê di nava heq û batilê de dê heta roja qiyametê berdewam bike. Dîsa tê zanîn şeytan û terefdarên xwe ji bo ehlê heqê lewaz bikin û wan ji rastê rabikin heta îro her çî ji destên wan hatibe kirine û dê ji îro pê ve jî bikin. Lê belê divê neyê jibîrkirin şeytan û terefdarên wî her çî qas bi hêz û qewet bin jî zafer û arîkariya Xweda Te'ala her tim li ba terefdarên heqqê ye, ango li ba wan kesên ku ji bo rizaya Wî bi şev û roj dixebitin e. Lewra kesên ku baweriyê bi heqqê anîne û di wê riyê de dimeşin xwediyê metoda hareketa herî mezin û xwediyê mucadeleyeke ulvî ne. Lewra Ellah 'Ezze we Celle him jiyânên wan û him jî mucadele û tekoşînên wan bi wehya îlahî sererast dike û piştgiriyê dide wan.

Xweda Te'ala di wê şerî'eta munewwer a ku ji Hz. Muhammed (s.x.l) re nazil kiriye û dê heta qiyametê jî berdewam bike de metoda ku dê di de'weta Îlahî de bê şopandin him di heyama Mekkê de û him jî di heyama Medîneya Munewere de nîşanî me daye.

Ev nîşandan ne tenê ji bo heyamê ye, berewajî ji bo temamê heyam û temamê Mislimanan e. Çawa ku me gotibû ev şerî'eta pîroz û mubarek heta qiyametê derbasdar e.

Dema ku em şert û mercên heyama Mekkê û civata wê demê binêrin û bi şikleke sîyasî şertan binirxînin em ê hîngê ehemiyeta raz, sir û veşartîyê bi şiklekek kamil fêm bikin. Lewra dema Îslam li ser axên Mekkê rû



da weke ku tê zanîn ji çar aliyan êrîşên hovane û zalimane li vê doz û de'wê û li kesên ku milên xwe dan vê dozê hatin kirin. Ji ber vê yekê di heyam û qonaxên ku êrîş li dozê û li kesên xwediyê dozê tên kirin de veşarîtî û razbûna dozê ji ber selahiyet û ehemiyetê esas e.

Ji bo mijar û mesele baştir bê fêmkirin em dikarin çend mînakên ji rêzê bidin:

Wek mînak Resûlullah û eshabên Wî tam 13 salan xebat û mucadeleya xwe ya Îslamî li Mekke domandin. Di nava van 13 salan de xebatên Îslamî yên 3 salên pêşî bi şikleki mexfî û veşartî di nava metoda Îlahî de hatin kirin. Her wiha di vê pêvajoya 13 salan de her gava ku hat avêtin bi hisab û bi tedbir bêyî ku muşrik û kafir pê bibihîzin hatin avêtin.

Ji vê serdemê re mînaka herî delal hereketa Hîcretê ye. Weke ku hûn jî dizanin Hîcret bi şikleke neşkere hat kirin û him jî teref mislimanan ve û him jî ji teref Hz. Muhammed ve gelek tedbî hatin standin. Ger ku ev hîcret ku hat kirin nexasim a Hz. Muhammed bi şikleke eşkerebana Xweda çêtir dizane dê hereketa Îslamî derbeyeke mezin xwaribana. Lê belê ji ber ku ev hîcret di bin metodên Îlahî de hat kirin Misliman bêzirar û bêziyan gihastin Medîneya Munewere.

Ji bo girîngiya raz, veşarîtî û sîrrê ya di doza Îslamê de çêtir bê fêmkirin em dikarin ji dewra Medîne jî mînakekê bidin:

Her weke dê bê bîran pêxemberê me li Medîne dema ku seriyeya ewil ber bi Deşta Nehlê ve bi rê kir tevî serdar Abdullahê kurê Cehş 8 kesan wezîfedar kir. Beriya ku ev seriye bi rê bikeve Hz. Muhammed nameyeke ku çend tişt tê de hatibûn nivîsandin da Serdarê Seriyê Abdullahê kurê Cahş û jê re got ku 'Heta 2 rojan ber bi Mekkeyê ve bi-meşin û piştî dawiya 2 rojan vê nameye cihê ku we lê gihayê bixwînin.' Abdullahê kurê Cehş û hevalên xwe weke ku pêxemberê me ji wan re gotibû bi qasî 2 rojan meşyan û gihastin serê girekê ku ev gir jî nêzî Deşta Nehleyê bû. Abdullah dema name

vekir ev tişt hatibû nivîsandin:

**“Ey Abdullah dema ku te vê nameyê xwend qet zextan li hevalên xwe neke û berê xwe digel hev bidin ber bi Deşta Nehleyê ve û li wê derê mişrikan bişopînin ka çi karî dikin.”**

Ji vê gotina pêxember diyar dibe ku pêxemberê me seriye ji bo berhevkirina îstîxbarata herêmî bi rê kiribû. Di vir de tiştêki balkêş heye ew jî ev e; ji Mislimanên ehlê Medîne tu kes nizanibû ev seriye ji bo çi û bi ber kû ve diçe, lê belê ya ecêbtir jî ev e; Abdullah û hevalên wî jî nizanibûn bi çi niyetê û ber bi kû ve bi rê ketine.

Abdullah piştî ku fermana Resûlullah xwend re bi şikleke nerm û erênî peyama Resûlullah ji hevalên xwe re teblîx kir. Di dûmahiyê de ev sefer tiştên gelekî bi xêr û bereket kire nesîbê mislimanan .

Ger ku we jî bala xwe dabe vê hadîsê hemû tiştê ku hatin kirin bi hisab in û hemû di çarçoveya raz, veşarîtî û sîrrê de ne. Ger ku di vê çarçove de hereket nehatibana kirin Xweda çêtir dizane dê ev hereket bi ser neketibana.

Hewce nake mirov dûvdirêj bike. Pêwîst e her kesê ku ji xwe re dibêje ez Misliman im divê di kar û barên xwe de haya xwe ji xwe bike û metoda Resûlullah û eshabên wî -ku ev metod ji teref Xweda Teala ve lutf û nîmetek e- bişopîne û ji xwe re bike şî'ar. Lewra ger misliman haya xwe ji xwe nekin û di karûbarên xwe de ne hişyar bin zirar ji wan zêdetir dê bigihije doz û dawaya wî.

Gotineke Farisan heye ku divê neyê ji bîr kirin: **“Dîwar mûş dared, mûş gûş dared.”** Ango di nava dîwarî de mişk heye û du gûhên wî mişkî heye. Yanî kesê muxateb û xwediyê gotinê haya xwe ji gotinên xwe bike û li axavtina xwe miqate be. Lewra her tiştên ku tu dê bînî zimên ihtîmal e ku ji teref derdorê ve bînin bihîstin.

***Es-Selamu 'Eleykum we Rehmetullahî we Berekatûhû...***



# Hevalên Baş Yar in, Hevalên Nebaş ‘Ar in



✍️ Fatîh AKMAN

Ehmed û Welî ji dibîstanê vedigeriyan malê. Li jêra dibîstanê çend xirbe û malên xerabe hebûn. Wexta dibê wan re derbas bûn, qêrînek hat, veciniqîn. Xwe negirtin, meraq kirin. Hew xwe dîtin ku li nava xerabane. Çend xortên ku balî û esrar dikşandin li wir bûn. Xortan di nava xwe da şer dikir, pevdiçînîn. Belê çawa Ehmed û Welî li hemberî xwe dîtin, dev ji pevçûna xwe berdan û berê xwe dan wan. Yekî ji wan got: **“Hûn li çi dinêrin, hûn li bela xwe digerin.”** Yekî dî jî got: **“Bimeşin, kurê min...”** Gotina “kurê min” li xweşya Ehmed ne hat, bi hêrs got: **“Sixêfa nedin, ma me tiştekî ji we re gotîye?”** Ji wan ê ku pêşî axivîbû, xwe dîsa avêt

nav xebêrdanê: **“Tew hûn diştêgîlin jî...”**

Yek ji wan yek ji wan, Ehmed û Welî xwe di nav şer de dîtin. Melê taxê Mela Huseyn ji jibo nimêja ‘esir di rêya mizgeftê de bû, dengê pevçûnekê ji dûr ve dihat. Her ku nezîkî xeraba dibû, deng zêde dibû. Wextê gihast rastî xeraba, deng baş hat, deng ne gîrîb bû, lezand û bi alî wan de çû. Çi bibîne, Ehmed û Welî û du hebên ku li kuçan radi-bin rudinin, bihev girtine, hevdu dibin û tînin. Bi dengêkî bilind û bi geyd bi ser wan de çû û ji wan ra got: **“Xortno! Hûn çi dikin, hûn ji xwe fedî nakin?”** Mela Huseyn bi zirt û xeyd kir ku dev ji hevdu berdin û vegeşya bal Ehmed û Welî: **“Ev çi hal**



**e, perîşantiya wan besî wan e, ev şer û pevçûn ji ku derket îca?"**

Ehmed fedî kir, serê xwe bera ber xwe da, Welî weha bersiv da: **"Seyda em ji dibîstanê vedigeriyan, bi dengê pevçûna wan em bi vir de hatin, bela xwe li me dan, hema me xwe di nava şer de dît."** Seyda piştî vê bersiva Welî, berê xwe da xortên din, wan weke kesên sûcdar serê xwe ji kêlekê ve berda bûn ber xwe û bi hêrs bêhna xwe didan û distendin. Mela çawa baş bala xwe da wan, nêrî yek ji wan şakirdê wî yê berî bi çend sala, Ğerîb e. Nêzîkî wî bû, destê xwe da milê wî û got: **"Ğerîb tu li vir çi dikî lawo, tu çawa ket van halan?"**

Bi pîrsa Seyda re ji çavên Ğerîb hêstir herikîn. Bi kelûgirî bersiv da: **"Seyda xwezî min dev ji mizgeft û hevalên xwe yên li wê derê berneda. Îro ez poşman im, îdî ez naxwazim ne hevalên xwe yên li van kuçan, ne jî yên li ber dîwaran bibînim. Seyda jibo Xwedê ji me re bibin alîkar."** Piştî van gotinên Ğerîb, Mela Huseyn li ser pîrêkê-tekê, li kêleka wan xwe berda erdê. Belê Ehmed û Welî got: **"Em dereng bimînin, wê malîyên me, me meraq bikin."** Ji ber wê, misa'eda xwe xwestin û çûn. Piştî Ehmed û Welî çûn, Ğerîb û Azad dest bi xeberdanê kir:

**"Xalê Seyda em jî însan in. Çima kes li me nabe xwedî. Kêfa me ji vî halî re nayê. Em bêxwedî ne, kes li me nanêre, ê dinêre ya ji me ditirse ya ji bera me dide... Êvara em li vir dibin qeşa, carna potikî ku em têxin bin serê xwe em nabînin. Nebese em xwe didin ber kêr û cilêta, her derê xwe em jê dikin. Em jî guneh in, dilê we qey bi me naşewite, me xelas bikin ji vê jîyanê, ji van sikak û kuçan. Tiştêkî dî em ji we naxwazin, em nan û av ji we naxwazin, hûn me ji van sikak û kuçan xelasbikin, emê li ser nigê xwe bisekin, em ji we re nabin bar, emê bixebitin, nanê xwe derxin. Nuha jî em dixebitin, me ji kesekî nan nexwestîye, me destê xwe li ber kesî venekirîye. Kağiz û qartonê sûka didin hev, em nanê xwe ji wan derdixin. Ji bo Xwedê me ji vê jîyanê xelas bikin, em jî însan in, em jî dixwazin hêvî û xeyalên me hebin. Em jî dixwazin bixwînin li dibîstanan, dixwazin nimêj bikin**

**li mizgeftan, jibo Xwedê, jibo Xwedê..."**

Mela Huseyn digrîya, ji xwe ra digot **"çawa heta niha min ev xort nedîtine, sûcdarê vê halên wan em in"** Piştî ku Azad sekînî, Ğerîb dest pê kir. **"Seyda, qey te hiç meraqa min nekir ku dema ez çûm ez çi dikim. Binêre Seyda, ji wextê ku ji mizgeftê durketime, halê mi ev e, kîjan bajar, kîjan tax be em divî halî de ne. Geh em balîyê dikşînin, geh tînerê. Em agir bi nava xwe dixin Seyda."** Ğerîb piştî weha got, rabû ser xwe, hinek tîner anî û berda ser hinek sînger û got: **"Ha em wilo agir berdidin xwe, tîner çawa vê sîngerê dimehîne, me jî weha dimehîne. Hetanî em li kuçekê bikevin, bimrin, jibo Xwedê Seyda, em naxwazim bimehin, em naxwazim di vî halî de bimrin, me ji vê jîyanê xelas bikin, li vir pêşî û mêş me dixun, mişk me dixun. Me xelas kin, me xelaskin. Hûn me xelas bikin, îdî ez dev ji mizgeftê, dev ji we û hevalên baş bernadim. Careke din ez nabim hevalên kesên ku berê min didin van xeraba. Jibo Xwedê Seyda, ji bo Xwedê Seyda, Jibo Xwedê Seyda..."**

Mela Huseyn, hew debar kir rabû ser xwe, hêstirê xwe paqij kir, Ğerîb û Azad xistin bin çengê xwe û meşîyan bi alî mizgeftê ve. Heta gihaştin mizgeftê, car car hêstirên xwe ji hev vedişartin. Dema gihaştin deriyê mizgeftê, Mela Huseyn hêstirê xwe baş paqij kiribûn û derbasî mizgeftê bûn. Piştî nimêjê Mela Huseyn, Ğerîb û Azad birin aşxanê, bi hev re xwarinek xwarin û ji wir jî çûn nexweşxanê. Demêke dirêj derbas bûbû, li mizgeftê Mela Huseyn, we'z dikir, Ehmed, Welî, Ğerîb û Azad li dor Mela Huseyn bûbûn xelek. Ev çar xort di karen xêran de ji Mela Huseyn re îdî wê bibana dest û pî.

Çîroka me li vir qedîya. Îdî ka em binêrin bê çi şîretan em karin ji xwe re bigrin. A yekemîn, çûna mizgeftê bi tenê mirov ji xerabîyan dûr dixê, meriv bi başan re dike heval û hogir. A duyemîn, çawa ku hevalên baş mirovan baş dikin, hevalên xirab jî mirovan xera dikin. A sêyemîn, em weke ku pêxemberê Xweda kerem kiriye, ji yê nêzîk û durê xwe berpîrsyar in. Xweda wê hesabê wan ji me bike. A çaremîn, wexta em li xortên xwe xwedî dernekevin, îblîs û hevalên xwe wê xortên me ji me bidizin, wan û jîyana wan wê mehû bikin. Wesselam.



# DI PIRSGIRÊKA KURD DE JI HÊVIYA “ÇARESERÎ” YÊ HETA HEYAMA PEVÇÛNÊ -4



✍ 'Ebdulqadir TÛRAN

### 3. DI HEQÊ PÊVAJOYÊ DE HÊVÎYÊN ALIYÊN “PÊVAJOYA ÇARESERÎYÊ” Û HÊLÊN CÛRBEÇÛR ÊN CIVAKÊ

Hemî millet dixwaze ku sîleh bisekinin, hawira hizûrê pêk bê, tetbîqat û pergalên faşîzan ên ji ber sîstemê diqewimin rabin. Jiber vê yekê “pêvajoya çareserîyê” li nik millet ciddî hewce tê dîtin. Li gorî hinek fikran, di vê dewra enformasyon û teknolojiya pêşxistî de, divê çareserkirina meseleyên civakî, êdî ne bi wasîteya şiddetê bin. Wekî din PKK, dev ji daxwaza dewleteke serbixwe berdaye, federasyonê bilêv nake û gihastîye wê astê ku xweserî jî xistiye çarçoveya xurtkirina îdareyên herêmî. Ji lew jibo qezenca hinek heqên kulturî, berdewamiya pevçûnê ne mentiqîye. Mijarên wek hebabûna çavkanîyên însanî û ekonomîk ên welêt, zirardîtina

biratîya xelkan, ji mudaxeleya hêzên derveyê re talûka çêbûna zemîneke musaîd, zirarên pevçûnan eşkere dikin. Ji vî aliyê ve “pêvajoya çareserîyê” gelek girînge. Lê di warê hêvîyên ji pêvajoyê de ferqî hene. Piştî destpêbûna “pêvajoya çareserîyê”, alîyan tenê ji hêla xwe ve, dest bi helwesteke pragmatîst a “wê çawa ji pêvajoyê îstîfade bikin” kirine. Ev yek jî, pêvajo ji armanca esas dûr xistiye.

#### 3.1. Hêvîyên Dewlet û Hikûmetê

Dewletê bi pêşbînîya ku wê pêvajo serwerîya wê xurttir bike, ji qasî dihat hêvîkirin zûtir xwe adaptêyê pêvajoyê kir, lê ihtîrazên xwe jî her zeman diyar kirin. Xelasbûna pevçûna çekdarî û li her derê welêt xuyabûna qûwweta dewletê, di serê hêvîyên dewletê de bûn. Mesrefên ewlekariyê jibo



ekonomîyê, wek çalereşek bû, hindikkirina van mesrefan, jibo hikûmetê di warê faalkirina projeyên sosyal û çêkirina îstîkara ekonomîk de, zêde muhîm bû. Îstîmalkirina çavkanîyên herêmê yê binerdê û sererdê û dahatûyên tûrîzmê yê wê zêdebûbûna, wê îmkanê dewletê xurttir bikira. Digel vê di nav hêvîyên girîng de hebûn ku bi rakirina sîlehan, wê partiyên sîyasî yê dirêjîya PKKa ku tewreke xurt û xwedî alîgirên zêde nîşan dide, êdî li herêmê eynî rewşê nikaribin bidomînin, hetta wê di nav wan de nelihevkirina fikran biqewime.

### 3.2. Hêvîyên PKKê

Gava li ser hêvîyên PKKê bê xeberdan, ewê baştir be ku meriv behsa seyra tarîxî ya PKKê borandiye û hemî muştaqên wê bike. PKK bi “pêvajoya çareserîyê” di dîroka xwe de bi qasî ku tucarî bi dest nexistibû bûy xweyîmkan û ji xwe re sehake ku dikaribû tê de rihet hereket bike bi dest xist.

#### 3.2.1. KCK an ji Qandil

Koma Civakên Kurdistan (KCK), di wê pozîsyonê de ye ku ku hemî muştaqên PKKê temsîl dike û bi şêklê îdara “hevserokî”yê dixebite. Pirê îdarevanên wê, ji zûde di nav micadela çekdarî de ne. Di qadroya wê ya serî de, ji zûde tu guhertin û tasfiye neqewimîye. Îdarevanên KCKê, di demên ku tehdîda êrîş tunebin de, li merkeza xwe ya li Qandîla Herêma Kurdistanê dimînin.

KCKê ji serî heta dawîyê, yekser pragmatîk li pêvajoyê nêriye. Gava orgutê xwe xurt dîtîye, îdarevanên wê behsa stratejîyên herbê yê “gûrahîya hindik” û “gûrahîya pir” kirine, lê dema di bin êrîşan de ketine tengasiyan, bi agirbestîyan hewla ku terefdarê aştiyê neşan dane. Ev yek di 1993an de dema Ocalan hatiye girtin û di 2011an de dema operasyonên zêde, gelek caran hatiye dîtin.

Hêvîya KCKê ji pêvajoyê ew bû ku zemînek çê bibe daku Kurdistanîya Tirkîye û Sûriyeyê û heta ya Iraqê, êdî ne ji Qandîlê, ji hundur/rasterast bê îdarekirin.

Jixwe wê îdarevanên hundur ji ewêbana, piştî ku endamên çekdar, sîlehên di destê xwe de riyalî berdana, wê têtetina nav bajaran û wê wek wezîfedarên dewletê yê resmî, dîsa rahêştina sîlehan. Yanî KCK di wê hêvîyê de bû ku bi awayî bajaran ji bide ber xwe hakimîyeta xwe ava bike.

#### 3.2.2. Îmralî yan ji Ocalan

Hêvîya herî mezin a Ocalan ew bû ji Îmralîyê derkeve, micadela wê di çarçoveya terorê de neyê hesibandin û wesfê wî ya “Serokê Xelk Kurd” li nav alema cihanê bê qebûlkin. Ocalan ji hevdiştinê ku bi yekîneyên îstîxbaratê re pêk dianîn, zen dikir wê ji wî re, ji bo ajotina hemî kurdan sehakek bê vekirin. Hevdiştinê wî yê bi heyetên BDP-HDPê re, beyanên wê yê ji bo Newrozê ku di wan de li ser biratiya Tirk û Kurdan disekinî, gotinên wî yê der barê tesîrên emperyalîst ên jibo dîzaynkirina Rojhilata Navîn de û xeberdanên wî yê bi polîtîkayên nû yê dewletê re hevrast, girîngin jibo fêmkirina ku çawa li meseleyê dinêre û hêvîyên wî yê ji pêvajoyê di çî sewîyeyê dene. Ocalan tim û tim behsa baştirkirina şert û mercên xwe dikir û ketibû wê hêvîyê ku wê gav bi gav xwestekên wî pêk bîn.

#### 3.2.3. Dîyaspora PKKê

Ji dîyasporayê meqsed, dirêjîyên PKKê ne ku hema bi sebebê li derveyê Tirkîyeyê dimînin û li welatên Ewropayê kom bûne. Hêvîyên qîsmekî dîyasporayê, bi “pakêtên demokratîkbûnê” bi piranî hatine cî. Hinek kesayetên ku berî niha ji ber gotineke xwe ketibûn hepsê, yan ji mecbûr mabûn welat terk kiribûn, digel ku dîsa behsa serxwebûn û federasyonê dikirin jî, di vegera wan de bêje hema bi mersîma dewletê pêşwazîkirina wan, nîşan dide ku şert guherîne. Lê belê jibo hinek qadroyên payebilind ên PKKê, tiştêk xuya nake. Lê hêvîyên dîyaspora ku tevlî armanc û hesabên sîyasî yê dewletên li wan dimînin bûne, ji heqên wan ên şexsî û kollektîf zêdetir, ketine bin daxwazên mîhraqên hêzên ku tevlî wan bûne.





# BIHAR ÇIMA XWEŞ E?

**Zarok û ciwanên hêja!** Çima em însan ji biharê ewqas hez dikin, şahîw û kêfxweşiyên dil û heyata xwe bi rengên biharê wesif dikin? Lewra bihar fesla, mewsîma, çax û dema zarokî û ciwanîya însan temsîl dike. Çawa zarok û ciwan, mal û malbat û mehela lê, geş û şên dikin, fesla biharê jî derûdor ewqas geş û şên û candar û şênkayî dike. Lale û nêrgîz, sosin û binefş, peybûn û berfin, gul û çiçekên sor û sipîyû mor û zerîn... Dar dibîşkivin, pel û gûpikan vedikin. Pelên mêwa hem şîn xweşe hem jî dibin xwarin xweşe. Eriş û alûc û bihîv li ser tableyan, dikevin destê zarokan.

**Dema bihar tê, meriv diçe çol û beyaran, newal û gîharan li kereng û pîvoka, li siping û xîloka, li tûzik û tirşoka, li rêwaz û kuvarka, li bilbizêk û şakiroka digere.** Serê sibehê û danê 'esir gava tîrêjên rojê ji dûranî ve li bilbizêkan dixê û bilbizêk ji dûr ve dibiriqin, meriv û hevalên xwe baz dide wan, çiqas xweşe. Li ser kanîyên biharê ku nû der bûne, ava wan hênik û xweş, piştî listika sê qûçka meriv dibetile ji ber bazdanê û ji ber gera li van çiçek û gihayan, meriv diçe ser van kanîyan, meriv bi dev, bi qilûzkî xwe dirêjî ser ava wan dike û ji wan vedixwe, çiqas xweşe. Noşîcan be. Paşê meriv pîvok û bilbizêkên xwe dijmêre bê ka kê zêde berhev kirine. Û gava meriv gihayên pîvoka tevî serê wan bi hev dihûne û li dora serê xwe digerîne, ew jî xweş bûne welê?

**Lê bihar bihare encax bi nîsanê, bi meha nîsanê geş û gur dibe bihar. Lewra pêxemberê me, ronîya çavê me, destegirê qîz û rebena, sêwîw mezlûma di meha nîsanê de şeref daye dinyayê. Ji lew Hz. Pêxember**

**bihara heyata me ye, şahî û felata me ye. Dema meha nîsanê tê, kuçe û meydan bi afîşên wîladeta pîroz dixemilîn, jin û zîlam, qîz û xort, kal û ciwan dest bi selewatan dikin û tevî seferberîya selewatan dibin, hozan bi dengê xwe, şair bi helbestên xwe li ser rêberê insanîyetê dibêjin. Kom û kuflet bi beyreqên tewhîdê xwe berdidin meydanên Mûhemmedî. Nîsan dibe eşq û îman, can dike însan û jîyan.**

**Zarok û ciwanên hêja! Bihar xweşe ne wilo?**



## الْحَمْدُ لِلَّهِ الَّذِي أَطْعَمَنَا وَأَشْبَعَنَا وَجَعَلَنَا مِنَ الْمُسْلِمِينَ

Elhemdû lillahîl lezî et'emena weseqana wece'elena minel muslimîne

(Hemd ji wî Allah re be ku me bi xwarin û av dike û em kirne misluman.)

Zarokno! Evya dua **xwarinê** ye. Di dawîya xwarinê de

meriv vê duayê dixwîne. Meriv vê duayê neke jî lazime meriv dîsa ji **Xwedê** re şukur bike. Gelo hûn dikarin kelîmeyên "**hemd, Allah, misluman, em, xwarin û av**" di binê erebîya wan de binivîsînin?

Niha jî di van cumleyan de cîyên vala bi kelîmeyên durust û rast dagirin.

1. Berî meriv dest bi xwarinê bike û piştî xwarinê meriv ..... xwe dişo.

2. Meriv bi ..... yanî bi navê Allah dest bi xwarinê dike.

3. Meriv bi ..... rastê xwarinê dixwe û parîyên biçûk davêje devê xwe.

4. Piştî xwarin qedîya, meriv dibêje ..... Bi vî şeklî meriv ji

**Xwedê** re şukur dike.

5. Gava devê me meriv tije xwarin be, meriv ..... nade.

6. Çi xwarin be çi av be meriv ..... nake, lewra ..... herame.





# Erê

# Na

## Niha Ji Jibo Van Hereketan Cewaba “Erê” Yan Ji “Na” Bidin:

1. Ez sirrê hevalên xwe, ji kesî re nabêjim. ....
2. Kesek bipeyve, ez xeberdana wî nabirim. ....
3. Ez bi hemî hevalên xwe yên qûrsê re, xweş mi'amele dikim.  
.....
4. Ez kincê xwe yên mektebê, navêjim derûdoran. Wan bi cê wan ve dialiqînim. ....
5. Dema Qur'an û azan bên xwendin, ez bi hurmet guhdarî dikim.  
.....
6. Gava ez bipeyvim, ez gotinê dildişkîne nakim. ....
7. Ez ji mezinê xwe re bihurmet, ji biçûkê xwe re jî bişefqetim.  
.....
8. Ez li tişt û eşyayên xwe, miqateme û wan xweşik dixebitînim.  
.....
9. Ez ji parvekirinê (payîkirinê) hez dikim.  
.....
10. Gava kesek alîkarîya min bike, ez jê re te-  
şekkur dikim. ....

Zarokên hêja! Eger cewabên we tev  
“erê” bin, eferî ji we re.

We jibo kijanan negotibe “erê” li xe-  
tayê xwe hayî bin.





## Îcar Ji Cewabê Van Pirsan Bidin:

1. Li gorî teqwîma mîladî pêxemberê me di kîjan mehê de hatiye dinyayê? .....
2. Em wîladeta pêxemberê xwe bi çi pîroz dikin? .....
3. Jibo wîladeta pêxemberê me seferberîya çi tê kirin? .....
4. Di heqê ..... (heyata) pêxemberê me de pêşbirk tê tertîbkirin.
5. Di pêşbirkê d ji lîse û mezintirê wan kesên derencên ewilîn digrin, bi ..... (çûna Mekke û Medîneyê) tên xelatkirin.
6. Jibo wîladeta pêxemberê me pêşbirka ..... û ..... (şîr û nivîsa serbest) tên tertîbkirin.
7. Wîladeta pêxemberê me jibo ..... a ummetê (yanî yekîtiya ummetê) wesîleye.
8. Gava pêxemberê me hîcretî ..... kir, hz. .... pê re hevaltî kir, li ..... xelkê ..... wan bi îlahîya ..... pêşwazî kir. Ji lew em jî bernamêya wîladeta pêxemberê xwe bi selewat û îlahîyan dest pê dikin.



## Em ma'na Vana zanibin:

"Rêvî tere, tirî tirşe.": Ev gotina pêşîyan ji bo kesê dilê wî naçe tiştetekî, naxwaze tiştetekî bike tê gotin. Ya jê nayê yan jî naxwaze tiştetekî bike, ji lew li bihana digere û xwe jê dihêle.

"Ji ber şelê filîtîye.": Ev îdyom ji bo kesê dikeve ser xwarinê û bi lez û bez dixwe, tu dibê qey ewê xwarin jê re nemîne tê digotin. Kesê ji ber şelâyê xelas be û çav li xwarinekeve, jixwe ewê hicûmî xwarinê bike. Her wiha jibo kesên weha filîtîye ser xwarinê, hûrê wî filîtîye jî tê gotin.







# Berçê Zarokan

## ÇÎROKA GUR Û MÎYÊ

Zemanekî gurek hebûye. Ev gur piştî ku extyar dibe, êdî mîna berê çavê wî nabîne û wek berê nikare li ser pîya bisekin e.

Mî û berxên ku vê yekê dibihîzin, serbest li nava daristanê digerin û diçêrin. Heywanên wekî din yê ku gur jê re neyartî dikir piştî vê xeberê bihîstin ji kêfa re lîrandin û govend girtin.

Yek ji wan mîyeke dil bi rehm, dema çav li vê rewşa xerab ya gur dikeve dilê wê pê dişewite û her rojê bo gur xwarinê dibe. Yê ku dibînin, ji mîyê re weha dibêjin; “**ji neyarê berê dost çênabe.**” Û wê îqaz dikin.

Feqet mîya dil bi rehm, di vê rêya ku qenc dîtiye de israr dike.

Her rojê zikê gur têr dibe, encax hêsîrbûna wî ya di şikeftê de wî nerehet dike û di ber xwe de weha dibêje: “**Ez vê mîya qelew bixwum, ez ê him bighê m hêz û quweta xwe ya berê û him jî ez ê bikaribim bi hêsanî wekî din jî nêçir û seydvantiya xwe bikim.**”

Mîya reben weka her demê dîsa xwarinê tîne şikeftê.

Gur, bi dengekî hêdî wek ku nexweş be dibêje: “**Ey dosta min ya bi wefa, de ka were ez di dema xwe ya dawîn de te hemêz bikim.**”

Mîya dil saf jî diçe ber wî. Gur di fersenda ewil de wê dike nav lepê xwe. Mîya reben xwe bi zorê ji nav lepê gur derdixe.

Êdî ji wê rojê û pê de, bê **şêwr** û **tecrûbe**, kare ku taliya wî poşmanî ye nake.

